

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

# bîrnebûn

hejmar 62 | 2015



# MIZGÎNÎ BO ZAROKAN!

Kitêbaka nû bi kurdî li kitêbxaneya zarokên kurd zêde bû.

*Ev Emilê ha* ji aliyê Astrid Lindgrenê ve  
hatiye nivîsin û Björn Berg ji bi ilustrasyonên  
xwe ev kitêb xamilandiye.


Ali Ciftci ev kitêb ji swêdi wergerandiye  
kurmancî.

Ji ev e-mailên li jêr hûn dikarin peyda bikin:  
Almanya: [birnebun@hotmail.de](mailto:birnebun@hotmail.de)  
Swêd: [info@apectryck.se](mailto:info@apectryck.se)  
Welat: [info@apecyayin.com](mailto:info@apecyayin.com)

Astrid Lindgren

Björn Berg

## EV EMILÊ HA



Emilê Lönnebergê, hema bêje wî her roj şûmî dikirin.  
Lê Emîl ji wî aliyê ve gelek jêhatibû, tu caran eynî şûmî  
dubare nedikir, wî herdem yên nû peyda dikirin.  
Wek wê cara ku xuşka xwe ya biçûk hildabû jora sitûna  
alayê. An jî wê cara ku wî Lukas ajotibû salona mezin ku  
li wir şaredar şahiya rojbûna xwe dikir.  
Wê gavê ji bilî şaredar herkes kenîyabû...  
Û hûn dikarin texmîn bikin ka piştre Emîl ketibû  
kuderê?!





**Seran Altunkılıç**

(Seran Anatolia, 1976 - 26.5.2015)

Seran Anatolia di roja 26ê gulanê li Rojavaya Kurdistanê, li Serêkaniyê di şerê li hemberî Daîşê de, li gundê Mebrukayê şêhîd ket.

Seran Anatolia ji kurdên Anatoliya Navîn, ji eşîra Şexbilan e. Ji bajaroka Boztepeyê ji gundê Çevirme ye. Di sala 1976an da ji dayik bûyê. Li Ankarayê Endezyarîya Bîyolojiyê qedandiye. Dura li Îtaliyayê, li bajarê Romayê lîsansa bilind xelaskiriye.

Seran Anatolia biryar dide ku li welatê kalûpîren xwe di şerê hemberî zordarên Daîşê de cîh bigirê û tevî refîn YPJ dibe. Di demeka kin de dibe berpirsiyarê gruba xwe. Di çalakîya Mebrukayê de Seran Ana-

tolia bi gruba xwe va dikeve şerê li dij Daişê. Di vê şerê de şêhîd dikeve.

Di 29ê gulanê de li gundê xwe, Çevirme bi besdariyeka mezin Seran te binax kirin. Dema Seran şêhîd dibe pûşıya xwe ji bo teslimî dayika wê bibe dide hevalên xwe. Dema Seranê tînin mala bavê wê, poşiyê teslimî dayikê dikin û şîn mezin dibe. Bi girseyî jin di merasîma defnkirinê de li pêş cîh digirin.

Ma serê gelê me û malbata Seranê sax be. Şehîdên Kurdistanê ji bîrnabin û ew ê di tekoşîna gelê xwe de her dem bijîn.

*Serdar Botan*

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeye.

Utgas av Apec Förlag AB

hejmar 62 | 2015

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

## Koma hevkârên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikaili, Xizan Şilan, Muzaffer Özgür,  
Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Hesen Huseyin  
Deniz, İbrahim Korkmaz, Fatoş Koyuncuer,  
Aziz Yağan, Berat Qewi Endam

## Adress

Navnişana li Swèdê  
Box: 8121, SE 163 08,  
Spånga/Sverige

## E-post

info@apectryck.se

## Internet:

[www.birnebun.eu](http://www.birnebun.eu)

## Têkili/Ilişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

## Belavkirin / Dağıtım

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Bîha/Fiyati:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

## Abone

Swèd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welaleten din én Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyen li derveyi Swèdê / Isveç dışındaki aboneler için

APEC, "Bîrnebûn"Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baskı: Apec-Tryck AB



Alan Kurdi di sê saliya xwe de bi trajedyeka mezin a koçberiyê mir.

Lê navê wî dê ebêdi bijî.

Ew wêneyê mirina wî bû sernişana felaketa koçberiyê!

Wêneya berga pêşin: *Cinayeta namûse*, wêneyan Nuh Ateş  
berga paşin: *Kapris*, Nuh Ateş ([www.nuhates.de](http://www.nuhates.de))

Her niviskar berpîrsê nivisa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivisên ji Bîrnebûnê re têن,  
serrast û kurt bike. Ger nivis çap nebin ji, li xwedîyan  
nayen vegerandin.

Waqa Kurdê Anatoliya Navîn li Swèdê û  
Komela Ziman li Almanyayê piştgirêñ kovarê ne.

# Naverok

- |   |    |   |
|---|----|---|
| Ji bîrnebûnê<br>Alî Çiftçî  | 6  | 50 Şev xemgî ne<br>İbrahim Korkmaz  |
| KOMKURD - AN<br>Mem Xelikan                                       | 7  | 51 Hevpeyvînek bi Serkan Köse re<br>Alî Çiftçî  |
| Her bijî kurdî û hemû zimanên cîhanê<br>Nerinaazad / Aziz Yağan   | 11 | 55 Şînên Xelikan<br>Fatoş Koyuncuer   |
| Yaşasin zazakî, kurmancî ve tum diller<br>Nerinaazad / Aziz Yağan | 14 | 57 Ji Koçberîya Almanyayê wêneyek<br>Seyfi Doğan  |
| Çend gotin li ser kurdî-kurmancî<br>Hesen Huseyîn Deniz           | 17 | 59 Bayê Rojava<br>Xizan Şilan   |
| Hevpeyvînek bi Memê Mala Hine re<br>Alî Çiftçî                    | 25 | 61 Sîyarê Têrika-5<br>Dr. Mikailî   |
| Statûyê gundan<br>Seyfi Doğan                                     | 32 | 66 Helbest<br>Seyfi Doğan   |
| Veguherîn - Franz Kafka<br>Werger: Nuh Ateş                       | 34 | 67 Raporek li ser kurdên li bakûrê Îranê;<br>kurmancên amarî li Rûdbarê<br>Berat Qewî Endam |

# Ji bîrnebûnê

Trajedîya koçberiya xelkê me yê kurd bi sedan salan e berdewam e. Ev sê salên dawî ku hêviya serxwebûnê û stendina mafê netewî ya kurdan hewkes bilindbû û di qada navnetewî da hêdî mesela kurd û Kurdistanê tê rojevê, welatên ku axa Kurdistanê di nav xwe de parve kirine pir ne rihet dibin û bi êrîşen pir howane yên dijî însanetiyê ve li başûr, bakûr û rojava şerê kurda dikin.

Ev şer helbet bi xwe re trajedîyên mezin tîne û însanên me mecbûr dibînin xwe li sînora dixin ji bo jîyaneka aram. Piranîya wan di şertên pir dijwar de dimînin. Hêdî wiha bûye ku li qeraxên derya termên zaro-kan lê ras tê! Ev mirina Alan Kurdî yê sê salî bû sernîşana trajedîya koçberiyê.

Di van rojên ku em kovarê diweşînin de li tewayiya bakûrê welêt û li bajaren Tirkîyê, ji terefê hêzên taybet êrîşen talankarî têne kirin. Bi taybetî hedef kurd û sembolên kurdan in. Niha divê dengên bîlind ji aliyê herkesî ve bêñ derxistin. Ya herî girîng ji divê civata Tirkîyê, li hember wan êrîşen nîjadperest bi girseyî li dîj bisekinin.

Hêviya me ev e ku rojekê pêş de aramiyek li welêt çêbe û rîya dîyalogê bêt vekirin daku bigihêñ encamekê! Bi ew şer û pevçûnan heta niha tu aliyek negêhiştiya tu dera û dê ji vira ha jî tu encam jê neyêñ! Tenê yek encam dertê ev jî zarokên fekîr û fîkara têne kutin! Xizanî, belagazî û koçberî zêde dibe!

Dimcha gulanê de bi navê KOMKURD-AN *Komela Çandî û Piştevanî ya Kurdên Anatoliya Navîn* li Ankareyê hatiye ava-

kirin. Bi hêviya xebateka serkeftî em wan pîroz dikin.

Bi munasebata cejna ziman a 15ê gulanê mamostên zanîngehêñ Dîclê, Mûş, Wan, Mêrdîn û Çewlikê bi daxûyanîyekê ev roja zimanê kurdî pîroz kirin. Me ev daxûyanîya bi sernivisa *Her bijî kurdî û hemû zimanên cîhanê* di hejmarê de belav kir.

Birêz Hesen Huseyîn Denîz, bi sernivisa *Cênd gotin li ser kurdî-kurmancî* balê dikişine ser girîngîya bikaranîna zimanê dayîkê û herwiha di zimanê kurdî de, veqetandek û tewang bi cênd nimûnan destnîşan kiriye.

Du însanên me yên hêja, yek li welêt, Meme Mala Hinê ku ji aliyê huner û sinemayê de xwedî berhemên hêja ye. Û yên din li derveyê welêt, Serkan Köse, ku ji neh salîya xwe de hatîye Swêdê û niha wek parlementer di parlamentoya Swêdê de kar dike, di wê hejmarê de hatine nasandin.

Fatoş Koyuncuer bi sernivisa *Şînên Xelikan* kevneşöpiyên me yên ji Anatoliyayê şirove kiriye ji gotinêñ ku di kilamên şînan de pirê caran têne bikaranîn, nimûne dane. Em bi vê vesilê ji Fatoşê re dibêñ; tu jî bi xêr hatîye û ji vira ha em ê li benda nivîşen tê bin!

Berat Qewî Endam lêkolînek li ser kurdên li bakûrê Îranê, *kurmancêñ amarî li Rûdbarê* hazir kiriye. Cih û warêñ ku ew lê dimînin, erf û edetên wan, ziman û folklora wana dayê nasandin.

Bi hêviya ku ev hejmar jî li gor dilê we be bimînin di xêr û xweşiyê de!

Alî Çîftçî



Dimenek ji avakirina komelê

4-5 mah in li Ankarayê, bi ser bangâ çend kesan ve ji bo avakirina komeleke bi navê Kurdên Anatoliya Navîn (KAN) ya çandî û piştevanîyê şuxil û berxwedan hebû. Kar û xebata wan hevalan, xuyayê çend rojên pêşî bi serkeftin bi dawî bibe.

Çend sedsal in li heremê KAN, li hember her astengîyan ziman û çanda xwe parastin e. Kurdbûna xwe ji bîrnekirine. Bi çand û zimanê xwe, bi erf, edet û bi folklorâ xwe Kurdatî ya xwe parastine. Lê hetanî huro li heremê KAN bê sazî ne.

Wan hevalan ji bo avakirina komelê çend civîn çekirin. Di civîna

yekemîn de 30-40 kes besdar bûn. Di civînê de, her kesekî fikir û ramanê xwe anîn ziman. Beşdaran, ji bo ku zimanê dayîkê ji asîmîlasyonê were parastin, ji bo çand, huner, jîyan û dîroka Kurdên Anatoliya Navîn, bi zanistî bê lêkolîn û bê nîvisandin bîryar girtin ku komelek were damizirandin. Dûva, ji nav xwe 15-20 kes bijartin. Ku ew kesana, bi navê komîteya avakirinê kar bimeşînin.

Hetanî huro çar civînên mezîn, ji dehan zêdetir civînên komîteyê pêkanîn. Li her civînek mezîn, besdar dihatin agahdar kirin. Li her civînek mezîn, hejmara beşdaran



zêde dibû. Civîna mezin a dawîyê bi 70-90 besdaran ve berhev bû. 25 kes endamên avakirinê, ji nav wanen heft kes rîvabir hatin hilbijartîn. Ew heft kesên rîvabir ê di şes mehan de kongreyê amade bikin.

Navê Komelê: *Komela Çandî* û *Piştевanî ya Kurdên Anatoliya Navîn e.* (KOMKURD-AN).

Navê komelê bi tirkî:

*Orta Anadolu Kürtleri Kültür*

*Dayanışma ve Sosyal yardımlaşma  
Derneği* (ORKURDDER)

Avakar, rîvabir, destûr û danazanîna komeleyê amade ne. Hevalên avakar, li cihekî digerîne. Cih dîtin - nedîtin dixwazin serlêdana xwe bikin û bi kokteylekê avakirina komeleyê pîroz bikin.

Ez jî, wanen pîroz dikim û ji bo vî karî baş ji wanen re serkeftinê dixwazim.



# Bersiva e-nameya pirsa nihêrîn, pêşnîyaz û xwestina ku em jî teve karê komeleyê bibin

Ji Mem Xelikan ra

Hevalê héja,

êmailê te yê bi xebera xweş gihêste me. Em pê şâ bûn ku te û hen keseyatiyêñ kurd yên Anatoliyayê, we xwe daye ber karê çekirina (demizrandina) „Komelekê ji bo KAN“. Em spasi te dîkin ji bo hayadariyêñ li ser vê mijarê û we pîroz dîkin û serkevtina we dixwezin, bi hêviya ku gavavêtineke bi xêr û ber be. Em ê bi eleqedarîyeke nêzîk li benda gavêñ ku hun hîn biavêñ bin.

Te di mailê xwe da pirsa nihêrîn û pêşnîyaziyêñ me kiriye û xwastîye ku em jî teve karê komeleyê bibin. Li jêr em ê di çend xalan da, merem û pêşnîyazêñ xwe pêşkesî te/we bikin.

Sazî, dezgeh û rêxistinêñ sivil yên serbixe, yanê bi tu partîyan va girênedayî, ji bo kar û xebatêñ civakî û kulturî û hwd. lazim in, ferz in.

Mixabin kurdên Anatoliyê bi taybetî rewşenbirêñ wan ji vê hêlê da, li welêt bi derengî ketin. Dera ku ji zû da, li gund, qesebe û qezeyêñ kurd yên li navâ Anatoliyê sazî û rêxistinêñ bi vê şeklê bihatana çekirin.

Sazî yan rêxistineke çîng (çawa) û li ser ci navî be û wêdetir, armancêñ

wê yên pêşî ci bin? Wekî ku te jî gotiye, gerek e ku derîyê sazî û rêxistineke ha ji her kurdeki Anatoliyê ra, ji kîjan partîyê dibe ma bibe, yê ku bixwaze xizmeteke civakî û kulturî bike, vekirîbe. Li gorê qalkirina te, we yî li ser navê „Komela Çandî û Piştgirî“ biryar daye. Bi icazeya we, dixwazin diqetê bikşînîn ser wê ku çand û piştgirî du têgîhêñ (kavram) fereh û giştî (genel) in. Meriv dikane wan ber ve her alîyekî bikişîne yan jî her mijar û karêñ civakî di bin da bi şûn bike. Belkî ji bo vê, ji alîyekî da pozitîf bihê dîtin. Lê navê wê ci dibe ma bibe, ya muhîm armanc, kar û xebata wê ye.

Bi ya me, baştı̄r e, ku navê komeleyeke armancêñ wê yên serekî jî nîşanî meriva bide û lazim e armancêñ wê jî şenber (somut) bin, da ku meriv bikane xwe lê bigre û bi kar û xebatêñ li gor wê rabe. Nimûne, navlêkirineke mîna „Komela Parastina Zimanê Kurdi li Anatoliyê“. Navekî veng, him yekser armanca komeleyê dide der û him jî çarçiveya kar û xebata ku bihê kirin nîşan û sînor dike. Ji xêyrî van, ew pirsa muhîm ya zimanê kurdî bibîr tîne.

Zimanê kurdî iro li Anatoliyê bi metirsîya (tehlikeya) ji navçûyînê rû bi rû ye û têşîra wî roj bi roj kêmter dibe. Loma, pêşnîyazên me yê zêdetir li ser vê mijarê bin. Bi nihêrîna me, gerek e ku armanc û xebata pêşî ya komeleyê parastin û pêşvabirina zimanê kurdî be. Berî her tiştî gerek e, komele zimanê kurdî bi ber endamên xwe bixe, da ku ew bikanîn bi kurdî deng bikin, bixwînin, binivîsîn û bibin hezkirêن zimanê kurdî, edebîyat û tarîxa kurda. Jixwe, bingeha xwenasînê û ya nasnameya kurdî jî ev in.

Zimanê nav komeleyê, yê civîn, kombûn û her çeşid çalakîyan wê, divê kurdî be. Bername û rêznameya komeleyê bi kurdî bin û protokolên wê bi kurdî bihêن nivisîn. Zanîna kurdî gerek e bibe şerda endametîyê. Ji yên ku kurdî nizanîn lê dixwazin bibin endam ra, lazim e kursa zimanê kurdî bihê pêşkêşkirin.

Divê komele hewl bide ku kurdêن Anatoliyê ji îmkana dersa kurdî ya helbijartî istifade bikin, û sewa vê, qet nebe ji bo yek-du deran (gund, qeza), konseptek bihê amedekirin.

Li Enqereyê bi dehan akademîs-yenê kurd ên ji Anatoliyê hene. Lazim e ku meriv wan tevlê kar û xebata komeleyê û teşwîqî lekolinêن li ser kurdêن Anatoliyê bike.

Derheqa pirs û daxwaza li ser pêwîstiya tevlêbûna me ya di nav kar û xebata komeleyê da fikra me ev e: Em li dervayî welêt in, nabe ku em bibin endam. Ji ber ku meriv nikane li dervayî welêt bi kar, wezife û mesuliyêtêن endametîya ra rabe. Lê em ê piştevanîya kar û xebata we bikin û di kovara Bîrnebûnê da cih bidin wan.

*Li ser navê berpirsyar, nivîskar û  
hevalbendêن Birnebûnê li dervayî welat,  
Ali Çiftçi*

### GIRÎNGÎYEK:

Numra kontoya me hatiye guhartin! A nû ev a li jêr e:

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

# HER BIJÎ KURDÎ û HEMÛ ZIMANÊN CÎHANÊ

Nerinaazad / Aziz Yağan

**L**i Çewlik, Amed, Mêrdîn, Agirî, Colemêrg, Sérêt, Wan, Stenbol û Şîrnexê, 26 mamosteyên Zazakî û Kurmancî, di bin qadroya Wezareta Perwerdeya Neteweyî de, di polan de bi xwendekaran re tênbal hev. Li ser daxwaza Wezaretê, ji aliyê endamên hîndekariyê yên Zanîngeha Mêrdîn Artûkluyê ve, ji bo polên 5, 6 û 7an pirtûkên dersê hatin amadekirin. Wezaret, bi tenê ji bo pola 5. pirtûkên Zazakî û Kurmancî belav dike û sala bê divê ku pirtûkên polên din jî çap bike û vê yekê bi paş ve nexe. Her wiha pirtûka pola 8. hîn jî nehatiye çapkîrin.

Mamosteyên din xwedîyê çi mafan bin, mamosteyên Zazakî û Kurmancî jî xwedîyê heman mafan in û dixwazîn ku van mafêñ xwe bi kar bînin û bi vî awayî lez û beziyê bidin asanbûna karê xwe. Wekî mînak, li Batmanê çawa ku di nav rojêñ hefteyê de tê dayin, di dawiya hefteyê de jî kursêñ gihandinê hatin destpêkirin û hîn jî didomin. Ji bo ku li Navendêñ Perwerdeya Gel dersêñ Zazakî û Kurmancî bêñ dayin, pêşniyaza modulê li Wezaretê hate kîrin û her çi qas bi paş ve dixin jî hîn jî

li benda erêkirinê ye.

Xwendekar êdî li polê, li korîdorê, li jûra mamosten, li baxçeyê xwendingehê û li derveyê xwendingehê bi Kurmancî û Zazakî dikarin hestêñ xwe bînin ziman. Li hinek malan di nav malbatê de êdî sohbetên Kurmancî û Zazakî geç bûn û li hinek malan jî zarok daxwaz ji dê û bavan dîkin ku bi Kurmancî û Zazakî biaxivin. Bi taybetî, ji aliyê axaftin û nivîsinê ve bikaranin û bihêzbûna Zazakî ku di nav zaravzimanêñ nîvmirî de tê hesibandin, wêrekiyê dide.

Bihayêñ kelûpelên alîkar ên dersan, ji bo xwendekarêñ ku aboriya wan ne baş e, zêde ne. Divê ku sazî û karsazêñ taybet bibin alîkar ku ev kelûpel bigihîjîn ber destê xwendekaran.

Li gorî hejmarêñ Wezaretê, sala çûyî -tevî xwendingehêñ taybet-xwendekarêñ ku dersêñ Kurmancî û Zazakî hilbijartibûn 26 hezar; îsal jî ev hejmar gîhiş 85 hezarî. Ev zêdebûna watedar, dê ber û bereketa xwe bi xwe re bîne; di salêñ pêş de bi saya vê yekê, dê hem mamosteyêñ kurdî zêdetir bêñ peywirdarkîrin; hem bala xwendekarêñ ku namzetê zanîngehan

in, bikişîne ser besên lîsansê yên Kurdî û hem ji dê berê nivîskar û weşanxaneyan bide ser amadekirina kelûpelên alîkar ên dersê. Êdî ji Zazakî û Kurmancî “pereyê debarê” tê bidestxistin û ev yek, dê tevî malbatêñ xwendekaran, berê gelek aliyêñ civakê ji bikişîne ber bi xwe ve.

Di serî de li ciyên wekî Stenbol, Edene, Mêrsin, Îzmir, Antalya, Bûrsa û Enqereyê, mamosteyêñ ku dikarin dersêñ Zazakî û Kurmancî bidin û vê yekê bi bawernameyêñ xwe bidin destnîşankirin, divê ku li bajar û bajarojan serî li Gerînendetiyêñ Perwerdeya Neteweyî bixin. Her wiha divê ku di destpêka serdemê de malbatêñ xwendekaran bêñ agahdarkirin da ku bi vê yekê perwerdeya Zazakî û Kurmancî her ku biçe bi pêş bikeve.

Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê di vê Hezîrana 2015an de; Beşa Ziman û Edebiyata Zazakî ya Zanîngeha Dêrsimê piştî salekê; li Zanîngeha Çewlikê, Beşa Ziman û Edebiyatêñ Rojhilat (Ziman û Edebiyata Kurdî, Ziman û Edebiyata Zazakî) û li Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Mûş Alparslanê ji ji vir û du sal şûn ve dê xwendekarêñ lîsansê cara yekem bawernameyêñ xwe bigirin û ev yek ji rengekî birêkûpêk û akademîk dide pêvajoyê. Zanîngeha

Mêrdîn Artûklûyê, di wezifedarkirina mamosteyêñ zimanê Kurdî yên îsal de, ji bo ku kontejanê bidin kesêñ ku ji lîsansê bawernema girtine, serî li Saziya Talim û Terbiyeyê ya Perwerdeya Neteweyî da. Ji îsal û şûn ve ji bo mamostetiya zimanê Kurdî, dê kesêñ ku ji lîsansê bawername girtine bêne peywirdarkirin, heke kêmeşî bimîne dê ji kesêñ ku lîsansa bilind a bêtez qedandine ji bêne wezifedarkirin.

Her wiha Zanîngehêñ Mêrdîn Artûklû, Dêrsim, Mûş Alparslan, Çewlig û Wan Yuzuncu Yilê, xebatêñ xwe di qada lîsansa bilind de ji didomînin. Li Zanîngeha Enqereyê, li ser Zazakî û Kurmancî xebatêñ tezan hatîn destpêkirin. Hemû xwendekarêñ Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê, zimanê Kurdî wekî dersa hilbijêr dibînin. Li Zanîngeha Dîcleyê, ji bo xwendekarêñ Fakulteya Îlahiyatê, dayina dersêñ Zazakî û Kurmancî ji gavekî girîng û di cî de ye. Her wiha xwendekarêñ zanîngehê, wekî dersêñ hilhijêr dikarin Zazakî û Kurmancî ji ji xwe re bipejirînin.

Li Zanîngehêñ Herran, Colemêrg û Dîcleyê, ji bo ku bernameyêñ lîsansa bilind ên bitez û bêtez bêñ vekirin, amadehî tê kirin. Ji destpêkê heta îro bi qasî 1500 xwendekarêñ lîsansa bilind, bawernamyêñ xwe wergirtine. Ji hejmarê zêdetir ê girîng ew e ku ew qas xwendekar di bin pîr û pergala

xebatên akademîk de derbas bûne û li gorî zanyariyên ku girtine xebatêن xwe didomînin. Beşen Ziman û Edebiyata Kurdî yên vebûne û yên ku plansaziya vebûna wan tê kirin, ji aliyê bingeha akademîk ve, saziyên wekî YÖK'ê (Saziya Hindekariya Bilind) ku xwediyê erka erêkirinê ne, divê ku ji bo pêşveçûn û bihêzkirinê piştgirî bidin. Ji bo kesên ku dixwazin di zimanê Kurdî de bibin pispor, hîn jî du kêmâsi û astengiyên bingehî hene. Yek jê tunebûna bernameya doktorayê ye, ya din jî ew e ku di Serokatiya Lijneyê Navzanîngehî de, hîn jî navê zimanê Kurdî neketiye listeya beşen doçentiyê. Ji ber vê yekê, ji bo kesên namzet ku dixwazin serî li doktora û doçentiyê bixin, divê ku di demeke kurt de û bi lezgînî ev her du kêmâsi û astengî ji holê bêr rakirin.

Ji 2011an û vir ve gelek gavêngirîn hatin avêtin; li akademî û xwendingejan, ji aliyê hindekariyê ve, gelek pêşveçûn hatin bidestxistin û xebat hatin meşandin. Xwendekarênu ku ji Fakulteyê Edebiyatê, dê

bawernameyên xwe bigirin, ji bo pêşveçûnê Zazakî û Kurmancî yên ji aliyê zimanzanî, edebî û hîndekariyê ve, dê xwedî li vê yekê derkevin û ji bo avêtina hîm û asasên zexim ked bidin. Kesên ku lîsansê qedandine û karê wan Zazakî an ji Kurmancî ye, dê li her derê dînyayê bikaribin ji xwe re kar bibînin, vekolînan bikin.

Li Tirkiyeyê kesên ku Kurmancî û Zazakî diaxivin, ji aliyê karîna mêtî ve jî dê bikaribin Tirkî di hişê xwe de bêjing bikin û ev yek jî dê hêza wan a têkiliyên civakê bi pêş ve bibe. Ev yek ne bi tenê ji aliyê têkiliyan ve, dê ji aliyê gelek kirariyên karîna mêtî ve jî kîrhatînen axaftvanan zêde bike. Bi gotineke din, hejmara zimanan a di hişê me de, dê di keşfa aramî û serkeftinê de, wekî dîtina riyên cuda derkeve meydanê. Em bihêzkirina zimanên xwe, hêzê bidin hişê xwe!

Divê ku mirov qîmet û rûmeta her zimanê cîhanê bigire û piştgirî bide kesên ku digirin; lewre ev yek ew aramî ye ku hêviyên civakan zindî dihêle.

*Cejna we ya ziman a 15ê gulanê pîroz be!*

Prof. Dr. Hasan Çiftçi, Zanîngeha Çewlikê

Doç. Dr. Abdurrahman Adak, Zanîngeha Mêrdîn Artûklûyê

Yrd. Doç. Dr. Orhan Varol, Zanîngeha Wan Yuzuncu Yılê

Yrd. Doç. Dr. Ercan Çağlayan, Zanîngeha Mûş Alparslanê

Doç. Dr. Aziz Yağan, Zanîngeha Dîcleyê

# YAŞASIN ZAZAKİ, KURMANCI ve TÜM DİLLER

Bingöl, Diyarbakır, Mardin, Ağrı, Hakkari, Siirt, Van, İstanbul, Şırnak'ta 27 Zazaki ve Kurmancı öğretmeni Milli Eğitim Bakanlığı kadrosunda olmak üzere resmen öğrencilerle sınıflarda buluşmaya devam ediyor. Bakanlığın talebi üzerine 5, 6 ve 7. sınıflar için ders kitaplarını Mardin Artuklu Üniversitesi öğretim elemanları hazırladı. Bakanlık sadece 5. sınıflar için Zazaki ve Kurmancı kitaplarını okullara dağıtıyor ve önumüzdeki yıl diğer sınıfların kitaplarının basımı ve dağıtımını artık geciktirmemelidir. 8.sınıfların ders kitabı ise hala hazırlanmadı.

Zazaki ve Kurmancı öğretmenleri diğer tüm branş öğretmenlerinin haklarına sahipler ve bu hakları kullanarak Zazaki ve Kurmancı için normalleşmeyi hızlandırmayı. Örneğin, Batman'da hafta içinin yanı sıra hafta sonu yetiştirmeye kursları da başlatıldı ve devam ediyor. Halk Eğitim Merkezlerinde de Zazaki ve Kurmancı dersleri başlatılması için Bakanlığa modül önerildi, geciktirilmesine rağmen onay bekleniyor.

Öğrenciler sınıflarda, koridorlarda, öğretmenler odasında, okul bahçesinde, okul dışında Zazaki ve

Kurmancı'yi kullanmaya başladı. Bazı evlerde çocuklar aileyle Zazaki ya da Kurmancı sohbetlere katılmaya başlarken, bazı evlerde de çocuklarımız aileyi Zazaki ya da Kurmancı konuşmaya davet ediyor. Özellikle, kaybolmakta olan diller kategorisinde yer alan Zazaki'nin sözel ve yazınsal olarak görünürüğünün artması ve güçlenmesi cesaret vericidir.

Yardımcı ders materyallerinin fiyatları düşük gelirli öğrenciler için çok yüksektir. Kamu ve özel sektörün bu öğrencilerimize yardımcı ders materyallerinin sağlanmasında destek olması gerekmektedir.

Bakanlık tarafından geçtiğimiz yıl özel okullar dahil bu dersi seçen öğrenci sayısı 23 bin olarak açıklanırken, bu yıl 85 bin sayısı verildi. Bu anlamlı artış bereketini de beraberinde getirecek; önumüzdeki yıllarda atanacak öğretmen sayısını ve üniversitelerin lisans bölümlerine ilgiyi daha da artıracağı gibi, yazarların ve yayınevlerinin yardımcı ders materyali hazırlamaya yönelik mesini de hızlandıracak. Zazaki ve Kurmancı'den artık "ekmek parası" kazanılabilir ve bu, öğrenci velileri

dahil büyük bir çevreyi yörünge sine çekmeye devam edecek.

İstanbul, Adana, Mersin, İzmir, Antalya, Bursa, Ankara başta olmak üzere Zazaki ve Kurmancı dersini vermek isteyen öğretmenlerin il ya da ilçe Milli Eğitim Müdürlüklerine başvurması, dönem başından itibaren velileri sürekli bilgilendirmesi ve de bu okullardaki öğrenci ve velilerin bu derslere ilgi göstermesiyle Zazaki ve Kurmancı'nın olağanlaşması ve yaygınlaşması için önemli bir gelişme daha sağlanacaktır.

Mardin Artuklu Üniversitesi'nde ki Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü bu Haziranda, Tunceli Üniversitesi Zaza Dili ve Edebiyatı Bölümü bir yıl sonra ve Bingöl Üniversitesi Doğu Dilleri ve Edebiyatı (Kürt Dili ve Edebiyatı, Zaza Dili ve Edebiyatı) ile Muş Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı bölümleri ise iki yıl sonra ilk mezunlarını verecek ve süreç daha programlı ve akademik bir boyut kazanmış olacak. Mardin Artuklu Üniversitesi, Milli Eğitim Talim ve Terbiye Kurulu'na bu ylinky Kürt Dili öğretmenlik atamalarında lisans mezunlarına da kontenjan verilmesi için başvuruda bulundu ve olumlu yanıt alındı. Bu yıldan sonra Kürt Dili öğretmenlik kadrolarına öncelikle Kürt Dili ve Edebiyatı lisans mezunları ata-

nacak, kalan kadrolara ise Kürt Dili tezsiz yüksek lisans mezunları içerisindeinden atama yapılacak.

Mardin Artuklu, Tunceli, Muş Alparslan, Bingöl, Van Yüzüncü Yıl Üniversiteleri Zazaki ve Kurmancı çalışmalarına lisansüstü düzeyde devam ediyor. Ankara Üniversitesi'nde Zazaki ve Kurmancı dili üzerine tez çalışmaları başlatıldı. Mardin Artuklu Üniversitesi öğrencilerinin tümü Kürtçeyi seçmeli ders olarak görüyor. Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi öğrencilerine Zazaki ve Kurmancı dersleri verilmesi de önemli bir adımındır. Zazaki ve Kurmancı derslerini üniversite öğrencileri ayrıca seçmeli olarak alabiliyor.

Harran, Siirt, Hakkari ve Dicle Üniversiteleri de tezli ve tezsiz yüksek lisans programlarını başlatmak için hazırlık yapıyor. Bugüne dek en az 1500 lisansüstü mezun verildi. Sayıdan ziyade önemli olan nokta bu kadar kişi akademik kriterlerle araştırma yapmayı öğrendi ve edindikleri disiplinle çalışmalarını devam ettiriyor. Açılmış ve açılması planlanan Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümündeki akademik yapı YÖK gibi karar verici mercilerin de desteği ve çeşitli teşviklerle güçlendirilmelidir. Kürt Dili alanında kariyer yapmak ve çalışmak isteyenler için hala iki temel eksiklik

mevcuttur. Bunlardan ilki Kürt Dili doktora programının açılmamasıdır. İkincisi ise, Üniversitelerarası Kurul Başkanlığı'nın doçentlik alanlarına Kürt Dili'nin eklenmemiş olması. Bu nedenle, doktora ve doçentlik için başvurmak isteyen adaylar bu iki efsikliğinin acilen giderilmesini bekliyor.

2011 yılından beri kücümsemeyecek adımlar atıldı; akademik ve okullarda öğretim açısından sayısız gelişme sağlandı, çalışmalar yapıldı. Fen Edebiyat Fakültelerinden mezun olacak öğrenciler Zazaki ve Kurmancı'nın dilbilimsel, edebi ve öğretim açısından sahiplenilmesine, temellerinin sağlamlaşmasına ve gelişimine emek harcayacaklardır. Meslekleri Zazaki ya da Kurmancı üzerine

olacak lisans mezunları dünyanın her yerinde iş bulacak, araştırma yapabilecektir.

Türkiye'deki Kurmancı ve Zazaki'nin konuşucuları Türkçeyi de bilişsel dil düzeneklerinde harmanlayarak iletişim güçlerini çok daha iyi seviyelere çıkarmaktadır. Bu sadece iletişim boyutunda değil, farklı bilişsel eylemlerde de konuşucuların yetkinliklerini artırmaktadır. Yani zihnimizdeki dil sayısı başarı ve mutluluğun keşfinde yeni ve farklı yolların oluşumuyla eşdeğerdir. Zihnimizi güçlendirelim, dillerimizi güçlendirerek!

Dünyadaki her dilin kıymetini bilmek ve kıymet bilenleri desteklemek toplumların umutlarını diri tutan bir mutluluktur.

### *15 Mayıs dil bayramımız kutlu olsun.*

Prof. Dr. Hasan Çiftçi, Bingöl Üniversitesi

Doç. Dr. Abdurrahman Adak, Mardin Artuklu Üniversitesi

Yrd. Doç. Dr. Orhan Varol, Yüzüncü Yıl Üniversitesi

Yrd. Doç. Dr. Ercan Çağlayan, Muş Alparslan Üniversitesi

Doç. Dr. Aziz Yağan, Dicle Üniversitesi

Nerinaazad / Aziz Yağan

# Çend gotin li ser kurdî-kurmancî

Hesen Huseyîn Deniz

**D**i bin navê „çend gotin li ser kurdî“ de, dixwazim hinekî balê bikişînim ser grîngiya bikaranîna zimanê dayikê û awayên rast ên bikaranîna zimên. Bê guman berya bikaranîneke rast, pêwîstî bi bikaranînê heye. Ji kesekî/keseke zimanê dayika xwe bi kar neyne, nikaribe bîne, nexwaze bîne mirov nikara daxwaza bikaranîna rast bike. Divê destpêkê daxwaza bikaranînê hebe ku mirov êdî derbasî daxwaza bikaranîneke rast bibe.

Gelê me yê li Anatolya Navîn dijî, tevî bi sedê salan e ji Kurdistanê dûr dijîn jî, zimanê xwe parastine. Di nava malbatê de, axavtina bi kurdî bûyereke grîng e. Îroj gava mirov telefonekê dide Kurdistanê – mînak Riha, Mêrdîn, Amed, Semsûr û gelek derên din, yekser bersiva te bi tirkî tê dayîn û mirov bi vê yekê xemgînî dibe. Lê gava mirov telefonekê dide Anatolya Navîn hîn jî bersiva te bi kurdî tê dayîn û ev yek jî kêfxweşiyekê dide.

Pêsiyêن kurdan gotine: „*dûr bi nûr e*“. Di wateya „hesret, hezkirinê

tîne“ de hatiye gotin. Dema mirov ji welatê xwe dûr be, hesreta welêt zêdetir dibe û bi vê sedemê xwedîderketin jî xurtir dibe.

Mixabin ji ber politîkayêن asîmîlasyona dewletên dagirkirêن Kurdistanê, îroj pirahiya zarokêن kurd êdî ji dayikên xwe çîrokêن gelêri yêن kurdî nabihîsin, ji ber televizyona tirkî ranabin û êdî di nava malê de jî bi dayik û bavê xwe re bi tirkî didin û distînin.

Li aliyekî bilindbûn û pêşdeçûna siyaseta kurdî li Bakurê Kurdistanê, li aliyê din serdestbûna asîmîlasyona li ser zimanê kurdî, hema mirov dikare bêje ku ser bi ser diçin. Siyaseta kurdî ya li Bakurê Kurdistanê, mixabîn ji bo piştê li politîka û pêkanînê asîmîlasyonê bişkîne, ne di nava hewldaneke bi rêkûpêk û bi israr de ye. Nêrîneke wiha çewt li ser kurdan hatiye çekirin : „Em pirsgirêka kurd çareser bikin, wê ziman ji ber xwe li pêş bikeve!“

Berê li Kurdistanê rojname, radyo, televizyon û saziyên kurdî

tinebûn. Tenê êvaran zarok, ciwan, jin, zilam, pîr, kal tev li ber radyoya dengê Êrivanê diciviyan û guh di- dan ser stranên gelêri. Lê wê demê zarok di malbatê de bi dayik û bavê xwe re bi kurdî diaxivtin û dema radiketin, digotin „yadê ka ji min re çirokekê bêje“, dayikan jî dest bi gotina çirokeke gelêri dikirin. Lê niha bi dehan televizyon, kovar û rojnameyên kurdî hene, lê mixabin jiyan ne bi kurdî ye û kesek jî ji bo guhertina vê rewşa xerab ne xwediyê bernameyeke giştî ye. Di vê wateyê de zarokên kurd bê xwedî ne...

Ji bo hemû partî û saziyên kurd, li Bakurê Kurdistanê pêwîstî bi xwep- lankirineke li ser bingehê serdestkiri- na zimanê kurdî heye. Têkoşîn rê li ber zimên vedike, lê ev yek li hemberî pêla xurt a asîmîlasyonê têrê nake. Pêwîstî bi plansaziyên taybet heye. Mirov nexweşekî giran, bi birina ber devê deriyê nexweşxaneyê, ango bi razandina li nexweşxaneyê nikare sax bike. Divê bijîşk li serê bicivin û binêrin, bizanin bê ka çawa dikarin wî ji vê nexweşiyê rizgar bikin. Ji bo kurdan jî divê mirov ji hundirê malan dest pê bike û heta sazî û partiyan, rêxistin û komeleyan zimanê rojane yê danûsitendinê bike kurdî. Divê ev yek wekî erkeke netewî û mirovî were bidestgirtin û bi israr

bê meşandin. Ne ku mirov bi kurdî silavê bide gel û saetekê ji wan re bi tirkî biaxive. Gel li pêşengêñ xwe dinêre; dema dibîne ku ew bi tirkî diaxivin, dibêjin; „qey gotina mirov wer tê guhdarîkirin“ û ew jî dest bi tirkî dikan û cinawirê asîmîlasyonê bê ku zehmetiyê bikişîne, tevna xwe bi vî awahî dipêce ser mirovên me.

Di lêkolînên zanyarî de nîşaneyâ zindibûn an mirîbûna zimanekî li gorî tibaba bikaranîna wî zimanî ya ji aliyê zarokan ve tê pîvandin. Ger zimanek jî aliyê zarokan ve tê bikaranîn, ew zindî, ger nayê bikaranîn di rêka mirîbûnê de tê hesabinadin. Mixabin em nikarin bêjin ku pirahiya zarokên kurd bi kurdî didin û distînin. Ji bo vê yekê, pêwîstî bi tedbîrên grîng û bi lez û bez heye. Hevalekî min ê ji Anatolya Navîn dibêje ku, niha dema mirov diçe Anatolya Navîn, êdî wan jî dest bi tirkî kirine. Heyf mixabin...

Ev pirsgirêk bi nivîsek-du nivîsan çareser nabe, ji ber ku pirahiya kurdan ji xwe bi kurdî naxwînin, yên dixwînin jî hinek ji wan zêde tênagihêjin, hinek jî guh nadîn ser. Lê dîsa jî wekî mirovekî/e kurd divê em erka xwe bi cih bînin û ji gelê xwe re binivîsin û bêjin ku, „em dixwazin bi kurdî bijîn! Jiyaneke ne bi kurdî be, ew ê nebe ya me! Bila

sed dewletên me çêbibin, bila demokrasiya herî dewlemend a me be, bila ji erd û ezmanan zêr bibarin ser serê me; ger emê nikaribin bi zimanê dayika xwe bidin û bistînin, zarokên xwe perwerde bikin û ji wan re çirokên ji hinava gelê xwe, bi zimanê dayika xwe bêjin, em ci ji wê dewlemendiyê bikin?"

Keda em di vir de bidin, dilopeke av ji behrekê ye; lê dîsa jî rûmeteke wê heye; herî kêm em bi vê nivîsê û bi nivîsen pey re werin, dixwazin bêjin ku „em alîgirê bikaranîna zimanê kurdî ne û em li dijî asîmîlasyonê cih digrin û têdikoşin“. Ji bo kesen ku nîrxê vê yekê nizanibin, yan jî bîr nebin, dixwazim mînakeke kin ji dirokê bidim:

Dibêjin ku gava Nemrût bi manciniqê Hz. Birahîm ji kela Rîhayê diavêje nava êgir, gimgimoka kesk -ku hinek wek marmarok jî bi nav dikin- bi devê xwe avê tîne û pifî ser êgir dike. Hz. Birahîm vê yekê dibîne û ji nava êgir bang lê dike, dibêje; „tu ci dikî, tu dibêjî qey bi wê dilopa ava tu tînî, tê karîbi vî zirecêbê êgir vemirinî?“

Gimgimok ava di devê xwe de vala dike ser êgir û bersiva wî wiha dide: „Dibe ku bi dilopa ava tînim agir venemire, lê herî kêm bila zalim zanibin ku ez ne li aliyê wan, li aliyê te me.“

Belê em jî dixwazin bêjin ku em bi bikaranîn û nivîsandina zimanê xwe, ne li aliyê dagirkirêna asîmîlist û hevkarêwan ên bi zanistî angonêznanî zimanê dayika xwe bi kar naynin, li aliyê kurdî û kurdewariyê ne...

Di roja me de bi rastî li hemberî hovitiya cinawirê asîmîlasyonê, pêwîstî bi diyarkirina aliyê xwe heye. Ger tu alîgirê kurdî yî, wê demê çîma tu bi kurdî naaxivî, nanivîsî, naxwînî, nakenî û nagirî?

Yek alîgirê kurdî be, lê bi tirkî bijî; ew ne rast e. Gelê kurd, ger xwe hema îroj bi lez û bez ji vê çewtiyê nefilitîne, bawer bikin, sibe-duzbe wê pir dereng be.

Piştî vê bibîranîna kin, dixwazim hinekî jî li ser xala grîngiya hîndekariya kurdî rawestim. Gava dibêjîm „kurdî“ divê ev peyv wek beramberiya „zimanê dayikê“ were têghiştin. Ji ber ku grîngiya zimanê dayikê ji bo her gelî di heman wateyê de ye. Tirkî ji bo tirkekî, ingilîzî ji bo ingilîzekî, elmanî ji bo elmanekî çîqasî grîng be, ji bo kurdekkî jî kurdî ewqasî grîng e.

### Çîma zimanê dayikê grîng e?

Mirovêli ser xakekê angonêli ser xakêncuda cuda dijiyan, gava dest bi bikaranîna zimanê xwe kirin, li gorî

erdnîgariya li serê û awayê jiyana dikirin zimanê wan cuda cuda li pêş ket. Cudatiya derxistina dengan a ji dev, zimanêن cuda cuda afirand û êdî ew ziman bûn çanda wan mirovan heta roja me bi xweguhertin û sazkin hat.

Di roja me de, gava mirov li ser zimanekî lêkolîneke hûrgulî bike, mirov çi dibîne? Ji roja yekem a dest bi axavtina bi wî zimanî hatiye kirin heta roja me çand û kevneşopiya bi wî zimanî hatiye jiyîn, dikare tê de lê bikole û bibîne. Bê guman çandên hevbeş jî hene. Dîsa di navbera çandan de danûsitendin û vegirtina ser hev jî heye, lê belê di nava her zimanekî de taybetiyêن çandî yên tenê bi wî zimanî dikarin derkevin ser ruyê avê jî hene û ya grîng jî ev yek e.

Zarokekî/e kurd gava ji dayik dibe û bi dayika xwe û endamên din ên malê re hînî kurdî dibe, bi rêka zimanê dayikê çanda kurdinî, dîroka kurdistanê, kevneşopiyyêن kurdan û wêjeya kurdî hîn dibe, xwezaya Kurdistanê dinase.

### **Ev yek çawa pêk tê?**

Gava dayik ji zaroka xwe re lorîkekê bilorîne; wê nebêje; „Orta Asyadan at sırtında kılıç elde geldik“ berûvajî wê bêje; „Şenga min, penga min, da-

yik çûye zonan, xwariye pelên kezwanan, şîr ketiye guhanan...“

**Wê demê zarok fêr dibe ku li welatekî xwedî zozan dijî, li vi zozanî darêن kezwanan şîn dibin... û hwd.**

Zarok gava li strana Kawîs Axa Çemê Çetelo guhdarî bike; hînî „neslin deden, ceddin baban, hep kahraman türk milleti“ nabe, berûvajî, **wê zanibe ku axa Kurdistanê di bin dagırkeriya dijminan de maye û kelepçe li destê mirovên me dane û zilm li gelê me kirine. Zarokê/a wiha dîroka xwe fêr bibe, gava mezin bibe wê ji bo azadî û rizgariyê têbikoşe, ne ku li ber deriyê dewletê destê xwe vegire û xulamtiyê bike.**

Ez dikarim van mînakan hîn jî zêdetir bikim, lê di rastiyê de ev her du mînak jî têrê dîkin ku em xwe bigihînin grîngiya bikaranîna zimanê dayikê.

Em bi zimanekî din nikarin çanda xwe bidin zarokên xwe. Mirov hînî zimanekî din dibe, ji bo ku çanda wî zimanî binase, bi kesen ji wî zimanî re bide û bistîne.

Dema kurdek tê elmanya, fransa, ango cihekî din çîma hînî elmanî, frensî ango zimanekî din dibe? Ji bo karibe bi wan mirovan re bide û bistîne, çanda wan, kevneşopiyyêن

wan binase ku ji xwe re di nava wê civakê de karibe cihekî biafirîne.

Wê demê mînakên me dane rast in. Her ziman di hinava xwe de çanda civaka wî zimanê jê re dayiktiyê dike dihewîne. Û kurdî jî ger zimanek e û ev ziman ger ji aliyê gelekî ango civakekê ve tê xwedîlêderketin, wê demê dîroka me, çanda me, kevneşopiyêne di hinava zimanê me de veşartî ne, em di nava zimankî din de nikarin lê yên xwe bigerin ango peyde bikin.

Ger em dixwazin wek kurdekî bijîn, wê demê emê bi kurdî bijîn. Ger em bi tirkî bijîn û em bêjin „em kurd in“, mixabin em nabîn kurd; ji ber ku jiyîna bi tirkî wê me hînî biwêjîn tirkî, wêjeya tirkî, çanda tirkî, awayê rûniştin û rabûna tirkî, xwarin û vexwarina tirkî bike. Gava ez wekî tirkekî rabim û rûnêm, wekî tirkekî bixwim û vexwim, wekî tirkekî bireqisim û bilîzim, çawa ez dibim kurd? Ev jî pirseke divê were bersivandin e.

Ev nayê wê wateyê ku mirov dema bi kurdî nede û nestîne, mirov nabe şoresger, demokrat, enternasyonalist, fermandar, parlamenter, burokrat, ango tiştekî din. Ev tev paye, raye ango rutbe ne. Lê ziman tiştekî din e; wekî xwîna di laşê te de ango wekî çermê ser goşt û

hestiyêñ laşê te dipêçe ye. Gelek kes dibêjin; „ez erka xwe ya welatparêzî, şoresgerî, demokratî, rewşenbirî ... pêk tînim, ma bi zimanê dayikê ne-peyivim, qey ez nabim welatparêz, şoresger, demokrat, rewşenbir? ...“

Bê guman tu dikarî bibî tev jî, lê tu bi kîjan zimanî diaxivî tu dibî welatparêz, şoresger, demokrat, rewşenbir ê wî zimanî...

Gava yek romenekê li ser kurd û kurdistanê binivîsine, lê zimanê vê romanê ne bi kurdî –mînak bi tirkî, ingilîzî, elmanî yan zimanekî din be; ji tevahîya xwendekaran di-pirsim, gelo ev romana li ser kurd û Kurdistanê wê li gorî pîvanên wêjeyî yên gerdûnî, di pirtûkxaneya cîhanê de, bikeve nav refika wêjeya kurdî, yan wêjeya zimanê pê hatiye nivîsandin?

Hûn tev dizanin ku pirtûkeke bi tirkî hatibe nivîsandin, di pirtûkxaneyê de dikeve refika wêjeya tirkî, ya bi ingilîzî hatibe nivîsandin, dikeve refika wêjeya ingilîzî û li ser tê nivîsandin wêjeya tirkî, wêjeya ingilîzî; çiqasî mijara pirtûkê kurd û Kurdistan be jî, nivîskarê wê ji sed bavikî ve kurd be jî, ji bo kurd û Kurdistanê canê xwe jî dabe, mixabin ji ber ku ew pirtûk bi zimanekî derveyî kurdî hatiye nivîsandin, nikare di refika wêjeya kurdî de cih bigre.

## **Rewş, pirsgirêk, mijar û çareserî evqasî zelal e**

Di nivîsarên din de, emê qala rêziman û bikaranîna awayê rast bikin. Bi taybetî gava mijara rêziman tê genteşkirin, gelek kes rêzikên rêzimanê kurdî (hinek wekî rêzimanâ kurdî dînîvîsinin, ji ber ku dibêjin têgihêngramerê mî ne- lê peyva ziman nêr e.) bi rêzikên zimanê din re didin ber hev ango tev li hev dikin û ev yek aloziyekê diafirîne.

Mînak, gava em li çapemeniya Kurdî dinêrin, pirahiyê nûçeyan ji zimanekî din –pirahî ji tirkî- tên wergerandin û di hişmendiya wergerê de hizirînek wekî tirkî heye. Dibêje; „Ji bo Rojava alikariyek tu jî bide“. Bi tevahî bi tirkî hatiye ramandin. „Rojava için bir yardım da sen ver“. Li vir peyva „yardım“ a tirkî pêşgir ango paşgir negirtiye, ji ber ku di zimanê tirkî de nêr û mî tineye. Kesê/kesa wergerandiye peyv bi peyv wergerandiye kurdî û peyva „bir yardım“ wekî „alîkariyek“ nivîsiye û dibêje.

Lê bi kurdî dema dibêje „alîkariyek jî tu bide“, her kurd

dizane ku ev hevok kêm e. Peyva „alîkariyek“ di vê hevokê de bireser e û divê were tewandin. Alîkarî peyveke mî ye û tewanga wê „ê“ ye. Wê demê divê bêje, Alîkariyekê jî tu bide. Ger em hîn rastir binivîsinin. Tu jî alîkariyekê bide. Yanî bê tewanga „ê“, hevok nabe kurdiyeke rast a li gorî rêzimanê kurdî.

Bi vê sedemê em niha li ser mîbûn û nîrbûna peyvan û pê ve girêdayî li ser veqetandek û tewangê rawestin.

Di hevokekê de, navdêr, lêker, rengdêr, hoker, bireser û h.wekî din têgihêngirêzimanî hene. Têkilî û girêdana di navbera van têgihan de, di zimanê kurdî de bi rêka nîrbûn û mîbûnê çêdibe. Di zimanê din de bi awayekî din çêdibin. Mînak; di tirkî de bi rewşen navan „ismin halleri“; di elmanî de bi artikelan; di frensî de bi daçekên nêr û mîbûnê (le, la) tên çêkirin. Di zimanê kurdî de jî bi rêka veqetandek û tewangê tê çêkirin. Em niha veqetandek û tewangê binasin.

## Di zimanê kurdî- kurmancî de veqetandek û tewang

Veqetandek; gava peyvek bi peyveke din ve tê bikaranîn û ji bo mirov zayend û hijmara her du peyvan ji hev veqetîne, ji bo peyva yekemîn tê bikaranîn. Ev peyv bi pirahî navek e û ev nav bi navekî din ve, bi rengdêrekê ve, bi hokerekê ve ango bi peyveke din ve ji hev tê cudakirin ango veqetandin.

Em vê rêzikê li ser peyvan, di hevokan de, bi awayê nêr û mî bibînin:

Ji bo peyvên nêr:

### zilam:

diyar	ne diyar	kom	
zilamê çeleng,	zilamekî çeleng,	zilamên çeleng	rengdêrî
zilamê Fatimê,	zilamekî Fatimê,	zilamên Fatimê	navdêrî
zilamê li malê,	zilamekî li malê,	zilamên li malê	hokerî

Ji bo peyvên mî:

### jin:

diyar	ne diyar	kom	
jina xweşik,	jineke xweşik,	jinên xweşik	rengdêrî
jina bijîşkî,	jineke bijîşkî,	jinên bijîşkî	navdêrî
jina li malê,	jineke li malê,	jinên li malê	hokerî

Em van mînakan di hundirê hevokan de bi kar bînin:

Zilamê çeleng ê li ber malê rûdinê, birayê Fatimê ye.

Jina xweşik a li ber malê rûdinê, xwişka Fatimê ye.

## Tewang

Gava peyvek bi tena serê xwe be û li pey wê navdêrek, rengdêrek ango hokerek neyê, lê belê pirahî lêkerek cih bigre, wê demê ji bo diyarkirina kit, kom, diyar, ne diyar û zayenda wê peyvê mirov tewangê bi kar tîne.

### Ji bo peyvên nêr:

Zilamî got (zilêm got) zilamekî got, zilaman got,

### Ji bo peyvên mî:

Jinê got, jinekê got, jinan got

Mirov vê rêzikê dikare wiha çêtir têbigihêje:

Wî zilamî got.

Wê jinê got.

Ji bo dema niha gava kirde sade be, bireser tê tewandin û mirov tewangê li vir bi kar tîne.

### **diyar**

Ez wî dibînim.

Ez zilamî dibînim.

Ez zilêm dibînim.

Li vir tê dîtin ku di zimanê kurdî kurmancî de du awayê tewangê heye. Yek tîpa „î“ li ser nav tê zêdekîrin, ya din tîpa dengdêr a di kîteya dawîn de, tê tewandin dibe „ê“. Ev yek pirahî dema tîpa di kîteya dawîn de „a“ be tê bikaranîn.

Li hinek herêman jî tenê peyvên mê tênen tewandin û yên nêr nayênen te-wandin.

Ez zilam- dibînim.

Ez jinê dibînim.

### **Ne diyar**

Ez zilamekî dibînim.

Ez jinekê dibînim.

### **kom**

Ez zilaman dibînim.

Ez jinan dibînim.

Bî kinahî ger em li ser guhertina peyvan a di hundirê hevokê de bi awayê, diyar, ne diyar, zayend û kom tiştekî rêzikî bêjin û bi zimanênen din re bidin ber hev, tişta ku di elmanî de wekî Artîkel, di tirkî de wekî halênen navan tênen danasîn, di zimanê kurdî-kurmancî de bi rêka veqetandek û tewangê tênen çêkirin û derveyî vî awayê me li jorê daye nasîn, ti awayekî din ê guhertina navan tineye.

Bi vê sedemê kurdî ji gelek zimanênen din sadetir û hêasantir e.


# Hepveyvînek bi Memê Mala Hine re

Alî Çiftçî

*Roj baş, birêz Muhammet! Di destpêka vê hevpeyvînê de dixwazim tu xwe bidî naskirin.*

– Ez di sala 1975'an de li gundê Yuzukbaşiyê ku girêdayî navçeya Polatliyê ya ser bi Enquerê hatime dinyayê. Ji malbata me re Mala Hine dibêjin. Ji ber wê jî ez bi tevî navê Muhammet Gözütok, navê Memê Mala Hine jî bi kar tînim.

Ez heft salî bûm em çûn Eskişehîrê. Min heta dibistana amadeiyiyê li Eskişehîrê xwend. Dû re me mala xwe bar kir Polatliyê. Li wir min dibistana amadeiyiyê qedand. Di sala 1991'an de min dest bi xwendina beşa endeyzariya zîraetê ya zanîngeha Enquerê kir. Di sala 1992'an de jî ber xebatêن min ên kurdewariyê bîryara girtina min derket. Ez jî naçar mam ku xwendina xwe di nîvî de bihêlim û biçim başûrê Kurdistanê. Di sala 1997'an de li bakurê Kurdistanê hatim girtin û ji ber xebatêن xwe yên siyâsî heşt salan di girtîgehan de mam. Di dawiya sala 2004'an de ez ji girtîgehê derketim. Wê salê min dest bi xwendina beşa felsefeyê ya Zanîngeha Enquerê kir. Dûre beşa radyo-televîzyon û sînemaya heman



zanîngehê xwend. Di sala 2011'an de di beşa felsefeyê ya Zanîngeha Enquerê de min mastira xwe qedand. Niha jî li zanîngeha Stenbolê di beşa felsefeyê de doktora dikim.

*Tu dikarı hinekî qala zaroktiya xwe bikî? Hevalên te yên zaroktiyê, lîstikên ku tu bi hevalên xwe re dilist, bûyer an serpêhatiyeka ku di zaroktiya te de bûne ú di bîra te te mabin?*

– Mîna ku min got dema ku em ji gund derketin ez heft salî bûm. Wê demê ez di dibistanê de derbasî pola sisêyan bûbûm. Lê dema ku em li bajêr jî bûn her havîn em dihatin gund. Ji ber vê jî em ji çanda xwe, zimanê xwe dûr neketin. Lê belê nifşa me nifşeke bextreş e. Lewre ez pênc salî bûm li Tirkîyê derbeya 12'ye Îlonê çêbûbû. Ji ber tirsa vê derbeyê dê û

bavê min biryar girtibûn ku dê bi me re ne bi kurdî, lê belê bi tirkî deng bîkin. Dê û bavê min tenê dema ku hêrs dibûn, ev biryar ji bîr dikirin. Diya min dema ku hêrs dibû xwe ji bîr dikir û bi kurdî nifr dikir. Ez dikarim bêjîm ku ewil ez bi rêya nifran kurdî hîn bûm. Bêguman di mala me de dê û bavê min, xwîşk û birayên min ên ji min mezintir bi kurdî deng dikirin. Ji ber wê ji min kurdî baş fêm dikir. Mebesta min ji kurdî helbet diyalekta kurmancî ye. Her wisa min ji di şevê dirêj ên zivistanê zarokatiya xwe de tehma guhdarîkirina çîrokêñ kurdî girt. Şevê dirêj me lîstika bi navê qıştik dilist. Havînan dema ku em diçûn gund, em serê sibê ji malê derdiketin û heta êvarê em li derive diman û bi tevî hevalêñ xwe me dilist û avjenî dikir.

Dema ku ez diçûm pola dawîn a amadeiyî, min dest bi xebara hînbûna gramera kurdî kir. Wê havînê ez çûm gund û min ji pîrika xwe re got “Kurmanciya min ne rind e, ez havînê li ba te bimînim da ku kurmanciya min bi pêş keve.” Pîrika min ji ber ku tirkî nedizanî wê tim bi me re kurdî deng dikir. Dema ku min wisa got wê ji bi devoka me wisa bersiva min da: “Da hara. Xalk hoyê tirkî ya, dinikê ma jî hotiye kurmancî hu dikiya!” Pîrika min nexwest ez kurmancî hîn bibim. Li

gor wê bi zimanê kurdî mirov tiştek bidest nedixist. Lê paşê kurmanciya min gelek baş bû, ez diyalekta soranî hîn bûm û min gelek kitêb wergerandin kurmancî. Piştî ku ez ji girtîgehê derketim heyâ niha debara xwe bi wergerê dikim. Pîrika min sax bûya min ê jê re bigota “Va ye pîrê, ez bi zanîna wî zimanê ku te nedixwest ez hîn bim debara xwe dikim.”

*Ger tu bikarî, malbata xwe bidî nas-kirin, ji kuderê hatine û li Polatliyê bi cîhbûne? Serpêhatiya koçberiya malbatê, ku ji aliyê mezinêñ we ve dihat qalkirin?*

– Mîna ku min got navê malbata me Mala Hine ye. Bavê kalê min yekî por sor bûye. Loma jê re gotine Hine û paşê navê malbata me jî bûya Mala Hine. Em ji eşîra Canbegan in û li gor gotinêñ mezinan, kalêñ me di nîveka pêşîn a sedsala 19’an de hatine li başûrê Polatliyê, li nêzikî Yunakê gun-dek ava kirine. Navê wî gundê Siwêdî ye. Bi tirkî dibêjin Yüzükbaşı. Di sala 1952’an de cihê gund guherandine. Gundê me yê niha şes an ji heft kilometre dûr e ji cihê berê. Gundê me berê girêdayî Akşehîrê bûye. Dema ku artêşa Yewnan hatiye nêzikî Polatliyê neketine nav gundê me. Lewre gundê me girêdayî Akşehîrê, ango girêdayî Konyayê bûye ku li gor peymana dewletên serkeftî yên şerê yekem ê

cîhanê Konya diket para Îtalyayê. Lê belê eskerên Yewnanan ketine gundêñ din ên kurdan ku nêzî gundê me ne. Lê belê ji ber hin sedeman eskerên Yewnana çend car diavêjin ser gundê me û çend mîrêñ gundê me bi xwe re dibin ku heta niha aqubeta wan nayê zanîn.

Min her tim ji mezinan dipirsî ka em kengê, ji ku û çima ji Kurdistanê hatine. Lê belê kesî bersiveke wisa ku mirov pê tatmîn bibe, neda. Li gor gotinêñ wan em ji derûdora Meletiyê û Semsûr hatine. Lê kesî behsa wê yekê nedikir ka em çima hatine. Ew yek tiştekî gelek ecêb e. Lewre kurd bi wê yekê navdar in ku herî kêm heft bavê xwe dizanin. Yêñ me jî heft bavê xwe dizanin, lê belê nizanin ka bavê şesan an jî heftan li ku hatiye dinyayê, an jî ji ku hatiye Anatolyayê. Li aliyê me gundêñ Kurdan bêtir di dawiya sedsala 19'an de ava bûne. Beriya wê heta demekê bi awayekî nîv koçer, di konan de mane. Jixwe eşîra me koçer bûye û ev koçerbûn heta sala 1952'an bi awayekî dewam kiriye. Çanda me bêtir li ser xwedîkirina pez ava bûye. Çandin gelek kêm bûye.

Sedema ku mezinêñ me nizanin ka ji ku hatine bi dîtina min nebûna têgeha welat e. Eger tu li gund an jî bajaran niştecîh nebî, zeviyêñ te nebin, tu di nav xaniyêñ xweşavakirî de

nebî, tu xwedî keriyêñ pezan bî, tu di nav konan de bijî tu nabî aîdê axekê. Aîdiyeta ax, girêdayîbûna bi axê re bi cotkirinê dest pê dike. Eger tu ne bi cotê, lê bi xweyîkirina pez û dewaran debara xwe bikî tu xwe bi axekê girêdayî hîs nakî. Dema ku hêzek were te ji wir biajo tê wisa bêjî: "Ne xem e. Çawa be ez dikarim konêñ xwe berhev bikim, bi tevê keriyêñ xwe yên pez herim devereke din. Li wir konêñ xwe vedim û pezê xwe biçêrînim." Bi dîtina min awayê jiyanâ kal û pîrêñ me wisa bûye. Niha li ba Kurdistan Anatolyayê têgeha welat heye. Lê belê ev welat ne Kurdistan e, Anatolya ye. Lewre gund û zeviyêñ wan li Anatolyayê ne, xaniyêñ wan li wir in. Eger hêzek were wan ji wir biajo jiyanâ wan serûbin bibe, heta trajediyeç çêbe. Mirov dikare bêje ku êdî ew girêdayî axekê ne ku ew bi wê axê debara xwe dikin.

*Min navê te cara evîl, qasî ku tê bîra min, di dawîya salêñ 1990î de bi namêñ te yén ji hepisxanê, ji me ra dişand, bîhîstibû. Gelo tu yê bikaribî hinekî gala wê demê biki?*

– Dema ku kovara Bîrnebûnê derket ez li girtîgehê bûm. Birayê min li Polatliyê kovara we belav dikir û her hejmar digîhande min jî. Min jî çend caran ji kovara we re name şandin û ji

xebatkarên kovara we ú cenabê te re spasî kiribû. Piştî demekê êdî kovar neketin destê min. Loma jî min ji we xwest. Ji wê şûnde we ji min re kovar şandin. Dema ku ez li girtîgehê bûm min ji nêz ve kovara we şopand, her nivîseke kovarê xwend. Bi rastî jî di girtîgehê de dema ku hejmarên Bîrnebûnê digihîştin destê min, dilê min fireh dibû û min bi kêfxweşî nivîsên wê dixwendin. Dikarim bêjîm ku Bîrnebûn di dîroka çapemeniya kurdî de xwedî cihekî girîng e. Lewre hema bêje bîst sal e, bê navber çap di-be, di nav kurdên Anatolyayê de to-re-ke peywendiyan ava kiriye, her wisa di nav kurdên Anatolya û Kurdistanê de pirek ava kiriye. Ji ber vê xebata dûr û dirêj û hêja ez we pîroz dikim. Mala we ava. Hêvîdar im ev xebata we bido-me û serkeftinêñ nû bi dest bixe.

*Piştî ku tu ji hepisxanê derket te çi kir, bi çi karî re mijûl bû? Navê te wek fotografi û derhinerê film ðe jî tê naskirin. Tu dikari hinekî qala ev hunera xwe bikî, bê ka ev hevesa te ji ku tê?*

– Piştî ku ez jî girtîgehê derketim, min dest bi xwendina beşa felsefeyê ya zanîngeha Enqerê kir. Dema ku min dixwend, di sala 2006'an de dîwana xwe ya helbestan a bi navê Hê-sîn belav kir. Kitêb ji hêla weşanxaneya Pêriyê ve hate çapkiran. Her wisa min


çend kitêbên din wergerandin kurdî. Ji hin kovaran re nivîsên kurdî nivîsandin. Her wisa min pirtûkeke mamoste Îsmaîl Beşîkcî wergerande soranî û kitêba Elaedîn Secadî ya bi navê Rıştey Mirwarî ji bo tîpêñ latînî transkrîbe kir. Di sala 2010'an de ez li Stenbolê niştecih bûm. Di sala 2012'an de min li zanîngeha Stenbolê di beşa felsefeyê de dest bi doktorayê kir.

Heman salê me di bin banê Weqfa Îsmaîl Beşîkcî de Koma Sînemaya Kurdî ava kir. Em li ser sînemaya kurdî dixebeitin û bi awayakî berdewamî berhemên sînemaya kurdî li wir nîşan didin. Her wisa di Desteya Çavdêriyê ya weqfa Îsmaîl Beşîkcî de cih digirim. Ji sala 2012'an vir ve di Enstituya Kurdî ya Stenbolê de dersên soranî didim. Her wisa di desteya kovara Zendê de cih digirim û di vê kovarê de nivîsên li ser felsefeyê dinivîsim. Hewl didim ku nivîsên kurdî yên li ser felsefeyê zêde bin û têgehêñ felsefî di ferheng û pirtûlxaneya kurdî de cih bigirin.


Di sala 2011'an de min belgefîlma bi navê Masîvanêñ Bejiyê ku li ser kurdên Mêrdînî yên ku li Stenbolê masîvanîyê dîkin, çê kir. Ev belgefîlm kurdî bû û di gelek festivalan de hate nîşandan. Par me li Pasûrê dîmenêñ kurtefilma

bi navê Xalxalokê girtin. Montaja vê kurtefilmê ku min derhêneriya wê kir, îsal qediya. Em niha wê kurtefilmê dişînin festivalan. Her wisa par li başûrê Kurdistanê min wêneyên belgefîlmeke bi navê Geştek li Başûr girtin. Niha li ser montaja wê filmê dixebeitim. Di vê belgefîlmê de çend rewşenbirêن bakurê Kurdistanê li başûrê Kurdistanê geştek li dar dixin. Belgefîlm li ser vê geştê ye. Ez hêvî dikim ku di nav sê çar mehan de vê belgefîlmê biqedînim.

Piştî ku ez girtîgehê derketim, min dît ku dîmen, berhemên sînemayê û televîzyonî ji berhemên nivîskî hêsanter digihîjin gel û ji zarokên heft salî bigire heta kal û pîrên heftê salî bala xwe didin berhemên dîmenî. Loma jî min biryar girt ku ez li ser radyo, televîzyon û sînemayê bixwînim. Di sala 2006'an de min dest bi xwendina wê beşê jî kir. Sînema çarçoveyeke gelek qewî ye û dikare mirovan di vê çarçoveyê de bigihîne hev. Hewcedariya kurdan jî platformeke wiha heye. Lewma jî di salêن dawîn de gelek berhemên hêja yên kurdî hatin danîn. Hêvîdar im kurdên Anatolyayê bi rîya berhemên sînemayî bi hev re peywendiyeke hunerî çêkin. Ez jî dixwazim di salêن bê de li ser kurdên Anatolyayê berhemên sînemayî çêkim.



*Tu wek kurdeki ji Anatoliyayê, li gelek deverên Kurdistanî geriyaye tu rewşa kurdên Anatoliyayê ya iro çing dibîni? Dema tu ji aliyê ziman û hişyariya neteweyî ve lêbinêre?*



– Di sala 1982 an ji 1983'an de gundiyeķî me yê 30 salî ji bajér hatibû nava qehwexaneya gund û "Selamun aleykum ey cemaat" gotibû. Wê demê kalekî me pêlava xwe avêtibû wî kesî û qêriyabû: "Tu fadi nokiya, têya viro tirkî dang dikiyal!" Wê demê li gundê me axaftina tirkî tiştékî gelek şerm bû. Tenê zarok carna tirkî dipeyivîn. Her wisa dema ku em li gund diçûn mektebê mamesteyan kê bi kurdî deng bikira ceza didan. Di wan salan de di nav malan de, li gund her kesî bi kurdî deng dikir. Lê belê niha rewş gelek cihê bûye. Politika ú alavên asîmîlasyonê bandoreke neyinî li ser civaka kurdên Anatolyayê kiriye. Niha zarok hema bêje bi kurdî nizanin. Mezin ji bi zarokên xwe re bi tirkî deng dîkin û tenê di nav xwe de bi kurdî dipeyivin. Lê belê di dawetan de bi taybetî di van salên dawî de kurdên Anatolyayê stranên kurdî lê didin û li neverê gelek komên stranbêjan hene ku ev kom tenê di dawetan de distrînin.

Di dîroka tékoşîna neteweyî ya Kurdistanê de em tim li rastî kurdên Anatolyayê têñ. Di nav endamên Cemiyeta Tealî ya Kurdan de em dibînin ku Kurdên Anatolyayê hebûne. Di nav refîn TIP'ê de kurdên Anatolyayê bi tevî kurdên ji Kurdistanê cih digirin. Her wisa di

salên 1970'yî de ji gelek şoresgerên kurdên Anatolyayê di nav tevgerên siyasi yên Kurdistanî de cihê xwe girtiye. Di salên 1990'î de gelek ciwanên kurdên Anatolyayê bûne gerîla û li ser çiyayê Kurdistanê şer kirine. Eger em rêjeya vê beşdariyê binihêrin, em dibînin helwesta siyasi ya kurdên Anatolyayê mîna hev nîn in. Mesela kurdên Cihanbeyli û Kuluyê bêtir xwedî li nasnameya siyasi ya kurdî derdikevin. Li deverên din ên kurdên Anatolyayê asta peji-randina nasnameya siyasi ya kurdî ewqas bilind nîn e. Wek mînak eger em rêjeya dengen partiyê kurdî li Cihanbeyli û Yunak bidin ber hev em ê bibînin ku di navbera wan de cihetiyeke mezin heye. Herdu navçe cîranê hev in û rêjeya kurdan li van herdu navçeyan nêzî hev in. Lê belê rêjeya dengen ku partiyê kurdan digire gelek cihê ne. Di hilbijartina dawî ya giştî de HDP'ê li Cihanbeyliyê %35, lê belê li Yunakê %7 girtiye. Ji ber ku gelek kurdên Kulu û Cihanbeyli sîh heta cil sal berê çûne Ewrupayê û li wir kurdên ku ji Kurdistanê hatine û tevgerên ku ji bo mafîn neteweyî têdikoşin nas kirine. Vê yekê wisa kiriye ku kurdên herdu navçeyan bêtir nêzî tékoşîna neteweyî ya li Kurdistanê bin. Lê belê ciwanên kurdên

Anatolyayê yên ku diçin zanîngehan bêtir bi xwendekarên kurd ên ji Kurdistanê re tevdigerin û helwes-teke Kurdistanî nîşan didin. Lê belê divê em ji bîr nekin ku hin problemên kurdên Anatolyayê hene ku ne wekî problemên kurdên Kurdistanê ne. Lewre kurdên Anatolyayê wek kêmnetewek in, lê belê kurdên Kurdistanê ne kêmnetewe ne. Ji ber vê ji lazim e kurdên Anatolyayê werin ba hev ji bo mafêñ xwe yên çandî û kêmneteweyî bixebitin. Bê gu-man di navbera rizgariya Kurdistanê û bidestxistina mafêñ kurdên Anatolyayê de peywendiyike bihêz heye. Lê belê em dibînin ku kurdên Anatolyayê rôexistinê xwe yên çandî û civakî hwd. ava nekirine. Divê kes û saziyêñ kurdewar ên kurdên Anatolyayê vê valahiyê tijî bikin. Eger ew sazî nebin rê li ber proseya asîmîlasyonê nayê girtin.

*Stranbêjén ku tu jê hez dikî?*

– Ez ji Nîzamettin Arîç û Ednan Kerîm pir hez dikim.

*Filmê ku kêfa te jê re tê?*

– Mandû (Îbrahîm Seîdî)

• *Nivîskarê/a ku tu niha dixwînî?*

– Helîm Yûsif – 99 Morîkêñ Belavbûyî  
Programa televîzyonê ku tu pir lê tema-  
şe dikî?

– Ez televîzyon temaşe nakim.



Mem û bavê xwe

*Hobi, mijûliya dema vala?*

– Film temaşe dikim.

• Xwarin û vexwarina ku tu pir ji hez dikî?

Li ba me xwarineke bi navê hevîrê bi kezebê birî heye. Ji wê xwarinê û ji ku-tîlkan pir hez dikim.

*Gotineka te ya dawî ku tu ji Bîrnebûnê  
re bêjî?*

– Bîrnebûn di çapemeniya kurdî de kovareke gelek girîng e û ji bo kurdên Anatolyayê destkefteke mezin e. Hêvîdar im Bîrnebûn dê bidome û serkeftî be.

*Mala te awa ku te wexta xwe ji bo vege-  
tand û pirsên me bersivandin!*

# STATÛYÊ GUNDAN

Seyfî Dogan

**hawar kurdên Anatoliyê Navîn hawar**

*carak din ro bi nîvro em xapandin neyar  
serê wana bixwe biryarê wan  
gundêñ me kirin mehelêke bajarêñ tirka*

## **Navêñ gundêñ me nasnama me yê!**

Kurdên Anatoliyê Navîn, li gor eşîretên xwe li deşte Qonyê, xwe bi cih kirine û hatina bicîkirin. Eynê eşîretê li çend gundan belabûye. Kurdên Anatoliyê Navîn, gundêñ xwe, bi eşîrete xwe navkirin û bi wan navan gundêñ hatine naskirin û têñ naskirin.

Lê dewletâ tirka, hemî navêñ gundêñ kurdan guherandin tirkîyê ji bo ku qeytana wanen bi etnîsê, dîrokê, kultur, mitolojîyê va veqetîne û wanen hîn rehet asîmîle bike.

Kurdên Anatoliyê ji kok û esaletên xwe bi dûr bixe û bêkok bihile. Xelkên bêkok ê wekî neçîrên bêzehmet in. Ê zu werin daqiltandinê.

Salê berê, dewleta tirka, destur hilda û li gor projêya bajarêñ mezin- Büyükk şehîr- şaredarîyê gundan îptal kir û statûya belde dînan mahelê qezan. Qezayê ku buyîne navend, bi piranî bajarêñ tirka ne.

Îro, wextê ku karûbarêñ te bi

şaredarîye hebe, gerek tu herî bajêr. Ji bo ku tu herî bajêr, tu hewcîyê wesitekê yî. Ji bo ku tu mesela xwe hal biki, dive tu bi tirkî deng biki. Wextê ku tu birçî bûyî, tê li wir xwarinê buxwî û peren xerc biki.

Ew bîryara ne li gor hiş û dilê me yê! Baş e! Temam! Lê em ji ci re ne!!! Em dê, navêñ gundêñ xwe, bi rîyên fermî, bi şunda biguherin navêñ kurdî. Bîrnebûnê ji bo vê meselê, numunê daxwaznamêk du caran di kovarê da nivîsand û weşand.

Heqî xwe bistîne! Reaksiyonê nîşan bide! Qûnê xwe ji herdê hilda û hereket bike!

Kar nêynika te ye! Gotinan qiyemetê xwe tunen!!!

Ne pewist e ku ez şorê dirêj bikim. Dewletê tirkân, li meselê kurdan wekî li jêwergiranê jêr difikirê. Ew nivîs, min ji internete girt. Xwedîyê nivîsê Zeynelabidin Özmen e. Nivîs, ji kitêbeke ku li salêñ 1930 hatîyê nivîsandin da hatiyê wergirtin.

*”Asimilasyon“ ü sağlamak için «Türklük Merkezleri» kurulacaktır. «Türklük Merkezleri» nde ekonomik egemenlik, Kürtçe ile ilgisini kesmiş bir zümrenin eline geçmeli, diğer yandan da mevcut tüccarla temasta bulunan dağlı Kürdü konuşturmak ve hükümete isindirmek için Halkevleri görevlendirilmelidir.* (118)

*Köy köy gezerek ticaret yapan Kurt seyyar satıcıların yerini Türkler almalı, Türklerin kuracıkları fabrikalarda Türk işçibaşları görevlendirilmelidir.” Özmen, sağlık sigortasının olmadığından yakınarak (146) doktorların yöre halkına ücretsiz olarak balmalarını öneriyor.*

*Özmen'in bir başka önerisi de şu: «Nahiye müdürlüğünün süvari olmaları, mütemadiyen köy köy gezerek halkla temas etmesi Türk, Kurt ve Alevi ailelerin birbirlerine*

*kız alıp vermeleri, asker ve memur olarak Batt halkından bu bölgeye gelip Kurt kızlarıyla evlenip burada yerleşeceklerle arazi verilmek suretiyle iskanlarında sosyal tesirlerin icrası tebellür (billurlaşır) ettirir.”*

*Türklük Merkezleri'nin etkili olabilmeleri için bu merkezlerde görevlendirilecek memurların Ankara'da veya Umumi Mütettişliklerde özel eğitimden geçmeleri gereklidir. Yoksa, «Kültür Merkezleri'nin Türk kültürüni aşılamak kabiliyetini artırmaya çalışmak lazımdır.*

*Yoksa Kurt de kendisine bir kültür yoluna girerse iş daba müşkilleşir.”*

*Devlet dairelerinde Kürtçe konuşmaya izin verilmemelidir. Kürtçe konuşan memurlar, önce uyarılmalı, Kürtçe konuşmaya devam ediliyorsa aylıklarından çeşitli oranlarda kesintiler yapılmalı, bu cezaya karşın Kürtçe konuşmayı alışkanlık haline getiriyorsa memurluktan çıkarılmalıdır.*

*Kürtler üzerinde ağalar egemendir. Bu ağaların, çeteçiler ve kaçakçıların Kürtlerin arasından çıkarılması gereklidir.*

*Halkevi, bu gibi işlerde etkin görevler üstlenmeli, Halkevleri'nde okuma odaları açılarak halka gazete ve dergi okutulmalıdır.* (147)



# VEGUHERÎN

- Serpêhatiya merivekî ku veguhêriye, bûye kêz -

Franz Kafka

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

## II

Gregor encax li hengorê ji xewa giran ya mîna bîrveçûyînekê bi xwe hêsiya. Bêguman ew ê pêçekê şûnda ji bêyi ku bihê bêzarkirin bi xwe bihêsiya, ji ber ku wî xwe têr vêsiyayî û xewhelnayî his dikir. Lê ji wî va wer xuya dibû, mîna ku ew bi dengê gavavêtineke revokî û bi dîqetgirtina deriyê odayê yê ber ve mabeynîyâ, hêsiyabe. Şewqa rengavêtî ya çireya elektrikî a cadeyê dida vir û wê, banê odayê û alijorê mobiliyayên bilind. Lê li jêr, li ba Gregor tarî bû. Wî xwe giran, hîn bi awayekî bişîyanekirî û bi pêkirina pozî çîpan yên ku hîn nû li ba wî bi qedir bûbûn, ber ve dêrî kişand, ji bo ku bibîne ka li wir ci hatibû pê. Kêleka wî ya çepê bi tûn mîna kuleke bi vekişîneke neçê xuya dikir û loma ew li ser du rêzeçîpan dikulîya. Bi ser da, çîpeke wî ji avûrûyê bûyerên danê sibehê da giran bi birîn bûbû -meriv pê mat dima ku yeke tenê birîndar bûye- û di pey va kaş dibû, mîna ku bêcan be.

Ew li ber dêrî bi tiştên ku di eslê xwe da ew ber ve wê derê kişandî hêsiya. Bîhna tiştê xwarinê bû ev. Li

wir kasekî tijî şîrê şîrin û di nav da ji pariyên nanê sipî yên ku têda ajinî dikirin, sekinîbû. Hendik ma ku ew ji ber şabûnê bikenîya. Çîmkî wî, ji ber birçîbûneke di ser ya sibehê ra, hema serîyê xwe hetanî jorê çavan kire nav şîr, lê bi lez û xeyalşikestî ew bi şûnda kişand, ne tenê ji ber zehmetîyen xwarinê yên ji avrûyê kêleka wî ya bi manî da. Ji bo ku bikanîba bixwara, divîya bû ku bedena wî bi tûnî bi nefeshelnan û berdanê biba alîkar. ji xeynî vê, şîr yê ku ji berê da xwaştirin vexwarina wî bû, pê tahmxwaş dihat. Û sewa vê, xwangê ew deynabû odayê. Qet na, erê, wî xwe, hemahema dijberî hemda xwe, ji kêse bi dûrxist, xwe bi xwe ra ber ve nava odaya kaşkir.

Gregor di navbera dêrî ra dît ku li odaya mîvanan çireya gazê hatiye vêxistin. Halbukî di vê wexta rojê da, bavê, mîna ku kiribû edet, rojnameya xwe ya ku danê êvarê derdiket ji dayê û carcaran ji ji xwangê ra bi dengekî bilind dixwand; lê niha meriv qet dengek nedibihîst. Belki

ev liberxwandina ku xwangê tim ji Gregor ra qal dikir û dinivîsand, li demên dawîyê êdin ne li rewacê bû. Her weha bêdengî daketibû der û dorê, halbukî mal ne betal bû. "Ev çi jîyanekê bêdeng e ya ku malbat diji," Gregor ji xwe bi xwe ra got û bi rû da bêlivîn serî di ber da li tarîyê dînihêri. Û wî xwe pê serbilind hîs dikir ku kanîbûye şertên jîyanekê ha di xanîyekî rind da ji dê û bavê û xwangê ra peyda bike. Lê çi dê biba, eger niha ev aramîya gişt, ev heyîya gişt, ev memnûniya gişt, bi encameke metirsî ji dest biçûya? Sewa ku ji van fikaran bi dûr bikeve, Gregor destpê çerxbûnê kir û li odayê vir da û wê da dikişîya.

Li êvareke dirêj, carekê perekî dêrî û carekê ji perê wî yê din viqasî navbereke piçûk hat jihevkirin û hema bi şûnda ji hate girtin. Kesekî dixwast kubihê hundir, lê li rê ketibû şikê. Gregor di vê hengavê da hat li ber deriyê odaya mîvanan dawestî, ji xwe bawer, xwast bi awayekî rê li bike, ku mîvanê dudîlî yê li ber dêrî bîne odayê yan ji qet nebe, ku bîzana ka ew kî ye. Lê derî edin nehate jihevkirin û Gregor nafile pa. Berê, gava derî gişt girtibûn, giştan dixwaztin ku bîhêna ba wî. Lê niha her çiqas ku wî deriyek jihevkiribû û yên din ji bi dirêjîya rojê jihevkirî hati-

bûn hîştin, qet kesek nedihat û mifte ji êdî ji der da di kilidê da bû.

Di derengîya şevê da çireya odaya mîvanan hatibû vemirandin û niha bi hêsanî dihate tesbîtkirin, ku dê û bav û xwang hetanî hînge payî mabûn û meriv dikanî rind bibihîze, her sê ji li ser pozî lingan bi dûr diketin. Edî hetanî sibehê tu kes nehat ba Gregor. Têr wexta wî hebû ku, bêyî ku bîhê bêzarkirin, bifikirîya ka ew ê çawa jîyanâ xwe ji nû va rîkûpêk bike. Lê odaya betal û banbilind ya ku wî xwe lê ji neçarî bi panî li ser dabanê dirêj kiribû, ew ditirsand. Wî nedikanî di sebeba wê biderîne, her çiqas ku ew ji penc salan vir da rûnişvanê wê be ji. Bêyî ku hay jê hebe, wî bi çerxbûneke bi nîvî û fedîyeke sivik xwe bi lez kire binî qenepeyê. Her çiqas ku pişta wî bi guvaştina ji ber cihtengîyê pan bûbû û nedikanîbû serîyê xwe helne ji, wî xwe li wê derê pir baş hîs dikir. Tenê ew ji vê ne razîbû, ji ber ku bedena wî zêde bi ber bû, ew di binî qenepeyê da rind bi cih nedibû.

Li wir, ew bi dirêjîya şevê ma. Wî parek ji şevê bi xelmaşîya ku ew jê bi veciniqiyê ji ber birçîbûnê li pey hev xeşare xwe dibû û bi xem û omdiyênezelal yên ku li ser yek encamê digihêştin hev, derbas kiribû. Li gorê vê, divîya bû ku ew vê gavê aram

tevbigerîya û li ser xwe ferz bikira, ku bi sayê sebir û rêzgirtina malbatî, tîna derdkêşîya malbatê kêm bikira. Derdkêşîya ji ber tengî û tahlîyên ku ew, ne bi destê wî be jî, bi rewşa xwe ya hal û hazir bûbû sebeb.

Sibehê zû, mîna ku hîn şev bû, fersendek bi destê Gregor ket, ku van hemd û pêşbînîyên xwe biceribîne. Çimkî wê hengavê, xwangê ya ku kincêن xwe hema hema bi tûn li xwe kiribûn, derîyê ji hêla mabeynîyê da ji hev kir û bi heyacan li hundir venihêrî. Wê hema ew nedît û got, „Xwedêwo, dera ku ew li vir be; malava, wî nedikanî bifire!“ Lê gava ku Gregor di binî qenepeyê da bi ber çavêن wê ket, ew pir pê veciniqî; wê nikanîbû xweragire û derî ji derva da şûnda kire hev. Dûv ra, te yê bigota ku ew ê ji vê rabûnûrûniştina xwe poşman bûye, wê cihlê derî dîsa ji hev kir û li ser pozî lingan, mîna ku hatibe ser pîtnexwaşekî yan ba yadekî, rabihurî hundir. Gregor serîyê xwe hetanî kênarê qenepeyê derxistibû û li wê sêyr dikir. Eceba ew a tê biderîne ku wî dest pê şîr nekiriye, ne ku tenê ji ber birçînebûnê; û wê ya hewce bidîta ku xwarineke din ya bi dilê wî bîne? Eger wê bi serî xwe va nekira, wî dixwast hîngê şûna ku bala wê bikişîne ser vê, rindtir

e ku ji nêz da bimire. Halbukî xwastekke bandordar dikuta wî, da ku ew ji binî qenepeyê ber ve pêş bipeke, xwe biavê ber lingên wê û jê xwaşxwarinekê, ci dibe ma bibe, tika bike. Lê xwangê hema bi matmayî kaseyê ku hîn tijî bû û jê da toziket şîr li der û dorê rijiyabû, dît. Wê ew tavile helna lê ne bi destê rût, belam bi paçekî pê girt û bire derva.

Gregor pir meraq dikir, ka ew a ci tiştên xwarinê bîne û li ser vê difikirîya. Lê wî hîç nedikanî bîzane, ka xwang bi rindîxwazîya xwe, di rastî da ci dike. Sewa ku tâhmê devî Gregor kêvş bike, wê ji wî ra çend çeşid xwarin anîn û gîst li ser rojnameyeke kevn rêexistin. Evana bûn: Sebzenî kevn û kesifî; hestine şevnistî di nav sosekî gewr i tîrbûyî da; çend mûj û behîv; girêk penêr yê ku Gregor berî du rojan xerab nîşankirî; naneke zîwa, naneke rûn têdayî û naneke rûn têdayî û xwê lêkirî. Ji xeynî van, wê av berdabû kasekî xas yê ji bo Gregor, guman e niha şûnda ji timî ra nîşankirî û ew deyna wir. Û wê dizanî rûyê Gregor nagire ku ber ve wê bixwe, loma ew ji nazîkîya xwe bi lez ji wir bi dûr ket. Heta wê, sewa ku Gregor bîzane bi çûyîna wê bihêse û li gorê dilê xwe rehet rabê û rûne, mifteya dêrî bada.

Gava ku dest bi xwarinê bihê kirin, çipîkên Gregor divîzîn. Lazim e ku birînêne wî êdî bi tûn xwaş bibûyana. Wî tu manî hîs nedikir û li vê hayred dikir û dianî bîra xwe, ji mahekê bêtir e, gava ku wî tilîya xwe bi kîrê tozikê birîbû û birîna wê hîn heta duhnepêr diêşîya. „Ma diviya bû ku ez niha kêmter nazîk bibim?“ wî digot û penêrê ku ji xwarinêne din bêhtir bîza wî diçûye, bi çavbirçitî dixwar. Bi çavêن bigirî ji ber têrî û tatmînê, wî bi lez û li pey hev penêr, sebze û sos dixwar; lê xwarinêne teze bi wî xwaş nedihatîn. Wî nedikanî tehemule bîhna wan bike û heta tiştên ku dixwast bixwe, ji wan vedidan û kaş dikirin, gavekê wê da dibirin. Wî her tiş zû da halkiribû û niha tiral li eynê derê xwe dirêj kiribû. Wê gavê, xwangê bi badana mifteyê xwast wî pê bihêsinê, da ku ew şûnda bikişê ciyê xwe. Bi vê, Gregor ji şûna xwe ya ku lê dihênjîya peki û bi lez çû û kete binî qenepeyê. Ji bo demeke kurt be jî, gava xwang li odayê bû, mayîna li binî qenepeyê bi zehmet dibû. Ji avrûyê zêdexwarînê da ew tenekê qilot bûbû û ji ber vê jî ew di binî qenepeyê da bi zehmet bi şûn dibû û wî bi zorê nefes dikişand û berdida. Bandora metîrsîyêne piçûk yên nefesçikîyê li ser, bi çavêن beloqî wî li xwangê dînihêri, bêyî ku

haya wê jê hebe. Wê bi şijingê ne tenê bermayî, xwarinêne ku Gregor qet destpênekirî jî rês dikirin, mîna ku ew êdî ne lazim bin. Wê tiştên rêskirî bi lez dikirin helbekê û devanga wê dida ser û ji odayê bi derdixist. Bi çûyîna wê ra, Greger ji binî qenepeyê bi derket û xwe berdida.

Bi vî awayî, êdî her roj xwarina Gregor dihate ber. Cara yekem danê sibehê hîn ku dê û bav û keçika xizmetkar di xew da bûn. Cara duyem li pey dagirtina xwarina nîvro; ji ber ku hînge jî dê û bav dîsa gavekî radimedîn û xwangê jî keçika xizmetkar ji bo tişmiştekî dişande derva. Bêguman wan jî nedixwastin ku Gregor birçî bimê. Dibe ku wan nedikanîn xweragirin ku tenê bi bihîstina ji vir û wê hay jê xwarina wî bibin. Dibe ku xwangê qemişê wan nedîwû ku ew zêde pê biêşin, jixwe di rastîyê da ew têr pê diêşîyan. Geregor hîç nedikanî bizane ka bi kîjan bahaneyan hekîm û kilidvan hînge, li yekem danê sibehê ji malê hatîbûn biderxitin. Ji ber ku ew nedihat fehmkirin tu kesî, xwang jî tevê, nefikirîya ku ew ê bikane yên din fehm bike. Û niha ew mecbûr bû ku pê bihata ser, gava xwang li odaya wî dibû û ji devê wê ax û wax ên ji vir û wê ra û banga ji der û dorêne piroz ra dihatin bihîstîn. Paşê, wexta

ku Gregor êdî kêm û zêdê hubûbû her tiştî -meriv nedikanî qala hukirineke bi giştî bike-, yekcaran ew bi gilîyekî neçê yê ku bi nêteke rind hatiye kirin yan jî dikane werbihê mitalekirin, dihêsiya. "Wî ji xwarina iro hez kiriye," wer digot Xwangê, gava ku Gregor xwarina li ber mîna qeda ji binî da teva dikir. Lê gava berevajîya vê bibûya, her ku diçû wer jî dibû, hîngê jî digot, "Vê carê dîsa qet dest pê nekiriye."

Gava ku Gregor nedikanî rast rast qet tu nûçeyan bibihîze, hingebi dîqet guhdarâr li tiştên ji odeya li kêlekê dikir. Kingê ku wî ji wir da dengek dibihîst, hema dimeşîya ber derîyê wê û xwe bi tûnî bedenê didaber. Bi taybetî jî di demên pêşî da, li wir tu sohbetên ku, bi dizîkî biba jî, bi wî ra ne eleqedar tune bûn. Bi dirêjiya du rojan, wexta xwarinê ya her danê rojê şêwir li ser çawabûnarabûn û rûniştinê ber ve wî bû. Dengkirinê di navberê xwarinê danan da jî li ser vê mijarê bûn, ji ber ku këmtir du merivên malbatê tim li mal bûn. Tu kesî nedixwast bi tenê li mal bimê û mal hîç bêkes nedihaticehiştin. Keçika xizmetkar jî hîn roja sifte -rind ne zelal bû wê çiqas hay jê qewimîyan hebû- bixwarvahatinî ji dayê tika kir ku ew wê hema ji karbi derxe. Ji çaryek saetê bi şûnda, wê

xatirê xwe xwast û bi çavêni girî teşekir kir, mîna ku ji ber rindîyeke mezin ya ku jê ra hatibe kirin va be. Û bêyî ku ji wê hatibe xwastin, sondeke pir neçê xwar, ku ew ji tu kesî ra van serhatîyan kat neke.

Ji niha şûnda, êdî xwang mecbûrbû ku tevî dayê şîvê jî bikeline; lê zehmetiya vê ewqas ne pir bû. Gregor tim û tim dengê du merivan dibihîst. Yekî yê din nafile tekelife xwarinê dikir û yê din, ji "berxwedarbî, têrî min heye" yan gotineke wekî vê bêhtir, tu bersivek lêvenedigerand. Dibe ku tiştek nedihat vexwarin jî. Carcaran xwangê jî bavê dipirsî ka dilê wî bîrayekê dixwazê û dixwast ku bi xwe jê ra bîne. Gava ku bavbêdeng dima, hingebi jî wê sewa ku rî li ber gumanêñ wî bigre, digot ez a dergevanê bişînim. Li dawîyê, piştî ku bavê pît digot, "Na!" êdî li ser vê nedihat dengkirin.

Hîn li roja sifte, bavê hesab û kîtabêñ sermîyana dayê û xwangê û dahatiya wê gişt li ber çavan rîexistibû. Geh wir da û geh wê da, ew ji ber maseyê radibû û ji qutîya ku wî berî penc salan ji dukana xwe ya jihevdaketî xelas kiribû, belgeyek yan jî deftereke qeyidê derdixist. Meriv dibihîst, gava ku wî kilîda wê ya lihevgerîyayî vedikir û bi şûnda dikire hev. Cara pêşî bû ku Gregor di

malhebsîya xwe da, bi bihîstina çend gotinêni ji beyanêni bavê şâ dibû. Ew di wê fikirê da bû, ku ji dukanê da tiştek ji bavê ra nemabû. Jixwe, bavê ji berevajî vê ji wî ra, her çiqas ku wî jê pirs ne kirîye ji tiştek negotibû. Hîngê xema Gregor tenê ew bû, ku ci lazim e bihata kirin, sewa ku malbat bikane vê qeda-belayê a ku ji dukana jihevdaleti tê gerîya û omdiya ferdên malbatê şikandibû zû ji bîr bike. Ü hîngê wî bi sebateke taybeti weki berdestikê dezgeha bazirganîyê dest pê kar kiribû û pir zû helkişîya merteba bazirganîya seyar. Di saye vê da, ew bûbû xwedîyê derfetê din yên qezenkirina pereyan. Bi wergirtina parsedîya ji serkevtina karê bazirganîyê, raste rast pereyên neqîd diketin destê wî û dihatin ber malbatê ya ku pê mat û mest dibû. Ci dem û dewranê xwaş û geş bûn. Lê paşê ew tu caran mîna berê dubarê nebûn û qet nebê nezikî wan nebrûsin. Halbûkî Gregor pir pere ji qezenc dikirin û dikanî mesrefen malbatê gîstan helne ser xwe û dikir ji. Erê, him malbat û him ji Gregor lê banibûn; malbatê pere biminendarî heldigirt û Gregor ji ji dil dida. Lê nêzikîyeke germ di navbera wan da êdî çênedibû. Tenê xwangê xwe nêzikî Gregor digirt. Pilaneke wî ya veşartî ji bo wê hebû.

Berevajî wî, xwangê ji muzîkê pir hez dikir û bi lêxistina li viyolînê meriv zîz dikir. Wî dixwast ku sala bihê wê bişîne zanîngeha muzîkê. Ew i di wê nêtê da bû, ku bêdudilî xwe bide ber xerciyênen wê yên bedelgiran. Bedelekî ku paşê, bi aveyekî dê şûnda li wî vebigerîya. Carcaran, ku kêm be ji gava Gregor li bajêr dîma, di sohbeten wî yên bi xwangê va şor dihate ser perwerdeya muzîkê, lê tim mîna xewneke xwaş ya ji bicihbûnê dûr. Dê û bavê ji hîç nedixwastin ku bilêvkirina wê bibihîzin. Gregor li ser vê mijarê cidî disekinî û dil hebû ku pîlana xwe li Êvara-Noelê beyan bike.

Wexta ku wî li vir bi pê û bi bedana repkirî li ber dêrî guhdarî dikir, fikirêni ha yên ji bo rewşa wî ya niha békér di serîyê wî ra diçûn û dihatin. Ji ber qerimiyê, wî carcaran nedikanî guhdarî bike û dihişt ku serîyê wî jixweberê li dêrî biketa, lê wî hema ew bi şûnda digirt. Çimkî xişinîya sivik ya ku ji pêvadana sêri a li dêrî derdiket li odeya li teniştê dihate bihîstin û rûniştvanen li wir pê bêdeng dibûn. Pêçek neçû, bavê got, “ci dike va dîsa?,” pê ra ji berê xwe berve dêrî kir. Ü paşê şewrê ji nû va dest pê dikir.

Ji berê da, Gregor têr hay ji wê taybetiye bavê hebû; gava ku wî

beyan didan xwe pir cara dubare dikir. Ji ber ku ew zûva ye bi van tiştan ra mijûl nedibû û ya din jî dayê her tişt bi carê siftê ra fehm nedikir. Li gor salixdanên wî, her çiqas ku ji qeza û belayan zîyan gihêştiye wan jî, ji hêla din da, sermîyaneke piçûk ji demêñ berê da ji wan ra mayîbû û faîzêñ wê yên destpênekirî jî hatibûn ser. Wekî din, hen ji pereyen ku Gregor her mahê dianîn mal diman. Wî ji wan çend Gulden ji xwe ra xerc dikirin û yên ku nedihatîn serfkinir gihêştibûn hev û jê sermîyaneke bi serî xwe hatibû pê. Gregor li paş derîyê xwe bi şewq serî dihêjand û bi vê baldarî û teserufkariya nedipayî şâ dibû. Ya rast, wî ê bikanîya bi van pereyên mayî dêynê bavê yê ji serdarê bazirxaneyê ra par bi par bida. Û roja ku wî ê bikanîbûya dest ji kar berda ê hîn zûbihata. Lé niha, bêguman wekî ku bavê çêkiriye hîn baştir bû.

De tu were wê, van pereyan qet ne bes bûn û bi faîza wan jî malbatê nedikanî debara xwe bikira; ne zêde, belkî salekê ên pir du salan ê pê bikira. Ya din, ev kultek pereyan ji bo rojêñ destengîyê hatibûn komkirin, ne ji tiştekî din ra û loma dera ku tu kesî dest tê nedaba. Pereyên ku meriv pê bijî divê bihêñ qezenckirin. Her çiqas ku siheta bavê li şûnê

bûya jî, wî ji penc salan vir da kar nekiribû û loma ew ê pir ne çavbir biba. Di nav van pênc salan da, yên ku yekem tatîla jîyana wî ya bi zehmet û sernekevtî bûn, wî pir bez girtibû û ji ber vê jî cangiran bûbû. Ma ya rewa biba ku dêya wî ya pîr bişûxiliya û pere qezenc bikiran ya ku nexwaşîya nefestengîye dikişand û bi zehmet li nav odehye digerîya û ji ber nefestengîyê ji du rojan yek li ser paldankê li ber pencereya vekirî derbas dikir? Lê xwanga xizan, ma ya biba ku wê pere qezenc bikiran ya ku bi heftdehsalîya xwe hîn zarokek bû û jîyana xwe ya heta niha a lê rewa û bi taybetî û meşqeleyên wekî, xwexemilandina bi kincêñ rind, dirêj raketin, alîkarîya karêñ nav malê, tevlîbûna çend şenîyêñ mitewazî û di ber her tiştî jî bilêxistina li viyolînê dibihurî? Gava ku gilî û gotin dihate ser hewceyîya qezenckirina pereyan, alaveke pir bi tîn ya ji ber fedî û xemxuriyê pê Gregor digirt, ew pê hema ji ber dêrî bi dûr diket û xwe diavête ser paldanka çérminî û hênik ya li kelekê dêrî.

Li wir, ew pir caran bi dirêjîya şevan dima û bêyî ku bîstekê çavan bike hev û bi saetan li ser paldanka çérminî digevizî. Yan jî hewl dida ku paldankekê, bêyî ku xwe ji ber zehmetiyê wê yên mezin babida,

ber ve pencereyê kaş bike, da ku ew bikane berve jorê kenda pencereyê helbikişe; û paldank li ber pişa wî, bi pencereyê hebstartî li derva binihêre. Guman e ku bibîraniya rehetîya demên berê ya ku li vir hewnîya wî pê dihat, mîna ku barek ji ser heldihat. Di rastî da, wî roj bi roj tiştên hendik ji wî dûr jî, her çû şêlî diditîn. Nexwaşxaneya li hember ya ku tim û tim jê va xuya dikir û wî lenet lê dikir, êdî hîç bi ber çavên wî nediket. Ü eger wî rind nezanîbûya ku ew li cadeya Şarlottenê ya bêdeng lê tam bajarî rûdinişt, wî ê bawer bikira, ku ew î di pencereya male xwe ra li çoleke xewle ya ku lê ezmanê gewr bi erdê gewr va bi awayekî jihevderxistî digihêstin hev, mês dikê. Paldanka li ber pencereyê yek û du caran bi ber çavên xwanga miqetdar ketibû. Ji vê pêva, gava ku wê ode berehev dikir paldank dîsa kaş dikir ber pencereyê û li cihê berê bi şûn dikir. Heta ji hîngê şûnda wê pêşperê pencereyê ji hev cihdihîst.

Xwazika ku Gregor bikanîbûya bi xwangê ra deng bikira û ji bo hemû xizmetên wê berxwedâriyek lê vebigeranda, hinge wî ê hésantir tehemule barê minetdarîyê bikira. Lê ji ber ku va ne mimkûn bû, ew pê berxweketî dibû. Xwangê hewl dida ku vî halê riswa heta ku heyê nede der, û her

diçû di vê cihêtê da jêhatîtir dibû. Lê Gregor jî pêdapêda pir baş tê her tiştî dianî der. Bi tenê serî xwe, hatina xwangê ya odayê, bi wî bi xof dihat. Ku çîng ew dikete hundir, bêyî ku venêre û dêrî ji paş xwe va bigire, sewê ku çavê tu kesî li odaya Gregor nekeve û her çiqas ew di vê meyîlê da dîqetdar bû jî, bi lez dimeşîya ber pencereyê. Ü bi destên cirfonek wê ew vedikir, te yê bigota ew ê li ber vetisînê ye. Çiqas sar jî bûya ew bîstekê li ber pencereyê dadiwestî û kûr nefes dikişand. Bi reperepa vê çûyîn û hatinê Gregor her roj du caran vediciniqî û di wê wextê da, di binî qenepeyê da dicirifî. Ü wî rind pê dizanîbû ku xwangê, eger jê bihata, ew ê ji van nerehetîyan biparasta û ya bi wî va di odaya wî ya bi pencereyen girtî da bimaba.

Di ser veguherîna Gregor ra mahek derbas bûbû û êdî tu sebebeke taybet nemabû ku xwang li hember şikla Gregor mat bibûya. Carekê ew ji ya berê hendik zûtir hat û dît ku Gregor î hîn li ber pencereyê bêliv û jiveciniqîyê ra hema hazir dawestîye û li derva dinihêrê. Ku neketiba hundir jî, va ji bo Gregor ne tiştekî nepayî bibûya. Ji ber ku wî bişûngirtina xwe ya vê demê, rê li ber wê girtibû, da ku ew hema pencereyê vebike. De tu were,

ew nehat hundir, şûnda vegeŕi û deri ji paş xwe va kire hev. Yekî yad ê bifikiriya û bigota, Gregor i li benda wê bû û dil hebû ku wê ges bike. Wî hema xwe di binî qenepeyê da vêşart, lê gerek bû ku hetanî nîvro, berî hatina xwangê, li wir bipa. Xwang ji ya berê bi teleşetir xuya dikir û wî ji vê biderdixist ku, ew hîn ne hazir e tehemule dîmenê wî bike û ew a di dahatîyê da jî tehemulnekirî bibe.

Û lazim bû ku ew ji vê rawire û ji ber biberçavketina parçeyekî piçûk ji bedena wî yê ku ji binî qenepeyê derketî, neriwe. Ji bo ku xwang wî di vî halî da nebîne, rojekê wî -ji bo vê çar saet pê lazim bûn- çarşeva ser qenepeyê avêtibû ser pişta xwe. Wî çarşev weng bi şûnkiribû ku ew pê bi tûnî hatibû nixmandin û xwangê ku xwar vabihata jî nedikanibû wî bibîne. Ku ev çarşeva li gor fikra xwangê ne gerek bûya, hingê wê dikanibû wê ji ser rake. Lê ji ber ku, wekî têr xuya bû, ku evîya ne bî dilê Gregor bibûya, wî ê xwe veng veneşartiba, wê çarşev weha wekî berê cihîst. Ü heta Gregor di wê bawerîyê da bû, ku wî çavlêgrandineke minetdarîyê bidestxistiye, gava carekê bi dîqet serîyê xwe ji bin çarşevê hendik helna, da ku bibîne ka xwang çawa li vê tevgêra niha dinihêrê.

Di panzdeh rojên pêşiyê da,

dilê dê û bavê nedigirt ku biçûyana ba Gregor. Lê wî ji wan tim û tim gotinê şayanî teqdirê di derheqê kar û barê xwangê yê niha da dibihîstin. Halbukî ew hetanî niha ji xwangê bi şikayet bûn; ew ji wan va mîna keçikeke békér xuya dikir. Lê niha her duyan, gava ku keçikê od-eaya Gregor dida hev, bi hewês li ber dêrî odayê benda wê dipan. Kingê ew ji odayê derdiket, hema dixwastin ku ew ji wan ra qalê bike, ka vê care xwarin û rabûnûrûniştinê wî çing bûn û ka rindbûneke piçûk pêkhatiye. Wekî din, dayê dixwast rojekê pêş da biçûya ziyareta wî, lê bavê û xwangê ew şûnda digirtin, ji ber sebebîne maqlû yên ku Gregor bibaldarî guh dida ser û bitûn pê razî dibû. Lê paşê, dayê bi zorê dihate gitin û gava diqîrî û digot, “berdin ez herim ba Gregor, lawê xwe î bextreş! Ez mecbûr im herim ba wî, ma hun çîma vê fahm nakin?,” hîngê Gregor difikirî ku, belkî baştir bûya, dayê bihê ba wî, lê ne herroj, belkî ji hêfte carekê. Wê her tişt ji xwangê rindtir fehm dikir. Xwang ya ku, her çiqas wêrek bûya jî, hîn zarokek bû û dibe ku xwe ji ber bêxemîya zaroktîyê dabûbû ber barekê han î giran.

Mirazê Gregor yê dîtina dêya xwe zû hate şûnê. Wê rojê, sewa xatirê dê û bavê, wî nedixast xwe li ber pence-

reyê binimîne; lê li ser dabana teng biqasî yekduse metroçarkênar, wî nedikanîbû zêde bixuşıya. Xwedirêjkirina di bêdengîya şevê da jî li wî giran dihat. Demekê şûnda wî ji xwarinan jî êdi qet tu tahm helnedina. Û ji ber vê, sewa ku hewêniya xwe bîne, wî xwe hukiribû xuşîniya virda û wêda ya li ser ban û diwarên odayê. Xasme ji bidardabûna bi banê odayê va hez dikir. Evîya, bi danberheviya bi xwedirêjkirina li ser dabanê odayê va, tiştekî pir cîhê bû; meriv serbest nefes digirt û dida, pê sivikhejîyek li tevahîya bedenê belav dibû. Û bi vê xweberdayîya mîna kêfxwaşiyê a ku ew li jor têda bû, dikanî sist bibûya û ji xafil da, bêyi ku wî ew bipa, xwe berda û biketa ser dabanê. Lê niha, xuya dibû ku ew ji ya berê çêtir hakîme bedana xwe ye û ji ketina ji cihêkî weha bilind da ê bê xişbûn bifilitiya.

Haya xwangê tavile jê meşqeleya nû ya ku Gregor ji xwe ra peyda kiribû bû. Ji ber ku wî di pey xwe va madeya nûsikî cihdihişt. Û wê rind kiribû serîyê xwe, sewa ku Gregor bi şîya bike têrî xwe bixuşe, rê li ber vebike û mobilîyen ku li ber wî dibûne manî, bi taybetî kodik û maseyê ji odayê biderxe. Lê wê bi tenê serî xwe nedikanî ji bin vî karî derbikeve û rûyê wê nedigirt ku ji bo

vê alikarîyê ji bavê bixwaze. Bêguman yarmetîya keçika xizmetkar jî nebûya; ew keçikeke hîn şanzdeh salî bû û wê, her çiqas ji karberdana aşpêja berê vir da, bi wêrekî xwe dida ber kar û bar jî, di destpêkirinê da hêsanî daxwaz kiribû, da ku ew bikane derîyê aşxaneyê timî girtî bihêle û tenê ji bangkirinê xas ra vebike. Loma xwangê ji neçarî carekê, gava ku bav ne li ma bû, bange dayê kir. Ew bi wêrinîyen şabûnê hat, lê li ber derîyê odaya Gregor lal ma. Berê, helbet xwang li odayê nihêrî ka her tişt li şûna xwe ye. Paşê wê hîst ku dayê bikeve hundir. Gregor bi lezûbez çarşev hîn zêde qatkir û ber ve jêr kişand. Çarşev mîna ku di rastî da jixweberê avêtibûn ser qenepeyê, xuya dikir. Gregor vê carê jî dest jê berda, ku bi dizikî di binî çarşevê da hema li dayê venêre û jê fereqet kir ku wê niha bibîne; lê şadibû ku ew hatiye. “De were lê, meriv wî nabîne,” xwangê got û guman e ku wê bi destê dayê girtibû û ew dianî odayê. Wê gave Gregor dengê kodika kevn û giran dibihîst ya ku her du jinêñ hejar ji şûnê kaşdikirin û her diçû xwangê piranîya barê wê heldina ser xwe, bêyi ku wê dengê şîret û şîyarîyen dayê bigihanda xwe; dayê ditirsîya ku wê dereke xwe biêşanda.

Kaşkirina kodikê pir dirêj ajot. Ji çaryek saetê şûnda dayê got, çêtir e ku kodik li şûna xwe bimîne. Yekem, ev ê pir giran bû û wan nedikanîbûn vî karî di ber hatina bavê bibin sérî û mayîna kodikê li nava odeya Gregor, dê bibe manî. Duyem, ev ê di şikê da bû, ka Gregor ê bidûrxistina mobiliyayêbihê ser. Bi nihêrîna dayê bervajîya vê ji rast bibûya. Bi mëski-rina li dîwarê betal dilê wê diêşîya; û ma çîma Gregor ê weha hîs nekiriba, ji xwe ew zûda ye ku hubûbû mobiliyên odayê û loma ji wî ê xwe li odaya betal bitenehîştî hîs bikira. "Ma ne weng e?" Wer got dayê bi dengekî weng ì pir nizm, tê yê bigota ew ê dikê pistepist, mîna ku dixwast Gregor tenê tonê dengê wê nebihîze, bêyî ku bizaniya ka ew tam li ku ye. Çimkî wê qîma xwe rind pê anîbû, ku Gregor ì gotinan fehm nakê. Û wê da ser got, "ma weng ne ye, yanê em bidûrxistina mobiliyayê didin nimandin ku me omđiya xwe bitûn jê birîye û em bêmerhemet wî bi tenê serî xwe cih-dihêlin? Bawer dikim ya herî baş ev be, ku em odayê wekî berê cihbihêlin, sewa ku Gregor, gava ew bi şûnda vegerîya cem me, her tiştî neguhêrtî bibîne û bikanibe qewîmîya di wê navberê da bi hêsanî ji bîr bike."

Bibihîstina van gotinê dayê, Gregor tê biderdianî, ku tunebûna

her çeşid danûstandina yekser a însanî bi jiyanekî yektonî va giredayî ya du mahêن rabirtî di nav malê da, lazim bû heşgihêştîya wî serûbinhev kiriba. Wî nedikanîbû wekî din rave bikira; çimkî ne wer bûya, wî ê bi cidî çawa bixwasta ku odaya wî bihê betalkirin. Ma wî bi rastî dil hebû ku odaya germ, bi mobiliyayên rehet û mîratmayî xemilandî, bibûya cehenem a ku wî bikaniya tê da bê manî berve her derê bixuşîya û helbet bi rû da ji rabirduya xwe ya însanî hema bi tûn ji bîr bikira? Ew gihêştibû wê qonaxê ku ji bîr kiriba, lê dengê dayê yê ku wî ji zû va nebihîstibû, ew hîşyar kiribû. Qet tiştîk divê nehata biderxistin; her tiştî divê bima; ne di cih da bû, ku kêrhatîya tesîra mobiliyayê li ser rewşa wî, bihê qutkirin; û ne xem bû ku mobiliya li ber xuşîna wî ya bêmene a vir da û wê da, bibûya manî, beravajî ev awantajeke mezin bû.

Lê xwang mixabin di fikireke din da bû. Wê ji xwe ra kiribû xûyekî, bi tûnî ne bêheq bû ji, di şewrên bi Gregor va eleqeder da, ew mîna xaszaneyekî derdikete hemberî dêûbavê. Aniha ji, mîna ku tewsiya dayê jê ra bûbû bahane, wê israr dikir, ku ne tenê, wekî ku wê berê difikirî, kodik û maseya nivîsê, ji xêyri qenepeyê ci heye, mobiliya gişt

ji odayê bihê derxistin. Bêşik sebeba vê daxwazkarî û berdanemanîya wê ne tenê inadkariya zarokatîyê û bixwebaweriya ku wê di demên dawîyê da li xwe kiribû mal, bû. Li gor çavdarîya wê, sewa xuşinê cihekî zêde ji bo Gregor pêwîst bû; û li hemberî vê, qasî ku ji meriva va xuya dikir, mobîliya qet bikarnedianî.

Kî dizane, belkî hîsa heyranî ya keçikên di çaxê wê ra jî rolek lêyîstibû; hîseke ku di her fersendê da li têrbûniyê digere; û bi têheldana wê, Greteyê xwastibe ku rewşa Gregor hîn xerabtir binimîne, sewa ku ji ya heta niha zêdetir xizmeta wî bike. Çimkî ji Greteyê bêhtir tu kesî nedikanî ku biwêre bikeve odayê, ya ku tenê Gregor bixwe li ser dîwarên wê yên betal bi hikum bû.

Û bi vî awayî Grete ji biryarêne xwe danegerîya û bi gurra dayê nekir. Dêya ku, ji avûrûyê teşqeleya di odayê da, duidlî xuya dibû û pir neçû bêdeng bûbû; lê heta ku ji destê wê dihat, alikariya Greteyê dikir, da ku kodik ji odayê bihê derxistin. Derxistina kodike pir nedibû xema Gregor, lê maseya nivîsê dera ku bima. Hîn nû her du jin bi nale nala ji ber zehmetîyêna kaşkirinê, bi kodikê va ji odaya biderketibûn, Gregor hema serî ji binê qenepeyê biderxist, ku mês bike, ka wî ê çawa bikanîya mi-

dexele bike, bêyî ku yên din biêşîne. Lê dêya xêrnedî pêş da vegeiyabû. Grete hîn li odaya li kêlekê pê kodikê girtibû û ew vir da û wê da dihêjand, bêyî ku bikanîya, wekî ku xuya dibû, wê ji şûnê bilevîne. Dayê hunebûbû dîtina şikla Gregor; wê ew a nexwaş bikira; û Gregor veciniqîya û hema vegeiyâ dawîya din ya qenepeyê, lê nikanibü bibûya manî ku çarşev ji hêla pêşiyê da tozikê bihê livîn. Ev bes bû, ji bo ku bala dayê bihê kişandin. Ew mat ma, bîstekê hîş dawestîya û paşê şûnda vegeiyâ ba Greteyê.

Her çiqas ku Gregor ji xwebix-we ra tim û tim digot jî, qet tiştekî nedîti naqewime, tenê şûna çend mobilîyan ê bihê guhertin; wî ê paşê qebul bikira, ku vir da û wê da çûyîn û hatina jinan, bangkirinê wan ên pistepistkî, çîrkinîya ku mobilîyan ji erdê biderdixist wer tesîr li ser wî dikirin, mîna ku xirecireke mezin ya ku ji çar alîyan da nêzik dibû, bi ser da dihate xwarê. Û ew mecbûr bû, bi serî û çîpêñ berve hundirê xwe û bi bedena ber ve erdê kişandî, ji xwe ra bibê, ku ew demdirêj tehemule van giştan nake. Wan odaya wî betal dikirin; her tişte ku wî jê hez dikir, kodika ku bireka texte û hacêtên din tê da bûn, derxistibûn. Niha jî maseya ku di erdê da hatibû kutan,

ya ku wî li ber wekî akedemîsyenê bazirganîyê, wekî telebeyê dibista-na navend û heta wekî yê dibistana seretayî ders hukiribû, sist dikirin. Bi rastî, êdî wexte wî tune bû ku li ser nêtpakîya her du jinan hûr bibe. Ha, di vê navberê da, haya wî jê nebû, ji bîr kiribû ku ew ê li odayê bûn; ji ber xişhalîyê, ew bêdeng dişûxiliyan û meriv tenê reperepa giran ya lingên wan dibihîst.

Û bi vî awayî ew ji nişkava derkete pêş. Wê gavê, li odeya li kêlekê jinan xwe bi maseyê hebstartibûn, sewa ku tenekê vehesin. Wî çar caran hedefe çûyîna xwe guherî, bi rastî nedizanî ku siftê ci xelas bike. Bi carekê ra, wî li ser dîwarê ku wekî din betal bû berçav wêneyê bidardakirî yê banûya ku kerîyek kurk li xwe kiribû dît; bi lez berjor xuşîya û xwe bi cama wêneyê da na. Camê ew digitr û li zikê wî yê bi alav xwaş dihat. Qet nebe vî wêneyî yê ku Gregor niha bi bedena xwe nixmandî bû, tu kesî ê nikanîba ji dest wî bigire. Wî serîyê xwe berve derîyê odeya mîvanan çerx kir, sewa ku jinan, gava ku ew vegerıyan, çav bike.

Jin pir venehesîyan û şûnda vegerıyan. Grete çepilê xwe li nava dayê pêça, te ê bigota, wê ew bi xwe ra dibir. „Em ê niha ci biderxin?“, Grete got û li derûdora xwe mês kir.

Awirêñ wê li ser diwêr bi yên Gre-gor va li hev ketin. Ji ber ku dayê li ba wê bû, ew hakîme xwe bû û berê xwe berve dayê kir, xwast ku rê li ber wê bigire, sewa ku ew li tu tiştî ne-gere; bi cirifi û bêyî ku bifikire got: „Were, em şûnda bîstekê herin odeya mîvanan, baştir nabe?“ Nêta Greteyê ji bo Gregor zelal bû. Wê dixwast ku dayê bigihîne cihêkî emîn û paşê Gre-gor ji ser diwêr bîne xwarê. Anîha, qet nebe wê dikanîbû vê biceribîne! Gregor li ser wêneyê xwe rûniştîbû û nedixwast ku wî bide; ji ber vê, ew ê bihekîya rûyê Greteyê ji.

De tu werê wê, bi gotinêñ Greteyê dayê her çû nerehet bû. Wê xwe da aliyekî û lekeya qehweyî ya li ser kaxiza li dîwêr werkirî û bi gulwêneyan neqişkirî bi ber çavan ket; berî ku tê biderbianîya ku ew ê ku wê didit Gregor bû, bi qîrinî û dengekî xeneqoqî bang kir, got: „Ax Xwedêwo, ax Xwedêwo!“ û bi çepilêñ jihevkirî, mîna ku omdîya xwe ji her tiştî birîbe, kete ser qenepeyê û qet nelivîya. „Gregor, qey tu ê bi dest min kevî!“ xwangê bi mista rakirî û çavtûjî bang kir. Ji veguherînê Gre-gor vir da, ev gotinêñ wê yên siftê bûn, yên ku wê li rûyê wî dixistin. Grete meşîya odeya li kêlekê, sewa ku qelmîskê bînê û pê dêya jixwevaçûyî heşar bike. Gregor jî xwast ku here

hawara dêya xwe,- ji bo xelaskirina wêneyê hîn wext hebû- lê ew bi camê da pît nûsikibû û lazim bû ku xwe bi zorê vekişanda. Ew jî hema meşîya odeya li kêlekê, bi hêvîya ku mîna li zemanê berê şireta li xwangê bike; lê niha, bêyî ku ew tiştekî bike, mecbûr bû li paş wê daweste. Xwang li şûşeyan vedinêri û gava wê xwe paşva çerx kir, vecinîqîya û şûşeyek ji dest da kete erdê û şikeş; jê parçeyek cam hate rûyê Gregor û ew bi birîn kir; çeşidek derman i bi şewat bi ser da velo bû. Grete bêyî ku dirêj bima, hema ji şiyakirina xwe zêdetir şûse helnan û bezîya ba dayê û bi ling derî ji paş xwe va girt. Gregor êdî ji dêya xwe ya ku belki ji avrûyê wî da nêzikî ber mirinîyê bûbû, hatibû vegetandin. Îcaze tune bû ku wî derî vebikira û nedixwast ku xwangê ya ku mecbur li ba dayê bima, biqewitîne. Ji payînê bêhtir wî nedikanî tiştekî bike; bi têheldana xemxwarî û xwelomekirîyê dest bi xuşinê kir, bi her derê da dixuşîya, li ser mobîliya, li ser dîwaran û nîhayed gava ku heş jê çûn û odayê bi tûnî di dora wî ra destpê çerxbûnê kir, ew ji bêçaretîyê kete ser maseya gir.

Gregor bêmecal pêçekê li wir ma. Derûdora wî bêdeng bû, belki ev nîşana xêrê bû. Derî hata kutan. Deriyê aşxaneyê, erê lê, ew li ser ke-

çika xizmetkar girtî mabû û divîya bû ku Gregor biçûya ew vekira. Bav hatibû. „Çi bû, ci qewimîye?“ gotinêni wî ê sifte bûn. Dîmena Greteyê her tişt dida der. Greteyê bi dengekî ketî bersiv dida; xuya dibû ku wê serîyê xwe dabû ser sîngê bavê û got: „Dayê bîr ve çû, lê niha ew rind e; Gregor odeya xwe terk kir.“ Jixwe min va dipa,“ bavê lêvegerand, „min ji we ra tim digot, ax lê hun jin hene, we nedixwast guh bidin ser min.“ Li ba Gregor, bavê beyana xwangê ya pir kurt xerab mitale kiribû û tehmîn dikir ku Gregor xwe bi şerkarekî gunehkar kiriye. Ji ber vê jî, niha pêwîst bû Gregor hewl bida ku bavê haşt bike; çimkî ji bo hayadarkirina bavê ne wext û ne jî derfet hebû. Wî hema xwe bada çû ber deriyê odeya xwe û xwe pêdanand, sewa ku bav, gava ku ew kete odayê pê bihese, ku Gregor dil heye vegere odeya xwe û ne hewce ye meriv wî şûnda vegerîne; tenê divîya bû derî li berbihê vekirin, hîngê ew ê venda bibûya.

Lê bav ne di wî halî da bû ku bi ber tenikahîyên han da here; ku çîng gav avête hundir, hema bi dengekî him ji şabûn û him jî hêrsbûnê dagirtî got: „Ax û ax!“ Gregor serîyê xwe ji ber dêrî şûnda kişand û ber-ve bavê berjor rakir. Bi rastî, wî bav

qet weng, wekî ku ew niha li wê derê sekinîbû, tesewir nedikir. Bêguman bavê di demên dawîyê da, ji avrûyê peydabûna îcada nû ya xuşîna berve vir û wê, guh pê va nedikir, ku bi qewîmîyêن li odayêن din va eleqeder bibe; lê divîya bû ku wî xwe ji vê ra hazir bikira, ku ew ê raste têkilîyêن guhertî bihê. Her ci dibe ma bibe, dîsa jî bav bû ew? Eynê meriv bû, yê ku, gava Gregor ji bo bazirganîyê derdikete rêuwîtyê, vestîyayî di nav nivînê da nixmandî dima; û yê ku li vegeŕîna wî ya ji rêuwîtyê, êvaran di kirâsê xewê da, li ser paldankê ew pêşwazî dikir û nedikanîbû rabe ser xwe û wekî nîşana şabûniyê tenê çepilên xwe berjor radikirin; û ku kêmcar be jî, di gerên bi hevra li rojêن yekşemîyê û tatîlên salê, di navberê Gregor û dayê da, yê ku heta jê dihat, giran birêdiçûn, ji wan girantir bi sekoyê lixwepêçayî û gopala bidîqetgirtî berve pêş hewl dida û gava dixwast tiştekî bibê, tim dadiwestî û rêheval li dora xwe diciwandin? Lê niha ew di halekî rind li ser xwe da bû; bi unîformayeke teng û kesk û bi pişkojêن zêrinî ya mîna kincêن xizmetkarêن banqeyan, xwe pêçandibû; li ser sikura ceket ya bilind û hîşk, cotçeneyeke pît lê peyda bûbû; di bin brûyêن gumre ra, nihêrîna hewas û lêner ji çavêن

reş derdibirî; porê sipî yê ku berê birûbelavkirî bû, niha ketibû şikila porekî biriqî, ji navê da vegetandî û berjêr şehkirî. Şebqeya xwe ya ku bi navnîşaneke zêrinî, guman e ya banqeyekê neqişkîrî bi dirêjîya odayê çeng kire ser paldankê; derdawêñ dirêj yêñ ceketê unîformayê paşva kişandî, dest di berîyêñ şel da, bi rûyekî tirşkirî çû ser Gregor; wî bixwe jî nedizanîbû ku nêta wî çibû; qet nebe ling pir berjor rakirin û Gregor heyîrî ma, gava ku mezinahîya dabânê merasêñ bavê bi ber çavêñ wî ket. Lê wî jî ber vê, xwe paşda negirt; ji roja pêşî ya jîyana xwe ya nû vir da, wî dizanîbû ku bavê çavşorîyeke mezin li hember wî di cih da didît. Ü veng ew li pêş bavê dimeşîya, gava ku bav dadiwestî ew jî dadiwestî, ku bavê xwe dilivand, ew dîsa hema berve pêş dimeşîya. Bi vî awayî ew pir caran li odayê çerxbûn bêyî ku tiştekî giring biqewimîya; erê bêyî ku ev mîna bipeyketinekê xuya bibûya. Loma Gregor vê gavê li ser dabânê mabû; çimkî ew ditirsîya, ku bavê reveka berve dîwar û bana odayê wekî xerabîyeke xas biditîya. Lê divîya bû Gregor ji xwe ra bigota, ku wî nedikanî demeke dirêj birêçuyineke bi vê şekilê tehemul bikira. Ji ber ku gava bavê gavek diavêt, divîya bû ku wî hereketine

pir zêde bikirana. Nefesçikîyê xwe lê dida xuyakirin, jixwe ew demêr berê ji ne xwedîyê pişikeke qeym bû. Gava ew bi vî halî berve vir û wê dişewişî, sewa ku hêza xwe ji bo birevaçûyînê berehev bike, wî bi zor û zehmet çav vedikirin; ji ber hîsnekirîyê, ji meşinê bêhtir qet li ser xelasîyeke din nedifkirîya; û hema-hema ji bîr kiribû, ku dîwar ji bo wî betal sekinîbûn yên ku lêbilem li vir bi mobîliyayên bi hûrbijêrî hatibûn qewartin û tijî niçikêñ tûj û kertik rê li ber girtibûn. Aniha ji nêzikî kèleka wî tiştek bi lezeke sivik berjêr hate xwarê û li pêş wî lut dibû. Ev sêvek bû; di pey wê va yeke din; Gregor bi veciniqî dawestiya; berdewamîya meşinê bê feyde bû. Çimkî bavê biryar dabû ku wî bombebaran bike. Wî berîyên xwe ji fêkîyên di sinîya li ser bufeyê tijî kiribûn û bêyî ku he-def rind bibijarta, sêvek li pey yekê diavêt. Ev sêvîn piçûk û sur, mîna ku elektirîkê pêgirtibû, li ser erdê vir da û wê da dipekîyan. Sêveke ku bi kêmlezî hatibû avêtin, pişta Gregor sivik alast û bêyî ku zîyanek jê

bigihêsta wî, ket. Lê sêva ku hema li pey wê hatibû avêtin wer pît li pişta Gregor ket, mîna ku tê ra çûbe xwarê. Ji ber derbeya wê, wî dixwast ku xwe dîsa kaş bike, mîna ku êşa ji nişkava ya bêhed dê bi şûnguhêrînê derbas biba. Ancax wî xwe bi erdê va mixkirî hîs dikir û xwe bi nav tevliheviyeke bi tevahî da berdabû. Tenê bi awira paşî didît; çawa derîyê odaya wî bi lez dihate vekirin û jê dêya wî bi lez di ber xwanga ku diqîrî ji odayê derdiket; kirasekî lê bû, sewa nefeshelnana hesan xwangê dema jixwevaçûna wê kinc jêkiribûn; û çawa dayê berve bavê dimeşîya û bi rê da fistanêن wê yê bihevdekirî yek li pe yekî dişemîtin û diketin erdê; çawa ew di ser fistanan ra bi lingên berpaşhevketî diberizî bavê û bi cepilan ew hembêz dikir, bi tûnî bi wî va bûbû yek; -lê niha êdî fera çavê Gregor nemabû- wê bi destan serîyê bavê ji paş da girtibû û jê ji bo jîyana Gregor bexşînî daxwaz dikir.

Dûvmayî heye

Mainz, (Almanya) 21.04. 2015



# Şev xemgîn e

Ibrahim Korkmaz

Şev tarî  
Şev sar î  
Şev xemgîn e  
Ji rojê xeyîdîye  
Binêre, masî qefilîne  
Çiçek dilerizin  
Ba bê heş e  
Xwezî, min tenê ji te heznekira, Munzur  
Lawê Munzurê  
Awurê dûr  
Hezkirina xweş te ra li benda  
Ji min ra dibêje lo lo  
Eyvellah, nakim, ne destê sûbê ra  
Ne jî destên bi xwîn  
Ne stranekî hezkirinê, birînê tevdide  
Ne ji lilandinek ji bo derdî vê derman e  
Ji devara zirav, hêvî qetiya  
Hilweşandin çar dîwar wana  
Xwînî kirin, dane destê biyanî  
Nav lê kirine  
Mecburî Îskan  
û sûrgûn  
Dîtine  
Birçîtî  
Xizanî û zulm  
Şev tarî  
Şev sar î  
Şev xemgîn e  
Ji rojê xeyîdîye  
Binêre, masî qefilîne  
Çiçek dilerizin  
Ba bê heş e  
Xwezî, min tenê ji te heznekira, Munzur

# Heppevînek bi Serkan Köse re

Alî Çiftçi

Roj baş Serkan! Tu dikanî xwe ji bo xwedevanê Birnebûnê bidî naskirin, Serkan Köse kî ye, ji kuderê yî û ji kijan malbatê yî?

– Navê min Serkan Köse, ez li gundê Încovê (bi tirkî Yeniceoba) hatime dunê. Ez deh salî bûm malbata min hate Swêdê. Min li unîversîta Stockholmê beşa siyaset û aborîyê xwend. Pişti unîversîte min dest bi kar kir. Berê wek berpirsiyarê çapemeniyê, li cem Yekîtiya Jinên Sosyal Demokrat, pişti wê li cem sendika Swêdê ya herî mezin, Kommunal och Handels min wek berpirsiyarê çapemaniyê kar kir. Dura min li cem ABFê wek ombudsman kar kir.

Di hilbijartina 2014an de wek parlamentevê Sosyal Demokrata hattim hilbijartin. Cara yekê ye ez wek kurdekkî ji Anatoliya Navîn di parlamentoa Swedê da cih digirêm. Ez bi we pir kêfxwêş im ku bibim dengê gelê me di parlamento da. Ez ï 38 salî me. Zevicî me û du zarokên min hene.

Tu dikarî binekî jî qala zaroktîya xwe bikî? Hevalên te yên zaroktîyê, lîstikêñ ku tu bi hevalên xwe re dilîst, bûyer an



Serkan Köse, parlamentevê Sosyal Demokrata serpêhatiyeka ku di zaroktîya te de bûne û di bîra te te mabin?

– Ez heft salî bûm wexta bavê min hatibû Swêdê. Zarokê malê yî mezin,



Yê li ser pîya ji milê çepê ber bi rastê ve: Osman Köse, Osman Çekiç, Yê li pêş: Ercan Köse û Serkan Köse

ez bûm. Min ji dayîka xwe re pir alîkarî dikir. Xanîyê me yê kevn ê ku bi kerpiça çekirî bû. Malbata me malbateka fikare bû. Min di şes salîya xwe de dest bi dibistanê kir. Berî dibistanê em wek zarokên gund, holik dilîstinî û li nav mala top dilîstinî. Wekî din tiştekî me dikirî tunebû. Hevalên min gelek hebûn û listikên em bi hev re dilîstin pir bûn. Min ji dibistanê gelek hes dikir, bo wê jî ez pir nedîcûm cem hevala. Rewşa min a li dibistanê baş bû. Min digot; ez ê rokê bibim avukat. Ez î heft salî bûm min ji bavê xwe re name dişand

*Serpêhatiya goçberiya malbatê çing*



Malbat

Ji milê çepê ber bi rastê ve: Serkan, dîya wî Ayşe û xuşka wî Şengül  
Yên li pêş: birayê Serkan Özkan û Erkan



*destpêkir, ji ber ci malbata we mecbûr ma ku ji welatê xwe biderkeve?*

—Wek min got, bavê min di sala-1984an de ji gund derket. Wekî gelekînsanên din ên Anatoliya Navîn, ji ber aborî û şertên welêt ên zor mecbûr mabûn derkevin derveyî welêt. Ji alîkî de alaka vê ya siyasi jî hebû. Piştî du sala jî em hatinî Swêdê.

*Te dibistan li kuderê xwend? Hinekî qala xwendina xwe bikî.*

—Zaningeha siyasi û aborî li Stockholmê min xwend. Li ser her du dersa min master kir.

*Tu wek xortekî ji Anatoliya Navîn dema hat Swêdê te xwe çing his kir? Di entegrebûna ciwata Swêdê de tu rastî ci zehmetiyan hatî?*

—Pêşiyê min jî wek herkesî zehmetî kişand. Em dema hatinî Swêdê zivistan bû. Bi min pir sar dihat û min digot;



Gruba parlamenteerên Sosyal Demokratên Swêdê li Şaredariya mezin a Amedê Ji milê çepê ber bi rastê ve: Helin Şahin, Evin Çetin, Shadiye Heydari, Serkan Köse, Anna-Lena Sörensson, Jens Orback, Gülten Kışanak, Magnus Nilsson, Mårten Löfgren och Lawen Redar

em çîma hatinî vira? Lê paşê me ji wî welatî heskir. Îmkan li vir pir bûn. Îmkanê ku li gund tunebûn li vir hebûn. Îmkanê xwendinê û rewşa dibistanê baş bûn. Swêdê gelek îmkan û firset da me hemûyan. Min qet problema entegrebûnê nekişand. Ji ber ku min di pêşî de biryara xwe da û got; ez ê bibem parçekî ji wî welatî.

*Ev hewesa te ya ji bo siyasetê çing peyda bû, tiştê ku li ser te tesîr kir ku te xwe da siyasetê?*

—Hewesa min a siyasetê di xortanîya min de destpêkir. Dema ez xort bûm, salên min 13-14 bûn, ez bi bavê xwe re diçûm

komelê û meşan. Li wir min zanîbû mîletek heye û navê wan kurd e û welatê wan Kurdistan e. Piştî wê min gelek pirtûk li ser dîroka kurda, kultura kurda û ciwaka kurda xwendin. Alaka min zêde bû û min fêmkir ku gelê kurd bindest e û ji nêzîk de min dest bi xabate siyasi kir. Ji wir de destpekir heya îro hat.

*Tu niha di parlamento ya Swêdê da ye. Tu wek ji malbateka goçber û kurd dema di nav xebatên sîyasî yên parlemento de kar dikî, tu xwe çing dibînî?*

—Ez xwe wek parlamenterekî swêdî yî esilê xwe kurd dibînim. Ez herdem

dibêjim; ez û kurd im û mesela gelê kurd jî nêzik de dişopînim.

*Ji bo te pirsigirêkên herî balkêş yêneriba di nav ciwata Swêdê de çî ne?*

—Mesela heri balkêş, xwendin, kar û entegresyon e. Gerek xortêne me bixwînin û xwe parçekî ji wî welatî bibînin.

*Tu ji bo xort û keçen kurda yênu ku li derweyê welêt dibiñin ji bo ku tevli xebatêne karêne politik bibin, li gor tercubeyêne xwe, çi pêşnîyaz dikî?*

—Ez dixwazim xortêne me baştir di nav siyaseta Swêdê de hebin. Niha alaka wan gelek zayıf e. Ez dixwazim bi min ra di têkiliyê de bin û çi ji destê min de hebe ez ê alîkarîya wan bikim.

*Tu du cara çû Kurdistanê, hinekî qala gera we ya Kurdistanî bike, te rewza wir çing dît û çi tesîr li ser te kir?*

—Ez cara yekemîn di Newroza 2014 an de çûbûm Amedê û tevî şahiya bûm. Ji bo min tiştekî gelekî dîrokî bû. Cara yekemîn ku ez çûm Amedê ji ber ku di xortbûna min de rola Amedê di ali siyasi de û di alî têkoşîna netewî de gelek mezin dilîze û min hertim heyal dikir ku rojekê herim Amedê.

Nesîp Newroza 2014an bû. Gelê me bi rastî li ser pîya ye û di têkoşîna netewî de kar û xabateke gelekî xort

dike. Min ew dît. Gelek serbilind im ji ber xabata gelê me.

*Gotineka te ya dawî ku tu ji Birnebûnê re bêjî?*

—Gelek sipas ji bo Birnebûne. Gelek sipas ji bo ev îmkan we daye min. Karê we gelekî piroz e û ji we re serkeftin dixwazim.

*Mala te jî awa ku te wexta xwe veqetand û pirsên me bersivandin!*

*Stranbêjên ku jê hez diki:*

Ji muzika kurdî pir hez dikîm û guhdarî muzikêne cûda dikim. Ji Arif Cizîri bigrê heya Îsa Berwari, Mihemed Şêxo, Aram Tigran û Ahmet Kaya.

*Filmên ku kêfa xwe jê re tê:*

Filmên siyasi, dokumenter, aksiyon.

Filmê ku dawî sêr kiriyejiyana Nelson Mandela bû.

*Niviskarêla ku niha dixwîni:*

Elisabeth George dixwînim. Vê havînê gelek pirtükên li ser mesela kurdî sitandin û niha wana dixwînim.

*Programên televîzyonê ku temaşe dikî:*

Programên siyasi û nûce. Carna jî programên zarokan bi xortê xwe ve.

*Hobi, mijûlîya dema vala:*

Dema vala bi malbatê re ye. Ku firset dît bi malbatê ve li nav daristanê digerim. Carna jî bi zarokê xwe re top dilîzîm.

*Xwarina ku pir jê hez dikî:*

Xwarinê Anatoliyê hemû bi min xwes in. Zad, pîzav û dew bi min pir xwes tê.

# Şînên Xelikan

Fatoş Koyuncuer

*Dilê min ya ne ya ne,  
kesera min daye ser keserê...*

Ev yek ji peyv û hevokêن di nav şînêن Xelikan de têن gotin hatiye hilbijartîn. Li wir di dema şînê de, bi taybetî jîn distirêن. Mêr û jîn şînê ji hev cuda di-kin lê carinan mêt jî dikevin nav şîna jinan, dema ku dixwazîn jinek ji wan re bistire (zêmarekê bêje. –zêmar li ser miriyan tê gotin). Gava mêt distirêن, tiştekî balkêş û kêm tê peydekirin e. Dema ku mîrek distirê, wê gavê her kes dizane ku dilê wî pir dişewite û ew bi windakirina kesê/kesa ku jiyana xwe ji dest daye pir diêse.

Şîn tim bi heman awayî dest pê di-kin û teva dibin. Mêr û jîn li xaniyêن/ malêن cuda rûdinin. Pir caran mîren ji mala kesê/kesa mirî li der ve kesen têن sersaxiyê pêşwazî dikin. Li odaya jin lê rûdinin, xwediyêن malê li jorê cih digrin. Jina distirê/jînêن distirê, ji aliyê jînêن hatine sersaxiyê ve tê/têن hemêzkirin. Ev rewş carinan kurt di-ajo, carinan jî ya hatiye sersaxiyê û ya distirê beramberî li hev vedigerînin. Bi vî awayî şîn ji sibê heta êvarî de-wam dike.

Di nav kilamêن şînê de, bi taybetî pesindana qencî û jêhatiniyêن kesê/kesa jiyana xwe ji dest daye têن go-tin. Pirî caran bedewî, jîrbûn yan jî kesayeta kesê/kesa jiyana xwe ji dest daye veng tê pêşkêskirin: „*Ez bi qurbana delalikê xwe bim*“, „*etika xwe bi qurban*“, „*delalê*“, „*xezalê*“, „*kenabarê*“, „*qubarê*“, „*birayê min ê sifreya xwe ji postê beranan*“, „*bêkes ê/bê bavan ê*“, „*kekê min suwarê hespan e*“, „*kesî min di wê malê de nema*“, „*heta ku ez dimirrim, ez ê wê eşê bikişînim*“, „*koma bê xwedan ma*“, „*heta ku ez ê li dinê bim, ez ê bêjim dayê*“, „*ez bi qurbana goristana xelika ku kekê min lê ramediye (raketiye)*“, „*ew ci derb e ku li me xistiye*“ „*xangê xue kor be*“! Ev tev tenê çend ji wan pesindan û gazincan in.

Kevneşopiyeke gelekî balkêş jî ew e; kinc yan jî wêneyê kesê/kesa mirî, di nav şînê de tê bikaranîn. Wek mînak; dema ji distirê, wan dihejînin an paç dikin. Jin diqîrin, rûyê xwe bi qerpeşûyan xwîn dikin, porê xwe hil dikin û bi vî awahî dixwazîn êşa dikişînin bidin der.

Di nav şînan de, ji aliyê xwedîyên malê ve, rojê sê caran nan tê dayîn. Pir caran cîran û meriyên yê/ya ji-yana xwe ji dest daye jî xwarinan dikelînin û yên hatine sersaxiyê dikin nîvan. Lê di roja şînê ya sêyemîn de, nan (xwarin û vexwarin) ji aliya mala xwedîyê şînê ve tê amadekirin. Ji vî nanî re dibêjin nanê sisê. Di vê rojê de, nan bi taybetî bi navê yê/ya jiyana xwe ji dest daye te çêkirin û bi navê wî/wê tê belavkirin. Ji bîlî vê, hefteyekê her êvar, nanê yê/ya mirî ji malê derdixin, yanê nanê yê/ya jiyana xwe ji dest daye, didin malake xizan.

Di rojên şînê de, temâsekirina li televîzonê û guhdarîkirina li radyo qedexe ye. Piraniya malbatan piştî 10-15 rojan dîsa televîzyon û radyoyêن xwe bi kar tînin. Berê malbata dilşikestî, heta nanê çelê dernediket, ne televîzyon ne jî radyo bi kar dianîn. Berê malbata dilşikestî, heta nanê çilê dernediket, ne televîzyon ne jî radyo bi kar dianîn, ne jî serê xwe dişuştin, ne jî mîran por û

ruyê xwe kur dikirin. Tê bîra min, pir caran spî diketin wan. Di roja çelemin de jî, dîsa nan tê kelandin û malbat, cîran û heval tê cem hev. Bi wî awayî yê/ya ku jiyana xwe ji dest daye, tê bîranîn. Mêrên ji malbata yê/ya jiyana xwe ji dest daye, piştî ew çel roj teva dibe, nû por û riha xwe kur dikin. Berê heta ev çel roja teva nedibû, kesî kincêng rengîn li xwe nedikir. Lê iro zêde kes vê kevneşopiyê bi cih nayne. Ger yê/ya mirî pir bi ciwanî miribe, meriyên wî/wê, reşiyêن xwe girê didin, lê ew kevneşopî êdî kêmpeyde ye.

Li Xelikan eşâ kûr salakê didome. Yê/ya mirî ji salakê şûn de, dîsa bi awayekî dayîna nan û komkirina malbat, cîran û meriyên xwe, tê bîranin. Her wisa li eyd û erefe tê yad kirin. Eyda yekem dîsa wekî rojên şînê derbas dibe. Di wan rojên cejnê yên merî bi taybetî dilges dabin de, tinebûna yê/ya mirî tê ber çavêñ malbat û cîranan û ew roj bi wan pir bi êş û xemgînî derbas dabin.

# Ji Koçberîya Almanyayê WÊNEYEK

Seyfi Doğan

Yên li pê, ji piyê çepê da;  
Maçoyê Malê Qero, Husê Eli Mehmed

Yên rûniştî, ji pî çepê da;  
Hesê Hecî Malê Harşid  
û Bêremê Qizê.



Wêneyî reş û sipî ye. Wêneyî li salên 1960î li Elmanyayê Rojava li bajarê Wittenê li studyokê hatîye qeyd kirin.

Ji bo ci ew wêne hatîye qeyd kirin?

Ji me va şevereş e. Lê, ez dikanim li gor hekatê wanen ku ez pê dizanım, tehmîn bikim.

Ev xortana ê ji Xelike Jor in. Ew wek karkerên mîvan hatibûn Elmanyayê. Armanca wanen, çend salan kar bikin

û wegerin gundê xwe. Bi peren ku qezenc kirî, ji malbatê xwe re jîyanek refah dagirin. Bi rastî jî, her çar xortê me, çend salan li Elmania kar kirin û bi şunda wegerîyan gunde xwe.

Wêneyî li cîhekî profesyonel hatîye qeyd kirin ku kalîtê wêne baş bibe. Dema ku malbatê wanen, nas û cîranan li wêne temaşa kirin, ma întîbaka müsbet nîşan bide. Ma

bibêjên; ê kefêن xwe yên li şunê ne. Hemî li ba hevdi ne! Ji wana re ci heyê! Wana nedixwest ku malbatê wanen xemgîn bibin.

Urbêن wanen yên pak. Kirawatêن xwe, li gor modeya wê demê girê dana. Girê xwe biçûk û pan û zirav. Dîyar e ku ew ê ji bo kirawat girêdanê bi têcrube ne. Hewake xemgin û diltengê xuya dikê.

Ew hewayê, bi rengî wêne, tarîyê studio û urbêن reşen ku wanen li xwe kirî, hî ji zêdetir bi xem dike. Hesret jî heye; malmîratê a dûnê li ser insen teng bike; dil û mejoyî te teslim heyne.

Her çiqas ku xemgîniyêk hebe jî, kêfxweşiyêk û dostaniyêk jî heye. Ew insanan, pir nezikî hevdu rûniştine û yên ku li pê dewestîne, desten xwe yê dana ser milen ên ku rûniştine. Bi wî

avayî yekbûnekê nîşan didin û dibêjên; mala xerîbîyê û hesrete xwelî bi sêri be. Em çiqas dilteng bibin jî, em stuyê xwe li ber derd û kêsaran xwar nakin û teslîm nabin. Em dê bi ar û namuskî, kar bikin û kar bikin ji bo ku di demeke kin da wegerin axa xwe, ba malbata xwe û ba zar û zeçen xwe.

Bi rast jî, wanen bi şev û roj kar û mesaî kir. Ziman û zemanê kapîtalizmê yî bêmerhamet nas kirin. Wanen, makînên ku nabînîn, nabihîzîn û hal û xatira nizanin dîtin û bi leziya makînan re ketin reqabetê. Mala minê!

Filmê Fritz Langê ku bi navî Metropolis heta bîra min. Piranî ji wanen, di bin erdê da li ocaxên komirê da bi wardiyê kar dikirin. Pir caran wanen, roj nedîtin. Rojê ku li gundê wanen bê dua her sibê hildihat, li Elmanyayê însanên bi heysê bûn.

Ew hîn bûn ku zeman pere ye. Jîyan bi saetê hatîyê dagirtin. Ew bûne nasên bangsaet. Bi zengilê bangsaet serî sibê ji xewê ratibûn.

Li welat, jîyan, zeman û bûyêr, li gore rojê bi nav dikirin. Berbangî. Berî rojhelatê, nîvro û paş nîvro. Lî li Elmanyâ ro bi saetê, deqîke û sanîyê dihata pîvandin. Kar bi saetê dest pê dikir û diqedî. Tren bi saet dihat û diçû. Bi saetê radiketin û bi saetê radibûn.

Dema ku ewê li gund bûn. Wanen xwe azad hêsdikir. Azad bûn? Li cîhên ku aborîyê malbatê hakim e û entegrê

ekonomiyê tewahîyê welat nebûyê, azadîyêke bi gund sînordar hebû.

Ew, wek însanen din ku ji bo qezancê hatibûn Elmanya, fedekar bûn. Qemîşe pere xwe nedikirin. Lî ji malê xwe re û bi teybetî ji zarokên xwe re bi piranî jî ji lawan re netêşandin.

Rojekê, xal û xwarzî terin qehwekê û qehwe vedixwin. Xalî, heqê qehwê markekê Elmanya dide xudiyê qehwexanê. Li derketinê, xalî bi xwarzê re dibê; "weng cû em tu mala nakin"!

Wexte ku ew xortana, li Elmanya bûn wekî iro komale, camî û cîhên ku lê werin ba hevdu û biciwîn tune bûn. Jîyana wanen, li navbare fabrikê, wargehê(heim) û trêñ garîyê derbas dibû. Li garê, bi heval û hogiren xwe ve dihatin ba hevdu volta davitin û behsa gundê xwe û nûçen gundî xwe dikirin. Yekî wan gundêne me, henekê xwe dikirin û digot; ez herroj terim îstasyonê ji bo ku binerim, ka îstasyon li cîh xwe heye û tuneye. Ka tren têne û terine.

Îstasyon, ruhêñ wanen fireh dikir. Ew ji klaustrofobîyê diparastin. Heviyê ku wegerin gundê xwe zindî bi xwedî dikir. Di kuriya mêjoyê xwe da, îmkana ku wegerin gundê xwe, bi trêne ve hatibû girêdan. Rojêk dixwazin, dikanin ku li trêne sûwar bibin û wegerin. Dema ku dihatine wargehê, guh didan ser kilamên Yüksel Özkarap, Aşik Mahsunî, Ayşe Şanê û diqehrîn.

# Bayê Rojava

## Xizan Şîlan

ez  
dergûseke li çolistanêñ qijilî  
pêxwas  
tazî  
tî  
birçî û sêwî mayî me  
xwîna pêşîra dayika xwe  
ya sîngsedef û giyanmirî  
dimijim  
dengê qîjeqîja çûkeke perşikestî  
hêlin wêranbûyî  
bêxwedî  
û şeveder mayî me  
ji ber kul û kederên dinyayê  
axîn û nalînan  
dikişinim  
li nav toza qehpikên çavşor  
bi tena serê xwe  
hatim terikandin  
bedena min  
di êş û jana çaxên genî de  
dilerize  
li xurbetê  
rondikên bîranînêñ müşextbûyî  
dadiqultînim  
movikên piştâ dahatûya min  
ji hev de ketin  
di bin barê dîroka zalim de  
bêhna min çikiya  
çeqel û zexelêñ dema reş

çermê xewn û xeyalêñ şîrîn  
gurandin  
minafiqan  
hinav li min peritandin  
teyrokên xezebê li gulîstana şîn  
barandin  
porê serê keç û bûkêñ bermalî  
rûcikandin  
kindirê îxanetê li stûyê qedera min  
alandin  
keska xewêñ min  
herimandin  
li bêdengiya rojêñ stewr  
derbider bûm  
dêlegurên hov  
di perdeya guhêñ min de  
zûrezûr in  
di hêrs û tirsa xwe de  
vediciniqîm  
mija ewrêñ reştarî  
xwe dagirtiyê ser kêf û şahiya  
seyrangehêñ min  
temenê perîşan  
bi keservedanêñ kûr û dûr  
hatine stirihandin  
dilê sefil  
di qêrîn û hawara salêñ kambax de  
diperpite  
di îskeîska girîna gewriya xwe de  
difetisîm

kevirêن çiya û zinaran  
di kuştina min de  
serî hildan  
hestêن sonda tolhildanê  
hiş û mêtjiyê sebira min  
rapêça ye  
êdî ez ê  
ji nav lepêن xêrnexwazan  
bifilitim  
bafiroka aştî û aramiyê  
ber bi stêrkên asîmana sayî ve  
bifirînim  
li ser axa şaristaniyê  
çirûskên agirê eşqa Mem û Zînê  
geş bikim  
birîna kezeb û gurçika welatê rojê  
bi xweşbehna bayê rojava  
bipêcim  
li şevekoriya demên xewle  
meşaleya hurmet û rûmetê  
vêxim  
kaniya jiyanê  
ber bi asoya serkeftinê ve  
biherikînim

bi tililiyan şaxêن dara azadiyê  
bi keskesora rengîn  
bixemilînim  
li baxê hezkirinê  
tovêن kulîlka ronahiyê  
bireşînim  
hêviyêن giyana qefilî  
bi melûliya tîrêjên berbangê  
binixumînim  
li ber wîzîna firtûneyê har  
destmala govend û dîlanê  
bihejînim  
di sergêjiya mestbûna xwe de  
li dor helbestêن kulek semaha şadiyê  
bigerînim  
di dengvedana derûniya xwe de  
stranêن mizgîniya serbestiyê  
bilorînim  
û ez ê  
azad û bextewar bijîm

2015-06-18

Stockholm

# Sîyarê Têrika -5

Bi zaravayê mikaîliyên Polatliyê

Dr. Mikaîlî

## Os li Medresa Mevlana Xalîdî Neqşbendî

Os siwê bi dengî banga Mela Şewqî payî bû. Hema xu berhev kir, çû derva li ber şadirvana Mizgeftê desmî ya xu hilgirt û beziya zikî camiyê. Cemaata siwê pirr ne zêde wû. Wî jî bêyî ku dêng derxîni, hema xu da hêla rêza paşiyê û tev li limê (Nimêj) bû.

Mela bi dengî xû yî dawûdî û xaş bi cemaatê va ibadeta xu kîrin û li doya ibadetê herkes bi lez û bez ji camiyê derketin. Piranîya wana esnaf bûn, hînik jî rîwî û telebeyê Dergahân bûn. Di nav wana da yek yek jî zabît û memurên padişah bi kincê xu yî resmî yên dibriqîn, xanê dikirin. Kinci wana pir bala Osê dikşandin, kefa wî pédihat. Pirr cara ziq diwû li wana mîze dikir. Os derket ber dêri, li mehbîna Camiyê, li ser diwaneka ji texta rûnişt, hetanî ku herkes belaw bû. Mela li dû giştika derket, sole xu kîrin pê, sere xu bilind kir, ew li wir dî. Hat hindê;

Osman Efendî! ez dorberî mizgeftê hinkî berhevkim, dû ra ez te biwim teslîmî şûna te, medresê bikim! Mi tu jî bîra nekir, qe meraq ne ke!

Osê li rûyî wî mîze kir û bi çavi xu jê ra keniya. Serîye xu ye tewand. Got: -Erê.

Wayî pirr bi wî ïna dikir, pê bawer bû. Ew benne wî yî li Stenbolê bû, Osê xu bê tirs û xof pêva girtî bû. Os çû jêr, bare xu girêda, li pişta xu kir û hat li ber mizgeftê bende Mela sekînî. Di zik barî wî da, nîvinik, çend kinc û kol hewûn. Mela hat got;

Bi dû mi di, em ê çîçikî biwestin!

Ketin ranavi sûk û rîyên Stenbolê ê teng. Rê waqas teng bûn ku li hîn dera tenê hesp yan jî heştirekî bi bar tê ra hildihat. Li herdû aliyî rî jî pirranî male ji dara hewûn. Yek cara perda ber pencera dilivîn. Osê jî bi meraqakê lê dinêrî, dizanî ku li paş wana meri hene, pirranî jî keç û bûke Stenbol ê. Osê ew jî pirr meraq dikirin. Hîn cara qame çûn, hîn cara jî ji palekê da daketin, hatin li ber derîkî ji dara rawestîyan!.

Hilma wî miçiqî bû. Mela li dêri xist, gavik şûnva xortekî çend sala ji Osê mezintir, deri vekir. Ku wî Mela dî, bi hurmetekê mezin hema xu dirêjî wan kir, bare wan hilgirt. Sere xu xûz kir û got;

Kerem ki Mela yê min!  
Di bin çava da jî li Osê mêze di-  
kir. Xortekî rû pak bû, zirav û delal...  
Ew derbasî hundir bûn li ser  
diwanikê rûniştin. Mela got; Ka  
şerbetekê ji me ra bînin!

Xortekî din meşîya, du şerbet di  
qadaxên camkî û rengîn da anîn.  
Wana ew di serxu da kirin, pirr xaş  
bû, kêfa Osê pê hat, fedi nekira ê  
yeka din jî bixasta!

Mela Şewqî pirsî: Ka Abdul-  
lah Efendi tunne yî? Ez Osman  
beg teslimi we kim, ji vê şun-  
va ew jî endame cemaata me ye,  
xortekî ji Engürüyê ye, pirr biaqil  
û xadan hurmet e, ji maleke baş i !  
Bi pesnê kêfa Osê hat, herçik diçû  
hîn zêdetir ji Mela hez dikir.

- Osman biwin şûna wî, usul û  
adabê vira jê ra qalkin!

Osê bi xemgînî xatîra xu ji Mela  
Şewqî xwest;

Heqqi xu li mi helal ke, ez va  
rindiyê te tu jî bîr nakim!

Mela; Ew wezifa min merivtîyê  
yi, inşallah ji te insanekî baş û jêhatî  
derkeve, tu ye xizmeteka baş ji alemê  
islamê û dewleta alî Osmanî ra bike!

Os; İnşalla! ez we rûreş nakim!

Çû deste Mela paç kirin, kelgirî  
bûwû. Zivirî û li du xortî ku ji wan-  
ra deri vekirî bû, ket çûn xanîyî ku  
lê bimînin. Ew der odeka dirêj ji

kevra çêkirî bû, tê da qasî bîst nivîn  
hewûn. Xort, paşê hukir ku navî wî  
Ahmet e, jê ra got;

Osman tu dikari li vir rakevel  
ew dolaw jî ji bo tişt û miştî te ni!  
Nêzikî ber dêri şûnik ra wî da.

Osê hema bare xu dayna ser wir  
û kince xu kirin dolawê. Nivîn pîr  
pak wûn, bîna sawûna zeytê jê diha-  
tin. Osê ji vê bînê hez dikir.

Ahmet got; Te tiştê xu bi cîh ki-  
rin wari hola mezin, ezê te bi hevala  
va bidim naskirinê!

Os; Xadê ji te razi bel! ez hema têm!

Ahmet çû, Os gavikê bi tenê di  
zik xêni da ma, li dorpaş xu mezekir,  
intizameka baş xanê dikir, li ber serî  
her nivîna jî maseka çûk û di navbera  
herdu nivîna da jî lamba rûn darxistî  
wûn.

Rawû pê û çû hola mezin, qasî  
depanze - bist xort li vir da li erdê,  
ser balîva bi nîzam rûniştî wûn, bê  
deng kitêwe li ber xu dixandin. Hin-  
ka ji wana ber xu da dikirin mirri  
mir. Li ser pêçiya ket hundir, nedî-  
xast ew bêdengiyê xera biki.

Ahmet ew dî, got; Ware Osman!  
wana gî birange tene! Dû ra qala  
Osman kir, ew da nasandin, giştik  
rawûn pê yek bi yek hatin ew bi xer-  
atî kirin, bi çavêن tiji meraq û bi pirs.

Balîvik jî ra wî dan, Os çû li ser  
rûnişt.

Tu tirkî dizani?

Tu xwandinê dizane?

Ji ku yi?

Navî te çi yi?

Pirs li dû pirsa dihat.

Osê got; Erê, ez li Heymanê, anatolya Navîn im, li wir jî bi çend meha çûbûm dersxanekê, mala me da jî, mezinê me gî xande û dîndar in!

Ooo, ew pirr rind il ku wakîna yi, karî te sivik dibi!

Ji wî ra gotin.

Qala programa medrese kirin, çi ders hene, kinga dest bi dersa dikin û dû ra çi dakin, hertiş ji wî ra gotin, bi hatina wî hereketek hat nav medresê, şahîyek peyda bû. Lêva wî ya lêvse tu bala kesî nekşandî bû yan jî xu kerr dikirin, nedixastin bala xu pêdînê û dilî wî bişkênin.

Os wek yekî ji wana hat qebul kirin.

Vayê Os hanî eşqê, Osê çi kitêw, ders dihat ber bi hemdî xu dixand, ezber dikir. Çî kar didanê hema dikir, yek ne dikir dudu. Çend meh şûnva kitêwe vê medrese gî xandin, dest bi gera kitêbxana din, a li medresen din li Stenbolê kir. Herkesî ew dieciband. Di wextekî kin da nave wî di nav medrese Stenbolê da belaw bû, hat nasîn. Mela Şewqî jî ew serketina wî dibihîst û ku qala wî diwû, bi serbilindî digot;

Dîtina wî şagirdî xadê nesîbî mi kir! Ez rûreş dernexistim!

Le Osê hîn jî Muderrise mezin, Mevlana Xalid, Xalide Neqşbendî nasnekirûwû. Wî pirr dixast wî biwîni û ji wî hîn tişa hu biki.

Osê bi hafiziya Quran a bimbarek pir hezdikir, ku dest bi xandina wê dikir, ji xu diçû, her tişt ji xu bîr dikir. Dengekî wî yi dilşewatî hewû. Hevali wî yi dersxanê tim ji wî dixastin ku ew Quranê bixûni. Di nav cemaatê da û li nav esnafi çarşıya Stenbolê da ew hendi pir baş dihat naskirinê. Ku yekî mewlûda xu hewûya yan jî ji bo miriyî xu Quran bida xandinê, ji wî ra xeber dışandin. Digot bira hafızî kurd i ji Engürü yê wari. Nave wî li Stenbol ê bûwû «Heymanehli Kurd Hafız» .

Ew yek çû guhî Mewlana Xalid jî, rokê bêyî ku haya Osê ji wî hewi, ew jî bi dizika tev li guhdari wî bû. Mewlana bi xandina wi ji xu çû, li piştî civînê bangi wî kir, rawû Os ji enniyê da paçkir.

Osê tehmin dikir ku ew kî yi, le hîn ew nasnedikir, şaş û metal mawû, nedizanî li cem wi çibiki, xu avêt desti wî, ew paç kirin, girî bi çava ketin, rondike wî deste Mewlana sil kirin, vê carê ji kéfa, ji eşqê, ji şawûnê digiriya...

Mewlana deste xu li baliva hêlê

xu xist û got; Danişel!, yanê bi kurdiya jêrî, rûne Xortî delal, rûne!

Os hinkî gêj bûwû, hevala bi çava gotin runi. Xu wek çewalikî avêt hêla Mewlana, di bin çava da lê dinêrî, bê deng, teye bigote qey dilî wî yê nika ji sîngê derkeve û mîna çûçikê bifire. Mewlana mîrikî qasî 50 salî wû, rind bû, rû berdawû, lê rûyê xu birrî û şekirî bûn. Bi destikî tim rûyê xu mist dida.

Çex Oso bû û bi Osmanî jê pirşî; Osman efendî tu jî wek min Eqrاد i? (Eqrاد=Kurd)

Osê got; erê!

Mewlana Xalid; Ji ku ye?

Os; Ji Engürü, Heymana, lê kalî min ji Kurdistanê, ji aliyê Ruhayê bar kirina wur.

M.X.; Hûn xadan eşîr in?

Os; Erê, em Mikaili ne!

Ku war got, M.X. yekva denge xu bilind kir, hinkî bi hêrs qîriya; Tu min naxapîne?

Os çîcikî tîrsîya, got;

Estagfurullah! Mezini me tim wakîna digotin, Eşiri din jî jî me ra Mikailî diwêjin!

M.X. dîsa bêdeng bû û got; Ji ber ku ez jî Mikaili me, lawê İsmail Begî Mikaili me, ji aliyê Silêmanî, bajarokî Qeredaxê! Ji bo yî vê ez şas bûm, min bibaxşîne!

Em jî binyatekî ne, koka me yek

e! meriyê hevûdu ne, keniya.

Kêfa xu pir bi vê hatibû. Ê wê derê giştika bi ew kêfa M.X. kenîyan.

Dû ra ji Osê ra got; Xorto! Tu merivekî jêhatî û kér î!

Eger tu jî bixwaze, ez dikarim te ji bo encümeni müezzin pêşniyazî bikim!

Tu yê di bin hîmaya serayê keve, bi padişêh ve girê bi. Wêngê hendi pişta te né erdê!

Os di şûna xu da war ma, ziq bûwû li wî dinêrî. Ne digot erê, ne digot na! Her tişt pirr bi zû eyan diwû, ew pê nedigêstê. Wî ew tiştana di xevna xu da jî nedidîn, lê giştik jî rast bûn û dihatin serî wî.

Bi dengekî nizm; „Emir kin! Hûn çito minasiw diwînin, bira wakîna bi!“ ji devî wî derket.

Mewlana Xalid hema ji xulami xu ra dest bada, ew meşîyan, tişte wî berhev kirin, ew li pêş, Os li paş wana çûn tevî Encümeni Müezzîna biwin.

Os hin nû ketiwû 18 saliya xu û ew du sal bû li Stenbolê dijî. Hertiş pir pir zû diwû...Ew ji xu xaş bû, le tenê tiştikî sere wî diêşand, xu bi xu dixar; Ew lêva wî ya dirayî. Ku wî hafıztî dikir hîn cara dikir tisse tis, dengikî nexaş jê derdiket. Ku ew hat bîra wî, şewatik keti sînga wî, dîya xu hat ber çava. Serayê ji bo camî,

mizgeft, dergah û mescidên ku weqfa Sultan û Şehzada ra kadroyên Mela, Hafız û müezzina avakiriwûn. Ji bo ku ew derana bê mela û hafız nemînin, mehanîya wana jî xadanî weqfê didan. Di dili her müezzin û hafizekî Stenbolê da tevlîbûna vir derbas diwû, lê bes ew ji Osê ra bû nesîw. Ku Os çû wur bi Mewlana Xalid hevûdu hin pirtir didîtin. Ji wî li ser İslamê, tarix, rola kurda di belawbûna islamê da û behsa milletên aliyê Rohilatê dibihîst.

Yek cara jî bi wî ra qala jîyana gundû koçberîyê dikirin. Mewlana pirr kîfa xu ji jîyana kurda ku li navîna Anatolyê dijîn, dihat. Her tim dixast bira Os qala êla xu biki. Kurmanciya mewlana ew pirr pê nedîghiştê. Pirranî bi Osmanî, türkiya Stenbolê bi hevra deng dikirin.

Wî li cem wî erebiya xu pêsta bir, li hêlê vê zimanê şîir û edebiyatê, farsî ji hukir. Farsî pir mina kurmanciya wan bû, zû elimî. Ew hêndi yek cara diçû camiya ku Padişah terin Cumayê jî, li wir berî limêkirinê ji cemaatê ra Quran dixwand. Ew di nav jîyaneka xaş da dijîya, pir kesî dile xu diket wî, dixastin mina wî, bi serketî bin. Rokê xortekî di sali wî da û di hizmetta xususî a Xalidî Neqsîbendî da wû, bi kelecanekê hat hindê wî. Ji ber ku Mewlana Xalid temsilkare Dergeha

Neqsîbenditîyê bû, jê ra digotin Xalîdi  
Neqsîbendî jî...

Osman Efendi! Osman Efendi!

Mamoste xeber şand, diwê bira Osman Efendî xu ji bo Xutba ïnê, cumayê amade ke!

Di mizgefta Walide Sultan da! Sultan Selim jî tê ji devî te Quranê guhdar biki!

Ew ji Osê ra pirr bû, wek pelkê li ber bê ketî diheziya. Ew xortî ku ji wî ra ew xebera hanî wû, bi millê wî girtûwû û ew dileqand.

Hafız, Hafız! Kendine gel! (Hafız, Hafız! heşar bi!)

Moriya çavî Osê gir bû wû, Xort jê tîrsiya û got;

Bâşına talih guşu gondu be yaw! (Çavî te ronî! talix ji te ra keniya!)

Os venciqî, hati xu.

Got; Berxudar bi!

Û hema xu ji bo xutbê amade kir.

Di mizgeftê da di royê ïna da şûn ne dima. Os çû cem hafiza, li ser coga rûnişt, kir Bismillah û Qurana xu ve-kir, çavê xu girtin û dest bi xandinê kir. Cemaatê dîsa wek hertim bi heyranîyeka mezin ew guhdarî dikir. Hînika bi deng digotin;

Ya Allah!, Ya Muhammed! û hînik ji wan jî digirîyan.

Padişah di Xutbeya ïna da dihat camiyê, şûna wî û merivê nêzikî wî di nav camiyê da cûda wû. Osê ew

nedidî, le wî ew didî û denge wî jî  
baş dibîst.

Osê wek hercara dîsa ji ber lêva  
xuyî diryayî, dikir tisse tis. Û her car  
jî serçave wî sor diwû...Quran qedî-  
ya, dor hat hafizekî din, Osê hilme-  
ka gir kişand sînga xû û sere xu rakir  
li dorpaşî xu mîzekir. Heyranîya  
cemaatê jî boyî wî pirr eşkere wû. Li  
piştî limê derket derva, pala xu da  
diwarî camiyê û xu bi xu got;

Şukur jî ter a Xadêyo! min ew  
imtihan jî da!

Hîn ku wî ew difikirî, dît ku du  
yenicerî, leşkerê Padişah ê taybet  
bi simêlê xu yî palê û kincê xuyî bi  
suret ber bi wî têñ. Hatin li ber wî  
sekinîn û yekî got;

Sultanim seni huzura emr edi-  
yorlar! (Sultan te dixwazi!)

Hundir li Osê qetiya, ku Sultan  
bangî yekî kir tenê du tiş diwûn;  
Yan serê te jê dikirin, yan jî bahşîşek  
didan te. Osê got;

Eywax, min herhal Quran ne baş  
xand, Padişah e serî min jê ki!

Bi tirs ket nav herdû Yeniçerîya  
û xu teslimî qedera xu kir, zaten tu  
tiştekî din jî ji desti wî nedihat. Bi  
çava li Xalîdî Neqşbendî digeriya, le  
bêçare nedîdî. Belkî ewbihata hawa-  
ra wî.

## HELBEST

jîyan demsal in  
a niha bihar e  
dema bereketê ye  
gul bêzehmet venakin  
hesret birina kûr e  
îdo  
kekî mino  
xanimrengan gul vekirin  
serî sibê guliyêñ wanân  
şîrin û şîrin dibirikin  
ole me dewlemenda  
tamên dunê biceribîne  
û  
nas bike  
bi hemdî xwe  
wek berxa berkozê  
şirê dayîka xwe bimêje

*Seyfi Doğan*

# Raporek li ser kurdên li bakûrê Îranê; kurmancêñ amarî li Rûdbarê

Berat Qewî Endam

## Pêşgotin

Bi giştî hin komên ji xelkê bi eslê xwe kurd li herêmên bakûrê Îranê ango parêzgehêñ Gilan, Mazenderan, Gu-listan û Erdebîlê her wiha deverên derûdora Têhran û Qezwînê dijîn ku li qonaxêñ cûrbicûr ên dîrokî û bi şêwazî cûrbicûr carna koça ji ser mecbûrî û sîrgûnkirinê, carna koça bi hemda xwe, carna sîrgûnkirina kesen eşîrekê û babet û egerên din li van deveran bi cih bûne û roja iro şopa wan li van navçeyan heye. Ci xelkê ku xwe wek kurd dihesibînin, ci navêñ ku ji eşîrêñ kurdan mane û ci navçeyêñ ku navê wan nîşan dide ku girêdayî bi hebûna kurdan e. wek mînak Kurd-koy, Kelardeş, Siyahkel, Rûdbar û Mencîl, Tunikabon, Xelxal, Demawend, Tarom, Qezwîn, Coybar û hwd. Kurd di dirêjahiya dîrokê da û ji deverên cûrbicûr ên kurdnişîn û bi zaraveyêñ wek kurmancî, kelhorî, lekî, lorî koçî van deveran kirine. Ji wan em dikarin kurmancêñ zaxorî amaran ku ji ser wan in, kelhor, bace-

lan, reşîwend (reşîyan), ustacloyan, kakawendant û yên din nav bibin. Ro-ja iro piraniya xelkê kurdtebar ên bakûrê Îranê bi taybet ji hêla zimanî va li nav ziman û gelên cînar heliyane û êdî tu şop û bandorek ji zimanê wan ê dayîkê ango kurdî nemaye yan eger maye herî lawaz e. lêbelê desteyek ji kurdên kurmanc ku piraniya wan derûdora 280 salan berî niha di sala 1733'an li pêvajoyeka koça dubare ji Xorasanê çûne van deveran, hîn jî mi-jara serekeya nasname û hebûna xwe ango zimanê kurdiya kurmancî parastine û bi vî zimanî diaxivin. Ev desteyek ji kurdan li çend deveran ji wan çend navçeyêñ cuda ji hev li şaristana Rûdbar Mencîlê, devera Talişan û Xelxalê, Demawendê û hwd dijîn, lê piraniya wan li navçeyêñ zozanî û berz û bilind û kesk ên şaristana Rûdbar û Mencîlê bi cih bûne. Ez li vê gotarê dixebeitim ku vê navçeyê û kurdên wê ji hêla taybetmendiyêñ zimanî, erdnigarî, çandî, dîrokî û mirovnasiyê bi kurtî bidim nasandin.

## Dîrok û serpêhatiya kurdên Gilanê

Kurdên Rûdbarê heveşîr û hevkoka kurdên Xorasanê; kurmancan in ku ew bi xwe jî derûdora sala 1604'an ango 400 salan berî nika ji deverên kurdnişin ên bakûrî (rojhilat û başûrê rojhilata Tirkiya îro) di pêvajoyeka koça çend sale ber bi Xorasanê va koç kirin. Piştî bicihbûna kurdan li Xorasanê di serdema hikûmeta Sefeviyan – helbet ku pêş û piştî sala 1604'an jî hinek ji kurdan hatin Xorasanê – û derûdora 130 salan piştî hatina wan a Xorasanê ango 1145'a koça hîvî beanberî sala 1112'a koça tavî (sala 1733'an), di serdema paşatiya Nadêr Şahê Efşar da komek ji wan ku piraniya wan amarî (eşîra amaran) bûn ber bi bakûrê Îranê va koç kirin. Hêjayî gotinê ye ku eşîra amaran di wê çaxê da piranî li deşta Marûska Nêyşabûrê – ku di bin desthilatdaya îlxaniya Qûçanê bû – her wiha derûdora Qûçan û Bijnûrtê dijîyan, hinek li nav gundan û bajaran û hinek jî koçber bûn. Di serdema hikûmeta Nadêr Şahê Efşar ku bi xwe kurdeki xorasanî bû, komek ji amaran bi serokatiya çend kes ji xan û mezinên vê eşîrê ber bi Gilanê va koç kirin û li zozanêñ derûdora Rûdbar û Mencîlê û quntarê Çiyayê Derfekê bi cih bûn. Hinek ji çavkaniyêñ dîrokî yêñ belge-war û gotinêñ di nav bav û kalêñ vê

deverê dibêjin ku egera koça van amaran pêwîstiya sekinîna wan a li hemberî ûrisan bûye, lêbelê renge egerên din wek nakokiya ligel xan û serokên qûçanî jî hebûya; ev gumanek e. Koç û sirgûnkirinêñ wisan ci ji aliyê dewleta navendî û ci ji aliyê hikûmetên herêmî ango îlxaniyêñ Qûçan û Bijnûrtê pêk dihatin û wek mînak carna eşîrek ji de-verke Bijnûrtê bi darê zorê ber bi Serexs yan Kelatê li Xorasanê dihate sirgûnkirin. Helbet renge hinek ji kurdên li bakûrê Îranê û deverên wek Qezwîn û Weramînê di dema rawesta-na demkî ya kurdan bi qasî salek û çend mehan li devera Weramînê berî koça dawîn a ber bi Xorasanê va, ji gir-seya kurdan cuda bibûyana û li wir bi cih bibûna. Ji wan deveran em dikarin Qezwîn, Demawend, Şimîranat û deverên din nav bikin. Wek ku em za-nin eşîrên hevnavê kurdên Xorasanê wek Sêyl Sipûran, Qeraçûrlûyan û yêñ din roja îro li Qezwîn û hinek deverên derûdora Têhranê dijîn.

Kurdên Rûdbara Gilanê teví derbasbûna ji 300 salan zêdetirê hîn jî xwe "**Kurdên qûçanî**" dizanin ku ev yeka çend tiştan nîşan dide. Ji wan yek ev e ku piraniya wan ango amaran û desteyêñ din ên biçuktir ji eşîrên din ên hevrê ligel wan ji şaxêñ komeşîra mezin a zeferanlû ango zaxoriyêñ Qûçanê

bûne û li navçeya di bin serokatiya îlxaniya Qûçanê dijiyane. Hîn jî hinек ji kesên temendirêj navêن wek Şaycan, Aledax, Hezarmeçit û hwd ku navêن çiyêن bakûrê Xorasanê ne, bi bîr tînin. Wer xuya dike ku ji bilî amaran deste û komên biçüktir ji eşîrên din jî hevrê bi wan ra koç kîrine. Lê piştî koça wan a bo Gîlanê têkiliya wan û Xorasanê tê birrîn. Hebûna kevirêن li ser goran li navçeya **Mîkala** Dêylemana Gîlanê bi navê Enbarlû (navekî din ê amaran li Xorasanê) jî nişana girêdayibûna wan bi amarêن Xorasanê va ye.

Di heyama hebûna kurdan li vê navçeyê, ewna ci di dema Nadêr Şahê



Xorgam-Rûdbar-Gilan-Amurlû

Efşar da, ci dema paşatiya Kerîmxanê Zend û ci serdema paşatiya qecerên tirk, hertim ji hêla leşkerî û desthilatê va çalak bûne û kesên binavûdeng ji nav wan hulisiyane û carna jî



Rûdbar-Gilanê

fermandetî û rêvebiriya herêmê wek Zencan, Qezwîn û Tunêkabonê bi dest xistine.

Gelê vê navçeyê ji ber erdhêja  
21'ê hezîrana sala 1995'an gelek zi-  
yan û xisarên canî û malî dîtin û vê  
bûyerê bandoreke neyênenî yê derûnî  
û rihî li wan kir.

## Erdnigarî û cî warê kurdên Rûdbarê


Kurdên devera Rûdbarê ji hêla erdni-gariya şaristanî va roja îro pirtir li  
beşen Emarlû (Amarlû), Xorgam û Rehmet Awad û Bilûkata şaristana  
Rûdbarê ya parêzgeha Gilanê dijîn.

Navenda beşa Xorgamê bajarê  
Berê Ser e û du gundistanên Xorgam  
û Dulfek li vê besê hene. Piraniya

Kurmancan li vê beşê ne lê galisi (dêylemî) jî ku zimanê wan dêylemî ye li vê deverê hene. Her wiha li şaristana Dêylemanê jî hinek gundên kurdan hene. Xelkê ku ji van deran çûne bajaran piranî li bajarên wek Reşta navenda Gîlanê, Rostem Awad, Loşan, Mencîl, Qezwîn, Târom û Têhranê bi cih bûne. Kurdên vê deverê wek galisiyan peyva ‘Mehel’ li şûna ‘Gund’ bî kar tînin.

Li beşên cûrbicûr ên şaristana  
Rûdbarê yanê Xorgam, Amarlu,  
Rehmet Awad û Blûkatê hinek ji  
gundêñ kurdan ev in:

Beşa Amarlu: Gundêñ Sengerûd,  
Zekabêr, Deştê Zer, Kere Rûd,  
Kirmaka Jor, Zerd Kêş, Degaser,  
Gurdelat û hwd. Her wiha hinek



Nexşeya deverên kurdnişîn ên şaristana Rûdbarê



Kurdên qûçanî li Rûdbara Gîlanê

jî şeniyêñ bajarê Jêrende, Damaş û Pakdêhê jî kurd in.

Li beşa Xorgamê: Gundêñ Piştelah, Dusaldêh, Pes Talkûh, Sîbin, Talkûh, Gurdwîse, Nûr Erş, Çîçal, Sê Pistanek, Sêyqeldêh, Kêşkêş, Naş, Cihîş, Goful, Nûdêh, Birarûd, Celaldêh, Şerkede, Leyavula Jêr, Leyavula Jor, Maşmiyan, Wişan, Hişmet Awat, Sormul, Çemel û hwd.

Şeniyêñ gundê Çarmelhel ji şeniyêñ berê yên gundêñ Sormul, Sosif, Maşmiyan û Leyavulê ne.

Li beşen Rehmet Awat û Bilûkatê: Gundêñ Çere, Çilkaser, Reşî, Xaskûl, Çileber, Hacîdêh, Rûdxane, Gunbek, Sundos, EnarKûl, Istelxkûl

(Istexrgeh), Deştewîl û hwd. Li şaristana Dêylemanê: Gund û deverêñ Lor, Pîrkûh, Cilîse, Gence û hwd. Û gund û deverêñ din ku bi giştî em dikarin bêjin nêzikî 50 parça gundêñ kurdan li vê navçeyê hene. Navê hinek ji van gundan kurdî ye û navê hinekan jî gîlekî yan dêylemî ye. Bi giştî ev navçeya bi navê amaran (Amarlû tê naskirin).

Ev herêma yek ji deverêñ xweş û seyrangehêñ Îranê tê hesabê ku ji aliye bakûrê rojhilat va bi herêma Dêylemistanê û ji aliye rojhilat û başûrê rojhilatê va cînarê devera berz û bilind a Elemûta Qezwînê û keleha Hesenê Sebax e. navçeya

binavûdeng a Damaşê jî li vir e. her wiha Çiyayê berz û bilind ê **Derfekê** jî ku bilindiya wî 2733 mitr e li beşa rojavayıya vê herêmê ye. Hatinûcûna xelkê ji riya bajarê Rostem Awat û Loşanê her wiha ji aliyê Dêylemistanê va pêk tê. Hêjayî gotinê ye ku gelek ji xelkê bi eslê xwe kurd li Mencîl û Rûdbar û deverên din ên parêzgeha Gîlanê dijîn û mijara me li vir kurdên kurmanc in ku hîn jî nasname û zimanê xwe dagirtine.

### Eşîrên kurmanc li navçeyê

Gerçi ku bi giştî vê deverê bi navê kurmancen amarî dinasin lê deste û komên din ên eşîrên kurmanc wek şaqilaniyan, ustacaniyan, şemxaniyan, mûsilaniyan, mojdikaniyan, keraniyan û yên din jî li vir hene û bi kurdî dipeyivin.

### Ol û baweriyêñ mezhebî

Li hêla olî û baweriyê da ol û mezheba xelkê wek kurdên Xorasanê şîe ye. Ligel welatê bav û kalan ê kurdên Xorasanê, hin kes li ser vê bawerê ne ku kurdên Xorasanê berî koça bo Xorasanê li ser baweriya elewîtiyê – ku nêzikî bawera şîeyan e – bûne. Şahidiyêñ berfireh li bawer û resm û folklorê ji vê yekê ra hene. Em dikarin bêjin ku bawerên olî û mezhebî ci li

qonaxa raman û fîkirînê, ci ji hêla kiryar û birêxistina merasimên mezhebî li nav kurdên Rûdbaêr herî pirrengtir û berbiçavtir ji Xorasanê ye û cûreyek hevsengî û yekcûretî di navbera kurdan û cînarê wan ên dêylemî heye. Lîbelê kurdên vê herêmê jî wek Xorasanê gelek hez ji kurdbûna xwe, kurmancbûnê dikin û bi şanazî vê yekê tînin zimên.

### Taybetmendiyêñ nasname û huwiyyeta kurdên Rûdbarê

Kurdên vê herêmê wek beşeka cudabûyî ji peykera serekeya kurdan ku herîkêm du qonaxên dîrokî yên koçê ceribandine, ji hêla civaknasî û çandî va xwedan taybetmendî û ciyawaziyêñ xwe ne. ewna carekê ji deverên kurdnişîn ên bakûrî (li welatê Tirkiya niha) hevrê ligel konfédêrasiyona kurmancen Zaxorî û Şadiyan di derûdora salên 1604'an da çûne Xorasanê û hema hema 100 salan piştra ber bi zozanên berz û bilind û xweş yên Gîlanê û nav dêylemî û gîlekiyan bi ziman, çand, şewaza jiyan û taybetmendiyêñ ciyawaz koç kirine. Bi wê qasê ku kurdên Xorasanê ji ber nebûna peywendiya ligel welatê dayîkî û jiyana li welitekî teze û cînartiya tev cînarên nû hêdî hêdî pêrgî hin guhertinan li gişt mijarêñ jiyana civakî, çandî, bawer, şewaza jiyanê û hwd din hatin,

kurmancê herêma Rûdbarê ji ji ber nifûsa kêm tûşî guherînên zêdetir di hemî waran da bûn.

Wisan ku dîrok dibêje kurdên Rûdbarê ji dema hatina xwe ya herêma Rûdbar û Dêylemanê heta berî desthilatdariya dewleta Pehlewîyan li Îranê – ku kiryarê wê dawê gişt mîrnişîn û hikûmetên herêmî li seranserî Îranê girtin – tevî nifûsa xwe ya kêm ji hêla leşkerî û siyasi va li vê deverê desthilatdar bûne û bi vî awayî bi şe kirine (karîne) ku heta redeyekê sînorên xwe yên mirovî û hebûna xwe biparêzin, tevî ku danûstandinên xwe ligel qewmên cînar jî li astekê berdewam kirine. Her çend ku ji wê dewranê û vir da

bi zêdebûna hatinûçûna xelkê bo navçeyê din û bajaran her wiha bi berfirehbûna pergala hikûmetî, hatina sistima perwerdehiyê bo van deveran, pêvajoya guhertin û tevlihevî û asîmîlasiyona çandî û zimanî û civakî ligel qewm û çandêن cînar bileztir bûye û em dikarin bêjin ku ji bili zimên û navê kurd (kurmanc) ku ew jî vedigere ser zimên, gişt xusûsiyetên civakî û çandî ji wan cil û berg, müzik, cûreya danûstandinên civakî û hwd tûşî guhertinê berfireh bûne û cûreyek hevkêşî û hevsengî ligel qewmên din pêk hatiye. Di pêvajoya guhertin û danûstandinên çandî wer xuya dike ku kurd pirtir ji yên din çand û zimanê cînar qebûl kirine.



Li herêma Rûdbara Gilanê



Herêma Rûdbar

Her çend ku piraniya cînarên galîş û dêylemî ji ji hêla çandî û zimanî va ketine bin bandora kurdan. Wek mînak hinek ji wan zimanê kurdî fêr bûne û vî zimanî li jiyanâ xwe ya rojane û danûstandinê xwe ligel kurdan bi kar tînin.

Roja îro piraniya şaxis û pîvanê nasnameya qewmî ya civata kurdên vê herêmî tûşî guhertinê hatine û bere bere ketine bin bandore layên naşnameya neteweyî, mezhebî û herêmî û ji vê hêlê va werdayîn û tevliheviyeke ecêb ligel qewmên din xuya dibe. lêbelê kurdê herêma Rûdbarê li dû nasnameyeka din ji heye. Îro ji her kesî li vê herêmê pirs bikî bi meraqdarî û kelecan

xwe wek kurmanc – kurdê Qûçanê – dide nasandin; tevî ku ji pîvan û şaxisen nasname û huwyeta kurdî, tenê ziman jê ra maye. Zimanê ku li ba piraniya kurdên vê herêmê tenê zimanê gotin û devkî ye û ne zimanê ku were nivîsin û xwendin. Ev his û hestê kurdbûn û xwe wek kurd binavkirin bi giştî di asta diyarkirina nasnameya xwe, hisê nostalijîk û cudazanîna xwe ji civaka derûdorê ji babetê nijadî û zimanî va dimîne û kêmtir di warê wêje û nivîsin û ramanê diyar dibe. Hastênu ku eger li demek dirêj da wisan bimînin, wê ev zimana ji ji dawê here.

Eger kurdbûna li vê deverê di dem û dewranê pêşin da meydanek




Xorgam-Rûdbar-Gîlan-Amurlû

ji bo nimûd û nîşandanê hebû, lê roja îro rewş bi taybet li vê herêmê guhertiye. Îro ziman û nasnameyek dikare mayînde bimîne ku di warên cûrbicûr ên jiyana îroyîn ji wêje û çand û medyayê bigir heta tîknolojî û warên zanistî û hwd da were bikaranîn.

### Zimanê kurdiya kurmancî û guhertinêni wî li herêmê

Wek ku me amaje pê kir kurdê Rûdbarê bi zaraveya kurmancî diaxîvin û tevî ku hate radeyekê bi zimanê din ên wek dêylemî û gîlekî va hatiye werdan lêbelê piraniya xelkê zimanê xwe parastine û heta li hinek deran galişî jî bi kurdî diaxivin. Hêjayî gotinê ye ku çend komên sereke yên nijadî û zimanî yên gîlek, talişî, dêylemî û kurd û hinek jî tirk li parêzgeha Gîlanê

dijîn. Ez naxwazin bi kûrahî li ser zimanê kurdî li vê herêmê binivîsim ji ber ku pêwîstî bi lêkolîneke berfireh heye. Li vir tenê ji bo berhevdanînê çend mînak ji wekhevî û ciyawaziya zaraveya vê herêmê ligel deverên din dinivîsim. Tişa balkêş ev e ku hinek ji peyvîn ku êdî li Xorasanê nayêñ



bikaranîn û ji nav zimêñ verketine, li vir têñ kêr. Peyvên wek Zevî, Merî (Meriv), Havîn, Îsot, Pîs, Herî, Berjêr, Berjor, Dev, Biçûk ku li Xorasanê kêm peyda dibin li şûna wan peyvên din wek qefçil (pîs), temîz(havîn) û hwd bi kar tînin. Egera vê yekê taybetiya giravbûna zimêñ e. Yanê ji ber ku ewna ji kurdêñ din dûr ketine û têkiliya wan bi wan ra tunebûye peyvên resen li zimanê wan mane û yeksansaziya zimanê kurdî li deverike berfireh li bara wan çênebûye. Wek vê mijarê li hînek gundêñ navçeya Marûska Nêyşabûrê jî ku ji navçeyêñ kurdan wek Qûçanê dûr ketine tê dîtin. Ji ber ku ewna peyvên wek Zîndan û Stêrk bi kar tînin, li halê ku gişt kurdêñ din ên Xorasanê Zîndan û Çik bi kar tînin.

Li vê herêmê (Rûdbarê) dewsa "Bi" yan "We/wi" ya Xorasanê pirtir "Pe" bi kar tînin. Mînak: Min pe te ra got. Her wiha dewsa "Ji/Je" pirtir "Le" bikar tînin. Mînak: Min le kaniyê av hanî. Helbet ev yeka taybetiya vê herêmê nine û li hînek ji deverêñ Xorasanê jî 'Pe' û "Le" wisan bi kar tînin. Piranî destpêka lêkeran dewsa "Di", "Te" tînin. Mînak: tebêm (dibêjîm), tebî (dibêjî), tebî (dibêje), tebêni (Em dibêjin), tebêñ (Hûn dibêjin), tebêñ (Ewna dibêjin)

Sewt û ahengê axaftina kurdan li vê herêmê wek ahenga gîlekî û galî-

şîyan e. wisan ku lehn û ahenga axaf-tina kurdêñ Nêyşabûra Xorasanê, nêyşabûrî ye.

### **Parastin û vejiyandina zimanê kurdiya kurmancî li Rûdbarê:**

Ziman wek pîvan û şaxisa sereke ya nasnameya her gelî tê hesabê. Eger ziman were parastin, wê pîvanêñ din ên nasnameyê jî tê parastin. Îro zimanê kurdiya kurmancî di hemî qad û warêñ zanistî, ramanî, çandî, wêjeyî, têknolojî û hwd ci bi awayê nivîskî û ci gotinê li erdnigariyeke berfireh û li nav bi miliyonan kesî tê karanîn. Tê gihiştin ku hêvîsına elfabêya standard û hevpar a kurdî, xwendina pirtûk û berhemê bi vî zimanî, nivîsına wêje û folklore xwe bi vî zimanî bi taybet ji aliye kesêñ xwendî û bijareyêñ vê herêmê wê bi besebeba vejiyandina zimanê kurdî li nav wan. Ji ber ku qalik û çarçoveya zimêñ li vê herêmê sax û parastî maye û tenê pirsgirêka nebûn yan jinavcûna peyv û têgehan her wiha nebûna agahiya li bara xalêñ rêzimanî heye ku bi xwendina pirtûkan û naskirina navçeyêñ din ên kurdnişîn, lehiyek ji peyvan derbasî nav zimanê nivîsin û axaftinê dibe û bi vî rengî ziman di heyameke kin da ve-dijiye. Ev erka li ser milêñ kesêñ xwendî û bisewad û kurdîhez e.



## Wêje, mûzîk û folklore

Ji hêla çanda gelempêri (Folklor) û wêjeyê va divê em bêjin ku wêje û folklore kurdên vê herêmê heta radeyeka bilind ciyawaz ji ya kurdên Xorasanê û bi vî awayî deverên din e. mûzîk û alavên mûzîkê wek dutar, qûşme, kemançe û hwd ku li Xorasanê pir berbiçav û dewlemend e li vir tu-ne. Tenê bilîr heye ku ew jî ne ewqas dewlemend e.

Bi giştî rewşa mûzîkê li vir herî lawaztir ji Xorasanê ye. Şewaza strîn û lehnê wê ciyawaz e. Hin stranên gelêrî û karawaz bi kurmancî li nav wan hene. Lîbelê wek Xorasanê û derên din ewqas dewlemend nine. Mixabin tu berhem û belgeyek dîrokî bi zimanê kurdî nemaye yan herî kêm û neberbiçav peyda dîbin

û eger di demekê da helbestvan yan ramanwerekî jî bi kurdî tiştek stiriyabe û nivîsîba, lê niha tiştek nemaye. Berovajî derên din ku wek mînak helbestên arif û helbestvanê xorasanî, Ceferqulî Zengilî, her wiha helbestên Ehmedê Xanî û yên din bi cih mane û îro em wan bi kar tînin. Di van salêن dawî da hinek ji helbestvanên herêmê xebatin di warê wêje û helbestê kirine û hinek helbest bi zimanê kurdî li bara folklorê her wiha li bara bûyerên civakî wek erdhêja 21' hezîrana 1995'an nivîsîne û bi vî rengî beşek her çend kêm ji rewşa xelkê û folklora wan vegotine. Em dikarin ji wan navêن wek "**Zahid Hisêynpûr Gence**" û "**Etaullahê Etayî Pîrkûhî**" bînin ku helbestên dirêj gotine. Her wiha

hinek ji helbestan ji bi awayê dubeytî (du malikî) hatine gotin. Bi giştî zimanê van helbestan tevliheviyek bi zaraveyên dêylemî û gîlekî ra heye û ji hêla rêzimanî va jî hinek lawaz e. herwiha nivîsîna van helbestan bi elfabêya aramî û bi biryar û selîqeya şexsî jî bûye sebeb ku wek mînak kurdek ji Xorasanê bi dijwarî wan fêm bike. Li jêr çend mînak ji van helbestan ku li intirnitê hatine belavkirin bi heman şewaza ku hatine nivîsin lê bi elfabêya standard (ne li gor rêzimanê) hatine nivîsin:

### Dubeytî:

*Le min dûrî minê hîv û sitare  
nekiyê mahân û saline şimare  
meger erd im bimînim? Ez giya me  
îslal ez hatime, nîme dubare*

Yanê:

*Wek hîv û stérkan ji min dûrî  
û van meh û salan nahêjmiri.  
Meger ez erd im ku li vir bimînim?  
Ez giya me. Ez îsal şîn bûme û êdî nayêm.*  
(Etaullah Etayî Pîrkûhî)

Her wiha ev dubetiya:

*Zivistan çû û roy sar teva bû  
bihar hatû gul gîlas vabû  
welî umrî ezîz her sal teriye  
çima hat, çima boy û çima çû*  
(Milad Esquer Zade Gofulî)

Ev jî beşek ji helbestnameya bi navê “*Kulnameya Genceyê*” berhema **Zahid Husêynpur Gence** ye ku di sala 1999'an û li bara erdhêja sala 1995'an a vê herêmê hatiye gotin. Helbest bi heman awayî ku li intirnitê hatiye weşandin, lê bi elfabêya kurdî hatiye nivîsin:

We navî vay jwîr

*Gence Kulname – Payîza 1378'an  
(1999'an)*

Vî şîrê teqdîm tekem pe rûhî temam refteganê mehelê Gence û temamê şehîdanê zilzileyê 31 xurdadê û hemçinîn pe rûhî birangî şehîd va (Mihemed Husêyn Pûr)

*Gence dene mehel bûçikalû ye  
lûye le wî deke cobin le ey palû ye  
Le Rûbarê telûye beide zelkê  
tabloyî Gence deteva day keleke  
Le maşînê piyade boy dem bigir binge te  
gic kir demeva wer bibir  
Vira kînî Gence late jor here  
cadeyi rast rû be mehelda here  
Ûrtî fişan selamgah beid milkan e  
Mehel decalda kûhan xa hildane  
Mehel esli Gence me viray  
Qulaq bide ser bibin ci bî riya ye  
Qedimîna Gence dene Gence bû  
Zindîgi şîrin bû ege rence bû  
Xel xoş û xorem bûn û bî derdiser  
le halî hevdu nedeman bî xeber  
Mehel dene qîmet qurbe hebû  
Mehel dene hikmet û herem hebû*

*Mezin û bûçî laxara esl bû  
hurmetî pîran deneye fesl bû  
Te dene erx da avî bîcan deçû  
tu zanî xadê ûhay bû ya nebû*

Her wiha kurtehelbestên kevn ên jêr ku li zimanê şeniyên **gundê Gofulê** li Xorgama Rûdbarê hene. Du helbestên dawîn wek sêxiştiyên kurmancî yên Xorasanê ne, tenê xişt an nîvmalikên (misrei) wan wek sêxiştiyan heşkîteyî (heşt hêcayî) nînin. Ev helbestana bi gotina kurmancî li ba kurdên herêma Rûdbarê û bi tipêñ latîn hatine nivîsin:

*Çiyan le çiyan hemisîne  
Kar û berxê wî damenisiye  
Çiyan le çiyan sî kirine  
Kul û birîn le dilê min da cî kirine*  
\*\*\*

*Were henî ser kanî tatê  
Weqe bikolini ta avê sar tê  
Weqe mexwinî ta ezîz yar tê*  
\*\*\*

*Were çûkikê minî pa penc  
Were bigerinî le ser gulê pa yance  
Le dilî min maye yance (hesret)*  
...

Ev bû kurteraporek li ser nasandina hevwelatî û hevzimanên kurd li herêma Rûdbarê li parêzgeha Gilana Îranê. Em hêvidar in ku dost û hevalên dilbêş û dilsoj û çalak di warê

çand û zimanê kurdî li vê herêmê bikarin derfet û guncawtiyên çandî û wêjeyî yên herêma xwe ku beşek ji gencîne û paşxaneya wêjeyî û mîrata çandî ya me ye zêdetir û pirtir bi zimanê xwe bidin nasandin. Helbet hejmara zêde ya malperên van hevalan li intirnitê sewa nasandina xeikkê xwe nişana hewildana wan e. Lê wer xuya dike ku heta niha ev meseleya tenê bi awayekî rûyekî û hastên nostalojîk û bîra welatê bav û kalan û bilindkirina navê kurmanc/kurd bi zimanê farsî hatiye rojevê û em kêmtir (ya rast qet) gotar, nivîsen wêjeyî, helbest û bi giştî zimanê kurdî dibînim. Yanê pîvan û mijara sereke ango zimanê kurdî û nivîsîna wî nehatiye berçavgirtin. Her çend ku bi ya min ev yeka tiştek xwezayî ye û bi giştî di destpêkê da coş û kelecan pirtir li ser nasandina û pирengkirina mijara hebûn û dîrok û serpêhatiya kurdan bêyî berçavgirtina zimên e û ji demekê wê de ku êdî bîr û mêtî ji mijarên kilîşeyî û agahiyên seretayî tijî dibe, wê çaxê mijarên kûrtir û pêwîstir wek nivîsin û bikaranîna zimên girîngtir dibe.

Téhran – 14'ê gulana 2015` an  
Mijarê Têkîdar:  
Bi wêne: Herêma kurdnişîna  
Rûdbarê li bakûrê Îranê  
Çavkanî: www.ellahmezar.ir  
(*Kumancistan*)



Kapris